**KT**

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ**

**ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

# MEWLÛDA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ Û BERAWIRDKIRINA WÊ BI MEWLÛDA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ RE


Abdurrahman AKIN

15711022

Şêwirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK



MÊRDÎN 2019

TC

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

# MOLLA SİRACEDDİN HALİLİ VE MOLLA HÜSEYİN BATEYİ’NİN MEVLİTLERİNİN KARŞILAŞTIRILMASI

Abdurrahman AKIN

15711022

Danışman

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

MARDİN 2019

# TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Berawirdkirina Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî Û Mela Huseynê Bateyî” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

□ Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

□ Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

□ Tezimin/Projemin …… yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

…./…./…….

Öğrencinin Adı Soyadı

Abdurrahman AKIN

# KABUL VE ONAY

Abdurrahman AKIN tarafından hazırlanan MEWLÛDA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ Û BERAWIRDKIRINA WÊ BI MEWLÛDA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ RE adlı yüksek lisans tezi 28.10.2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

Dr. Öğr. Üyesi Osman Aslanoğlu (Başkan)

Doç. Dr. Hayrullah Acar (Üye)

Prof. Dr. Dr.Abdurrahman Adak (Üye)

# PÊŞGOTIN

Herçiqas ku Edebiyata Kurdî ya Klasîk dewlemend e û îro hêdî hêdî xebatên akademîk li ser vê edebiyatê tên kirin jî, ev edebiyat hatiye îhmalkirin û di vî warî de cihê ku heq dike bi dest nexistiye. Mixabin ev îhmalkirin ji sedemên cihêreng derketiye meydanê. Wexta ku em li zimanên din ên derdorê dinêrin, em dibînin ku ji bo ku li ser lingên xwe bisekinin û bi pêşde herin gelek mesref û hêz tên xerckirin. Lê mixabin di dîrokê de zimanê Kurdî ev derfet bi dest nexistine û qels maye. Derfetên herî mezin ji bo Edebiyata Kurdî ya Klasîk; Mîrekên Kurda, Medrese, Mizgeft û Terîqet bûne ku bi xêra wan şîn hatiye û bandora xwe li ser gelê Kurd kiriye.

Wexta ku em li çavkaniyên edebiyata Kurdî a klasîk dinêrin, tê dîtin ku ev edebiyat di bin unsurên dînê Îslmê de pir maye, riknê stûnê xwe yê qayîm ji saziyên dînê Îslmê wergirtiye û ev sazî heta roja îro ji bo wê bûne sitargeh. Her weha tê dîtin ku edebiyata Kurdî a klasîk ji bilî unsurên dînî di bin bandora zimanê ‘Erebî, zimanê Farisî û çanda Îranê de jî maye. Ev yek ne tenê ji bo Edebiyata Kurdî ya Klasîk, her weha di serdema Îslamî de ji bo hemû edebiyatên Îslamî yên wek ‘Ereb, Fars, Tirk û Kurdan xaleke hevbeş e.

Bê guman di çarçoveya dînê Îslamê de Pêxemberê dînê Îslamê Muhemmed (s.x.l) bi gelek awayan ji edebiyata Kurdî ya kilasîk re bûye çavkanî. Berî her tiştî jiyana wî bala helbestvanan kişandiye û bûye mijara berhemên edebî. Heta di vî warî de hinek cureyên edebî yên serbixwe derketine meydanê. Em dikarin bibibêjin ku yek ji cureyên herî girîng ku ku di vê çarçoveyê de derketiye meydanê mewlûdname ne.

Mijara teza me jî dikeve qada mewlûdnameyan. Di vê tezê de em ê li ser mewlûdnameya Mela Sîraceddînê Xelîlî rawestin û wê bi ya Bateyî re berawird bikin. Di vê xebatê de armanca me ya serke ew e ku em metnê mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî bi tîpên latinî binivîsin û digel ya Bateyî ji aliyên curbicur ve berawird bikin. Giringiya vê xebatê ji vê tê ku cara yekem bi xebateke akademîk mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî bi tîpê latinî tê weşandin. Her weha cara yekem e ku du metnê mewlûdên kurdî tên berawird kirin.

Mela Sîraceddînê Xelîlî helbestvanekî hêja yê Dîroka Edebiyata Kurdî ye. Lêbelê ji ber ku berhemên wî di nava gel de baş belav nebûne, ew bi xwe baş nayê naskirin. Xelîlî di sedsala 20an de jiyana xwe derbas kiriye. Lê tevî ku nêzîkî roja me ye jî heta niha ji bilî teza Nezîr Gümüş ku bi navê Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî (Gulcivîn) -

Metn û Lêkolîn-, xebetên berfireh li ser wî û berhemên wî nehatine kirin. Berhemên wî jî ji xeynî Mewlûda wî (Durra Birincî Mewlûda Kurmancî) nehatine çapkirin û belavkirin ku çapa Mewlûda wî jî bi tîpên ‘Erebî ye.

Ji ber ku Mela Sîraceddînê Xelîlî di qada zanistî de baş were zanîn em ê hewl bidin bi kurtasî şexsê wî, berhemên wî û bi taybetî mewlûda wî bidin naskirin. Ji aliyekî dî ve di qada mewlûdnameyên edebiyata Kurdî de berhema herî sereke ya Mela Huseynê Bateyî ye. Ji ber vê yekê me jî di vê xebatê de hewl da ku van her du metnên ku ji aliyê serdema xwe ve ji hevdu cuda (Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî *Dura Birîncî mevlûda Kurmancî* û ya Mela Huseynê Bateyî *Mewlûd'n Nebî*) berawird bikin.

Çanda xwendina mewlûdê heta îro jî di nava gelê Kurd de berdewam e. Di nava civaka Kurd de çanda mewlûdê ewqas zindî ye ku di şahî, mirin, zêdebûn, dawet, sinetkirin, çûnûhatina eskerîyê û rojên pîroz de mewlûd tê xwendin. Paşê jî an xwarin tê xwarin an jî xêra mewlûdê tê belavkirin. Li gorî baweriyê ev yek pêşiya israfê digre û bîranîna baweriyê zêde dike. Kevneşopiya xwendina vê çanda mewlûdê bi Melayê Bateyî dest pê kiriye. Di nav vê kevneşopîyê de giringiya mewlûda Bateyî pir e. Melayê Bateyî di Tarîxa Edebiya Kurdî de cihê xwe girtibe jî, Mela Sîraceddînê Xelîlî bi qasî wî nehatiye bihîstin û naskirin. Em hêvî dikin bi vê xebatê Mela Sîraceddînê Xelîlî û berhemên wî jî baştir di nava gel de belav bibin û ew jî di Dîroka Edebiyata Kurdî de cihê xwe bigire.

Di vê xebatê de çarçove li ser destpêk, sê beşên sereke û encamê hatiye avakirin.

Beşa destpêkê, beşa teorik e. Di vê beşê de em pêşî li ser metodolojiyê rawestiyan. Piştre em bi bi awayekî giştî li ser danasîna mewlûdê, wateya wê, kurtemêjû û pîrozkirina wê û kevneşopiya wê sekinîn. Her weha di vê beşê de me nivîskarên her du mewlûdan jî bi dane nasandin. Ji ber ku berî me li ser biyografiya her du nivîskaran xebat hatine kirin, me pêdivî nedît ku em ji bo vê yekê beşeke serbixwe terxan bikin.

Di beşa yekem de em ê bi awayekî giştî li ser mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî, rêbaza ku me di amadekirina metnê de bikaranî, danasîna nusxeyên mewlûdê û metnê mewlûdê yê bi tenqîd rawestin.

Beşa duyêm ya xebata me bi temamî li ser vekolîna mewlûda Mella Sîraceddînê Xelîlî ye. Di vê beşê de em ê danasîna giştî, awahiyê derekî, zimanê mewlûdê, wezn, qafiye, û redîfên mewlûdê di dawî de jî li ser bikaranîna hûnerên edebî rawaestin

Beşa sêyem ya xebata me wekî ku ji navê mijara me jî diyar dibe, berawirdkirina mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî bi ya Mela Huseynê Bateyî re ye. Di vê beşê de em ê; ji aliyê taybetiyên giştî, ji aliyê avahiya derekî, ji aliyê şêwaz û ziman, ji aliyê wezn, qafiye û redîfan, ji aliyê hûnerên edebî û herî dawî jî ji aliyê naverokî ve her du berheman berawirdkirin bikin.

Di dawiyê de bi encamekê dawî li xebatê hat dayîn.

Di pêvajoya amadekirina vê xebatê de gelek heval û hogiran alîkariya me kir. Berî ku ez sapasiya hevalên xwe bikim, di vê pêvajoyê de ji bo sebr û alîkariya wî, tewsiye û piştgiriya wî ez pêşî sipasiya şêwirmedê xwe Prof. Dr. Abdurrahman Adak dikim. Her weha ez ji malbat xwe re ku her car li ser xebatkirina zimanê kurdî piştgirî dane min û mamosteyên xwe yên beşa zimanê kurdî ku ez di vî warî de perwerde kirim re spas dikim. Ji bo alîkarîyên wî yên teknîkî ji hevalê xwe Mehmet Şemsî Balat re sipas dikim. Dîsa ji bo alîkariyên wê ên girîng ji hevala xwe Duygu Seyman re spas dikim.

Abdurrahman Akın

MÊRDÎN 2019

# KURTE

## MEWLÛDA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ Û BERAWIRDKIRINA WÊ BI MEWLÛDA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ RE

Mijara vê tezê mewlûda Mela Sîraccedînê Xelîlî ya bi navê "*Durra Birincî Mewlûda Kurmancî*" û berawirdkirina wê bi **"***Mewlûdu'n-Nebî*" ya Mele Huseynê Bateyî re ye. Armanca xebatê ew e ku hem li ser mewlûdeke Kurmancî vekolînek bê kirin, hem jî pêwendiya wê mewlûdê bi mewlûda Bateyî re bê tesbîtkirin.

Xebat ji beşa destpêkê û sê beşên sereke pêk hatiye. Di beşa destpêkê de metodolojiya xebatê, têgeh û tarîxa mewlûdê û jiyana her du nivîskaran hatiye peşkeşkirin. Beşa yekem a xebatê ji bo metnê mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî, beşa duyem ji bo vekolîna wê ya edebî û beşa sêyem jî ji bo berawirdkirina her du mewlûdan hatiye terxankirin. Di xebatê de her du berhem ji aliyê avahiya derekî, şêwaz û ziman, wezn, qafiye û redîf, hûnerên edebî û naverokê ve hatine berawirdkirin.

Mewûda Xelîlî ji gelek aliyan ve ji ya Bateyî cuda ye. Zimanê wê sadetir û hecma wê biçûktir e. Ji aliyê naverokê ve Bateyî jiyana Pexember ya zarokatiyê bi hurgilî û bi awayekî kronolojîk daye. Lêbelê Xelîlî kronolojî li ber çavan negirtiye. Herweha di mewlûda Xelîlî de mijarên wek şikl, tebî'et, xasiyet û mu'cîzeyên Pêxember ku dikevin kategoriya şemail û hilyeya Pêxember zêde cih digirin.



**Peyvên sereke:** Mewlûd, Mela Sîracddînê Xelîlî, Durra Birîncî Mewlûda Kurmancî, Mela Huseynê Bateyî, Mewlûdu'n Nebî.

# ÖZET

## MOLLA SİRACEDDİN HALİLİ VE MOLLA HÜSEYİN BATEYİ'NİN MEVLİTLERİNİN KARŞILAŞTIRILMASI

Bu çalışmanın konusu, Mela Siraceddin Halili'nin "Durra Birincî Mewlûda Kurmancî" adlı eseri ve Molla Huseyin Batey'in "Mewlûdu-n Nebi" adlı eseri ile karşılaştırmasıdır. Çalışmanın amacı hem Kürtçe yazılan bu mevlid üzerine araştırma yapmak hem de Bateyi'nin mevlidi ile olan ilişkisini tespit etmektir.

Bu çalışma giriş ve üç ana bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde, eserin metodolojisi, mevlid kavramı ve tarihi ile iki yazarın hayatı ele alınmıştır. Çalışmanın ilk bölümü Mela Siraceddin Halili'nin metnine, ikinci bölüm edebiyat araştırmasına, üçüncü bölüm ise her iki eserin karşılaştırılmasına ayrılmıştır. Çalışma da her iki eser dil ve uslüp, kafiye ve redif, vezin, edebi sanatlar ve içerik yönünden karşılaştırılmıştır.

Birçok yönden Halili'nin mevlidi Bateyi'nin mevlidinden farklıdır. İçerik açısından Bateyi, Hz. Muhammed'in Nuru'nun yaratılışını, doğumu ve çocukluğunu edebi ve manzum bir şekilde yazıya dökerek kronolojik bir şekilde vermiştir. Halili'nin mevlidinde ise Peygamber'in şemail ve hilye kategorisine giren; şekil, tabiat, mucize ve kişisel özelikleri çokça yer almıştır. Bu mevlid sade bir üslupla yazılmış, konu alanı ise daha kısıtlıdır.


**Anahtar Kelimeler:** Mevlid, Molla Siraceddin el Halili, Durra Birîncî Mewlûda Kurmancî, Mela Huseyn el Bateyi, Mevlidi'n Nebi.

# ABSTRACT


## THE COMPARİSON OF THE MOLLAH SİRACEDDİN HALİLİ' AND MOLLAH HÜSEYİN BATEYİ'S ISLAMİC MEMORİAL SERVİCES

The subject of this study is the comparison of Mela Siraceddin Halili's "Durra Birincî Mewlûda Kurmancî" and Molla Huseyin Batey's "Mewlûdu-n Nebi". The aim of the study is to investigate this Mewlid written in Kurdish and to determine the relationships between Bateyi and Halili.

The study consists of introduction and three main parts. In the first part, methadology, concept og Mewlid and history of the work and the life of two authors are discussed. The first part of the study is devoted to the text of Mela Siraceddin Halili, the second part is devoted to literature research and the third part is to compare the two works. Both works are compared in terms of language and style, rhyme and redif, literary arts and content.

In many ways, the Mewlid of Halili is different than Mewlid of Bateyi. In terms of content, Bateyi explains Prophet Muhammed's birth and childhood in chronological way and in detail. Halili's Mevlid involves in the category of the appearance of Prophet Muhammed and the verses of His appearance; as humor, miracle features and personal characteristics. Halili's mewlid is written in unsophisticad way and the area of subject is more limited.



**Key words:** Mewlûd, Mawlid, Mela Sîracddînê Xelîlî, Durra Birîncî Mewlûda Kurmancî, Mela Huseynê Bateyî, Mewlûdu'n Nebî.

# NAVEROK


**PÊŞGOTIN ... I**

**KURTE ... IV**

**ÖZET ... V**

**ABSTRACT ... VI**

**NAVEROK ... VII**

**LÎSTEYA TABLO Û GRAFÎKAN ... XII**

**KURTEBÊJE ... XIII**

**DESTPÊK ... 1**

**I. METODOLOJÎ ... 1**

**II. BI AWAYEKÎ GIŞTÎ MEWLÛDNAME Û MEWLÛDNAMEYÊN KURDÎ ... 7**

1. Bi Awayekî Giştî Mewlûdname ... 7

2. Mewlûdnameyên Kurdî ... 9

**III. MUELLIFÊN HER DU MEWLÛDAN ... 14**

**1. MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ ... 14**

1.1. Jiyana Wî ... 14

1.2. Mexlesên wî ... 15

1.3.Berhemên Wî ... 16

**2. MELA HUSEYNÊ BATEYÎ ... 18**

**2.1. Jiyana Wî ... 18**

2.1.1. Berhemên wî ... 20

2.1.2. Mewlûda Mela Huseynê Bateyî ... 21

**BEŞA YEKEM**

**MEWLÛDA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ**

**1.1. RÊBAZA AMADEKIRINA METNA MEWLÛDA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ ... 23**

**1.2. DANASÎNA NUSXEYÊN MEWLÛDÊ ... 28**

**1.3. METNÊ MEWLÛDA XELÎLÎ ... 34**

**BEŞA DUYEM**

**VEKOLÎNA MEWLÛDA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ**

**2.1. DANASÎNA GIŞTÎ ... 52**

2.1.1. Navê Berhemê ... 52

2.1.2. Sebebê Te'lifê ... 53

**2.2. AVAHIYA DEREKÎ ... 53**

2.2.1. Teşeya Nezmê ... 53

2.2.2. Tertîba Berhemê ... 54

2.2.3. Hecma Wê ... 56

**2.3. ZIMANÊ MEWLÛDÊ ... 60**

2.3.1. Unsûren 'Erebî ... 60

2.3.2. Unsûrên Farisî ... 61

2.3.3. Unsûrên Tirkî ... 62

**2.4. WEZN, QAFIYE, REDÎF ... 62**

2.4.1. Wezna mewlûdê ... 62

2.4.2. Qafiye ... 63

2.4.2.1. Qafiyeya Tam ... 63

2.4.2.2. Qafiyeya Dewlemend ... 64

2.4.2.3. Qafiyeya Nîv ... 64

2.4.3. Redîf ... 66

2.4.4. Qertaf ... 66

2.4.5. Qertaf û Bêje/Kombêje ... 66

2.4.6. Tenê Bêje/Kombêje ... 67

**2.5. HÛNERÊN EDEBÎ ... 67**

2.5.1. Teşbîh ... 67

2.5.2. Îstîare ... 68

2.5.3. Tenasûb ... 68

2.5.4. Telmîh ... 69

2.5.5. Tekrîr ... 70

2.5.6. Teşxîs û Întaq ... 70

2.5.7. Nîda ... 71

2.5.8. Tezat ... 71

2.5.9. Îstîfham ... 72

2.5.10. Alîterasyon ... 72

2.5.11. Asonans ... 72

2.5.12. Mubalexa ... 73

2.5.13. Îqtibas ... 73

**2.6. NAVEROK ... 74**

**BEŞA SÊYEM**

**BERAWIRDKIRINA MEWLÛDA XELÎLÎ BI MEWLÛDA BATEYÎ RE**

**3.1. JI ALIYÊ TAYBETIYÊN GIŞTÎ VE ... 82**

3.1.1. Navên Berheman ... 82

3.1.2. Sebebê Te'lifê ... 83

**3.2. JI ALIYÊ AVAHIYA DEREKÎ VE ... 84**

3.2.1. Teşeya Nezmê ... 84

3.2.2. Tertîb ... 85

3.2.3. Hecm ... 95

**3.3. JI ALIYÊ ZIMAN Û ŞÊWAZÊ VE ... 97**

3.3.1. Bandora Zimanên Biyanî ... 97

3.3.1.1. Bandora 'Erebî ... 97

3.3.1.2. Bandora Farisî: ....98
3.3.1.3. Bandora Tirkî ....99
3.3.2. Şêwaz ....100
3.3.2.1. Zimanê Rojane ....100
3.3.2.2. Ziman Edebî ....100
**3.4. JI ALIYÊ WEZN, QAFIYE Û REDÎFÊ VE ....101**
3.4.1. Wezn....101
3.4.2. Qafiye....104
3.4.2.1. Qafiyeya Tam....104
3.4.2.2. Qafiyeya Dewlemend....105
3.4.2.3. Qafiyeya Nîv ....106
3.4.3. Redîf....108
3.4.3.1. Redîfa Qertafî....108
3.4.3.2. Redîfa Qertaf û Bêje/Kombêje....109
3.4.3.3. RedîfaTenê Bêje/Kombêje ....109
**3.5. JI ALIYÊ HÛNERÊN EDEBÎ VE....111**
3.5.1. Teşbih....111
3.5.2. Îstîare....112
3.5.3. Tenasûb ....112
3.5.4. Telmîh ....113
3.5.5.Tekrîr....114
3.5.6. Întaq....115
3.5.7. Nîda ....116
3.5.8. Tezat....116
3.5.9. Îstîfham....117
3.5.10. Alîterasyon ....118
3.5.11. Asonans ....118

3.5.12. Mubalexa ........ 119
3.5.13. Îqtibas ........ 120
**3.6. JI ALIYÊ NAVEROKÊ VE ........ 121**
3.6.1. (Bateyî 1-11, Xelîlî 1-8) ........ 121
3.6.2. (Bateyî 12-24, Xelîli 9-16) ........ 122
3.6.3. (Bateyî 25-45, Xelîlî 17-25) ........ 123
3.6.4. (Bateyî 46-78, Xelîlî 26-33) ........ 124
3.6.5. (Bateyî 79-116, Xelîlî 34-41) ........ 125
3.6.6. (Bateyî 117-127, Xelîlî 42-49) ........ 126
3.6.7. (Bateyî 128-162, Xelîlî 50-57) ........ 127
3.6.8. (Bateyî 163-182, Xelîlî 51-58) ........ 128
3.6.9. (Bateyî 183-232, Xelîlî 59-66) ........ 129
3.6.10. (Bateyî 233-257, Xelîlî 60-66) ........ 130
3.6.11. (Bateyî 258-282, Xelîlî 61-68) ........ 130
3.6.12. (Bateyî …, Xelîlî 69- 76) ........ 131
3.6.13. (Bateyî 283-315, Xelîlî 77-84) ........ 132
3.6.14. (Bateyî 316-336, Xelîlî 85-92) ........ 133
3.6.15. (Bateyî 337-420, Xelîlî 93-100) ........ 133
3.6.16. Beşa 16 (Bateyî 421-489, Xelîlî 101-180) ........ 137
3.6.17. Beşa 17 (Bateyî 490-538 Xelîlî…) ........ 138
3.6.18. Beşa 18 (Bateyî 539-563, Xelîlî…) ........ 139
**ENCAM ........ 140**
**ÇAVKANÎ ........ 143**
**PÊVEK ........ 146**

# LÎSTEYA TABLO Û GRAFÎKAN

**TABLO**

**Tablo 1:** Tabloya hejmara beytan di her du Mewlûdan de……………………..89

**Tablo 2:** Sernav û hejmara beytêndi her du Mewlûdan de……………………..96

**GRAFÎK**

**Grafîk 1:** Bi tevahî hejmara peyvan û hejmara peyvên ‘erebî………………….61

**Grafîk 2:** Li gorî hejmara beytan rêjeya qafiyeyan di mewlûda Xelîlî de………65

**Grafîk 3:** Hejmara cureyên qafiyeyan di mewlûda Xelîlî de………………….65

**Grafîk 4**: Li gorî hejmara beytan rêjeya qafiyeyan di her du mewlûdan de….107

**Grafîk 5**: Berawirdkirina hejmara qafiyeyan di her du mewlûdan de………..107

# KURTEBÊJE

| | |
|---|---|
| amd. | : Amadekar |
| A.Ü. | : Atatürk Üniversitesi |
| b.n. | : Berhema navborî |
| bnr. | : Binêre |
| c. | : Cild |
| ç. | : Çap |
| h.b. | : Heman berhem |
| hwd. | : Her wekî din |
| Hz. | : Hezret. |
| M. | : Mihemmed |
| M. B. | : Melayê Bateyî |
| M. S. X. | : Mela Sîracceddînê Xelîlî |
| r. | : Rûpel |
| s. | : Sal |
| s.e.w. | : Sellallahu ‘eleyhî we sellem |
| s.x.l. | : Silavên Xwedê li ser be |
| ss. | : Sedsal |
| t.y. | : Tarih yok |
| w. | : Wereq |

# DESTPÊK

## I. METODOLOJÎ

### 1. Mijar

Di vê xebatê de mijara me ya sereke mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî ya bi navê *Durra Birincî Mewlûda Kurmancî* û berawirdkirina wê bi Mewlûda Mela Huseynê Bateyî ya bi navê *Mewlûdu'n-Nebî* re ye.

Çawa ku Abdurrahman Adak jî diyar dike, edebiyata Kurdî ya ku di serdema Îslamê de di bin bandora dînê Îslamê, zimanê 'Erebî û Farisî û çanda Îranê de bi awayekî nivîskî derketiye meydanê dibe "edebiyata Kurdî ya klasîk". Di nav van hêmanan de jî rola unsurên dînî û zimanê 'Erebî bi taybetî gelekî zêde ye. Bandora dînê Îslamê, Xuda û Qur'ana pîroz, Cenabê Pexember (s.x.l.) û hedîsên wî, eqîde/kelam fiqih û tesewufê ji bo vê yekê wekî mînak dikarin bên dayîn.[1] Li vir xala ku ji bo me girîng bandora Cenabê Pêxember (s.x.l.) e. Lewra mijara xebata me bi vê yekê re girêdayî ye.

Wekî ku tê zanîn Pêxemberê dînê Îslamê Hz. Muhemmed bi giştî di edebiyata klasîk de mijareke bingehîn e. Çawa ku di edebiyata 'Erebî, Farisî û Tirkî de çawa ku ev mijar hatibe bikaranîn di edebiyata Kurdî ya klasîkde jî bûye çavkaniyeke sereke. Di serî de jî jiyîna wî bala nivîskar û helbestvanên Kurd kişandiye û ev yek jî bûye mijara helbest û berhemên edebî. Bi vî awayî hinek cure berhemên edebî yên serbixwe derketine holê. Wekî mînak yek ji van cureyan jî "Mewlûdname" ye. Di warê vê cureya edebî de helbestvan û nivîskarên edebiyata Kurdî ya klasîk gelek berhem nivîsîne. Li ser vê cureya edebî yekem berhema ku di tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk de hatiye nivîsîn "*Mewlûdu'n-Nebî*" ya Mela Huseynê Bateyî ye ku di sedsala 18em de jiyaye. Ev berhema hem ji aliyê edebî ve pir girîng e, hem jî di nava civaka Kurd de cihekî xwe yê taybet heye. Ev berhem heme bêje di nava hemû kurdên kurmanc de tê zanîn û di nava gel de wekî "*Mewlûda Kurmancî*" meşhûr bûye.

Piştî ku Bateyî cara yekem mewlûd nivîsî, ji aliyê gelek kesên dî ve jî mewlûd hatine nivîsîn. Helbet ji bilî Bateyî gelek helbestvanên din ên kurd jî Mewlûdname nivîsîne. Hetaniha li ser hêjmarên mewlûdnameyên kurdî rast û durust xebat nehatine kirin. Demeke dirêj a vala di navbera mewlûdên nû û mewlûda Bateyî de heye. Sedemên

---

[1] Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar, İstanbul 2014, r. 30.

vê dema dirêj a nebûna mewlûdên kurdî çi ne, baş nehatiye tespîtkirin. An sedemên demdirêjiya di navbera yekem û duyem mewlûda kurmancî çi ne, baş nehatiye kolandin[2]. Her çiqasî piştî Bateyî gelek mewlûd hatibin nivîsîn jî, bi qasî ya Bateyî nehatine nasîn. Ji ber ku yekem mewlûda Kurdî ya Bateyî ye, ew kesên ku piştî wî mewlûd nivîsîne di bin bandora wî de mane[3]. Di vê çarçoveyê de di sedsala 20em de ji aliyê Mela Sîraceddînê Xelîlî ve jî bi navê "Durra Birincî Mewlûda Kurmancî" mewlûdek hatiye nivîsîn. Dema ev mewlûdên nû hatine nivîsîn, mewlûda Bateyî jixwe di nav gel de berbelav bû ye û hatiye naskirin. Loma tiştekî asayî ye ku di van mewlûdan de şopên mewlûda Bateyî hebin. Bêguman ji bo ku pêwendiyên di navbera mewlûda Bateyî û mewlûdên dî de bên tesbîtkirin divê xebatên berawirdî bên kirin. Mijara vê teza me jî danasîna mewlûda Xelîlî ye ku piştî Bateyî hatiye nivîsîn û berawirdkirina wê bi mewlûda Bateyî re ye.

Sedemekî girîng ê hilbijartina vê mijarê ew e ku heta niha xebateke akademîk li ser berawirdkirina du mewlûdên Kurdî nehatiye kirin e. Heta niha bi awayekî akademik, di asta lisansa bilind û doxtorayê de, li ser mewlûdên kurdî du xebatên hatine kirin. Yek ji van xebata ya Mehmet Yergin e. Mehmet Yergin di sala 2015an de bi navê *"Mewlidê Mela Ehmedê Xasî: "Mewlidu'N-Nebiyyi'L-Qureyşiyyî" (Metn-Wekenitiş)"*[4] xebateke di asta lisansa bilind de li zaningeha Mêrdîn Artuklûyê nivîsiye. Xebateke din e ku di asta lisansa bilind de li ser mewlûdên kurdî hatî kirin ya Zîwer Îlhan e. Zîwer Îlhan jî 2013an de li zaningeha Mêrdîn Artuklûyê bi navê *"Mewlûda mela Huseynê Bateyî (Metna Rexneyî û Lêkolîn"* tezek nivîsiye. Herçiqas mewlûda Xelîlî di çarçoveya projeyeke masterê da hatiye amadekirin[5] jî, ew xebateke bi sînor e. Di vê xebatê de mewlûda Xelîlî bi awayekî berfireh dê bê pêşkêşkirin. Herweha ji aliyê kesekî ve heta niha bi tu awayî berawirdkirina her du mewlûdan nehatiye kirin. Hetta em dikarin bêjin ku mijarake bi vî rengî di çarçoveya berawirdkirina du metnên mewlûdên ji hevdu cuda cara yekem e ku wek nameya masterê tê amadekirin.

---

2 Ahmet Kırkan, "*Mewlidê Osman Efendi û Mewlido Zazakî*, Kovara Nûpelda h.7-8, Wan 2011, r. 49-55.

3 Hayreddin Kızıl, *"Diyarbakır ve Çevresinde Yazılmış Mevlitlerin Konularına Göre Tasnifi Denemesi*", e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi", Diyarbakır 2012, r. 117

4 Mehmet Yergin, *"Mewlidê Mela Ehmedê Xasî "Mewlidu'N-Nebiyyi'L-Qureyşiyyî" (Metn-Wekenitiş)*, Unîversîteyê Artuklû yê Mardînî, Mardîn 2015, r. 1.

5 Nezir Gümüş, Jiyan û Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî, Projeya Lîsansa Bilind, Mêrdîn, 2017.

## 2. Armanc

Armanca me ya yekem ji vê xebatê ew e ku metnê mewlûda Xelîlî yê destnivîs bi awayekî zanistî bê amadekirin. Çawa ku tê zanîn piraniya Kurdên Tirkiyeyê tîpên Kurdî-Erebî bi kar naînin û ji ber vê jî ji xwendina berhemên Kurdî yên ku bi alfabeya Kurdî-Erebî hatine nivîsîn mehrûm dimînin. Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî jî berhemeke wisa ye. Bi vê xebatê ev berhem wê bigihe ber destê lêkoler û xwîneran û ya herî girîng jî di nav akademiya Kurdî de dê cihê xwe bigire.

Her weha armanceke ve xebatê ew e ku di qada edebiyata Kurdî ya klasîk de du metnên ku ji aliyê serdemên xwe ve ji hev cuda lê ji aliyê cure û mijara xwe ve weke hev in bên berawirdkirin, hevbeşî û wekheviyên wan bên tesbîtkirin û bi vî awayî pêwêndî û danûstandinên di navbera nivîskarên wan de derkevin meydanê. Di vê çarçoveyê de her du berhem di warên wek ziman û şêwaz, ruxsara helbestê, rewanbêjî û naveroka berheman ve dê bên berawirdkirin û wekhevî û cudahiyên wan dê bên derxistin. Bi vî awayî tesbîtkirina bandora mewlûda Bateyî li ser ya Xelîlî dibe armanceke girîng a xebata me.

## 3. Rêbaz

Di amadakirina vê xebatê de serî li hin rêbazên zanistî hatiye dayîn. Di biwara mewlûda Xelîlî de di destpêkê de me hemî metnê mewlûdê li gorî sîstema transkrîpsiyona navnetewî latînîze kir û bi xwendineke rexneyî krîtîka metnê kir. Mebesta me ji vê ew bû ku em metnekî dirust ku nêzî orjînala mewlûdê ye derxin holê. Di pey re hem ji aliyê ruxsarî ve û hem jî ji aliyê naverokê ve me analîza edebî ya metnê mewlûdê kir. Ji bo metnê mewlûda Bateyî jî me xebata Ziver Îlhan *"Mewlûda Mela Huseynê Bateyî- Metnê Rexneyî û Lêkolîn"* ji xwe re wekî çavkaniyeke sereke hilbijart û li gorî tespîtên wî em tevgeriyan.

Rêbazeke di ya sereke jî rêbaza berawirdkirinê ye. Di xebata me de her du berhem ji aliyê xalên wek nav, te'lîf, hecm, kêş, tertîb, tesîra zimanên biyanî, qafiye, redîf, şêwaz, hûnerên edebî ve hatin berawirdkiririn. Her weha beş bi beş mijarên her du mewlûdan hatin berawirdkirin.

Li gorî Prof. Dr. Gürsel Aytaç, di edebiyateke berawirdkirî de, peywira lêkolîner ew e ku fonksiyon û ramana du xebatên ku bi zimanên cuda an jî bi heman zimanî hatine nivîsîn lêkolîn bike da ku aliyên wan yên hevbeş, cuda û cûrbecûr nas bike û sedemên van cûdahiyan şîrove bike. Bi vî awayî lêkolîner dikare xebateke berawirdkî di bin sê

serenavên sereke de kom bike:1. Ji aliyê ruxsarî ve 2. Ji aliyê naverokê ve 3. Ji aliyê fikrî ve. Me jî li gorî vê xebatê her du beşên sereke bikaranîn.

Berî her tiştî, divê were zanîn ku ev kategorîbûn ji bo lêkolînek berhevdanî ya edebîyatê vebijarkek pir gelemperî ye û tenê sernivîsên bingehîn di nav xwe de digire. Bê guman mimkûn e ku meriv qonaxên cûda li gorî taybetmendiyên karên ku bêne berhevkirin binav bike. Ji bo pêkanîna ezmûnek tendurist û guncav divê sernavên rast bêne diyar kirin

Berawirdkirina van her du Mewlûdan ji aliyê serdemên xwe ve girîng e. Lewra ji aliyê dînî, siyasî, civakî û serdemî ve cudahî di navbera van de hene. Her weha ji aliyê nivîsîna cure û mijara xwe ve wekheviyek di navbera wan de heye. Ji ber vê yekê berawirdkirina van her du Mewlûdnameyan hêjayî xebateke weha ye.

## 4. Çavkanî

Ji ber ku metnê mewlûda Xelîlî berê bi awayekî zanistî nehatiye amadekirin û berawirdkirina mewlûda wî bi ya Bateyî re jî ne hatiye kirin çavkaniyê rasterast bi van mijaran re têkildar berê tunene. Lêbelê heta niha derheqê mewlûda Bateyî de tibabek xebat hatine kirin. Herweha hin mewlûdên dî yên ku di wan de serî li rêbaza berawirdiyê hatiye dayîn jî hene. Bêguman hin ji van xebatan di teza me de jî wek çavkanî hatine bikaranîn.

Di amadekirina vê tezê de ji gelek çavkaniyan sûd hatiye wergirtin. Lêbelê hin çavkaniyên ku rasterast bi mijarên vekolîna edebî re têkildar in girîng in. Berî her tiştî çavkaniya me ya sereke nusxeya mewlûda "*Durra Birincî Mewlûda Kurmancî*" a Xelîlî ye. Em hebûna vê çavkaniyê gelekî girîng dibînin. Lewra hemî metnê mewlûdê û hin bi rengekî zelal tê de cih girtine. Ji bo analîza metnê mewlûdê jî me ji çend çavkaniyên sereke sûd wergirtiye ku em dixwazin li vê derê navên wan zikir bikin. *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metnê Rexneyî û Lêkolîn)* ya Zîwer Îlhan, *Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî (Gulcıvîn) -Metn Û Lêkolîn-* ya Nezîr Gümüş, gotara *Mele Hüseynê Bateyî'nin Mewlid-i Nebî Adlı Eseri İle Mele Süleyman Kurşun'un Mewlida Pêxember Adlı Eserinin Karşılaştırılması* ya Hasan Karacan, Nuretttin Aykut, *Süleyman Çelebi Ve Mela Huseynê Bateyî'nin Mevlidlerine Karşılaştırmalı Bir Bakış ya Mustafa Öztürk, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasî* ya Abdurrahman Adak, *Mevlid: Tarihi ve Dini Hükmû* ya Ahmet Özel, *Di Edebîyata Me de Mewlûd û Rûberûkirina Mewlûdên Pêşîn ên Kurdî û Tirkî ya* Özel, M. Zahir Ertekin, *Melayê Bateyî Jiyan û Berhem* ya Tahsîn Îbrahîm Doskî, Muhsîn Î. Doskî,

*Li Cizîrê Muhîteke Edebî: Dergahê Şêx Seyda û Rola Wî di Edebîyata Kurdî de* ya Abdurrahman Adak, *Uluslararası Bilim Düşünce ve Sannata Cizre sempozyumu, Cizre ve Çevresinde Kürtçe Mevlidler ve Müzikal* ya Mehmed Tıraşçı, *Beyülşebab ve Molla Hüseyîn Bateyî Sempozyum Bildirileri, Molla Hüseyîn Bateyî Şiirleri Üzerindeki Bazı Hadiseler Üzerinede Bazı Değerlendirmeler* ya Nurullah Agitoğlu, *Di Edebîyata Me de Mewlûd û Rûberûkirina Mewlûdên Pêşîn ên Kurdî û Tirkî* ya M. Zahir Ertekin, "di ronîya tezê de pêşiya me ronî kirin.

Wekî din gelek endamên malbata Mela Sîraceddînê Xelîlî û yên derdora wî jî ji me re bûn çavkaniyên sereke.

Hûrguliyên mijara lêkolîna me di xebatên ku li jêr hatine dayîn de sînorkirî ne. Heta niha xebatên ku li ser Mela Sîraceddînê Xelîlî û berhemên wî hatin kirin ev in:

Abdurrahman Adak, "Li Cizîrê Muhîteke Edebî: Dergahê Şêx Seyda û Rola Wî di Edebîyata Kurdî de", Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu, Ed. M. Nesim Doru, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İst. 2012: Ev xebat li ser dergehê şêxseyda ku bûye muhîteke edebî û tê de gelek helbestvan û nimûneyên edebiyata kurdî derketine meydanê ye.

Nezîr Gümüş *Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî (Gulcıvîn) -Metn Û Lêkolîn-*. Yüksek Lisans, Mardin Artuklu Üniversitesi, 2019: Ev xebat li ser dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî hatiye nivîsîn. Her weha li ser jiyan û berhemên wî cara yekem di vê xebatê de agahî hatine dayîn.

Çend lêkolîn û gotarên heta niha ku li ser Mela Huseynê Bateyî û Mewlûdnameya wî hatine nivîsandin ev in:

Tahsîn Îbrahîm Doskî, Muhsîn Î. Doskî, Melayê Bateyî Jiyan û Berhem, Sipîrêz, Hewlêr, 1996-2005: Ev xebat li ser jiyan û berhemên Melayê Bateyî hatiye nivîsîn.

M. Xalid Sadînî, Mela Huseynê Bateyî Jiyan, Berhem û Helbestên wî, Nûbihar, Stenbol 2010: Ev xebat li ser jiyan û berhemên Mela Huseynê Bateyî û helbestên wî hatiye nîvîsin.

Ziver İlhan Mewlûda Mela Huseynê Bateyî-Metn û lekolîn, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mardîn 2014: Ev xebat li ser mewlûda Bateyî hatiye nivîsîn. Heta niha xebata herî berfireh û tekûz e ku li ser metnê mewlûda Bateyî hatî nivîsîn e. Her weha 14 nusxeyên mewlûdê di vê xebatê de hatine berawird kirin. Di jêrenotên vê xebatê

de çewtî, kêmanî, zedeyi cudatî yên di navbera 14 nusxeyande hatine nîşan kirin. Di latînîze kirina metnê mewlûda Xelîlî de ev xebat ji me re bû çavkaniyeke sereke.

Mustafa Öztürk Süleyman Çelebi ve Molla Hüseyîn Bateyî'nin Mevlidlerine Karşılaştırmalı Bir Bakış, DOI Number: http://dx.doi.org/10.7827/TurkishStudies.13040 Volume 13/5, Winter 2018, p. 389-418, ISSN: 1308-2140, Ankara-Turkey: Di vê xebatê de du mewlûden zimnê wan cuda bi nêrîneke berawirdkî hatine berawird kirin. Giringiya vê xebatê ew e ku ji du edebiyatên cuda (Tirkî- Kurdî) du berhêmen sereke ji aliyê ruxsarî û muhtewayê ve hatine berawird kirin e.

Mehmed Tıraşçı, Uluslararası Bilim Düşünce ve Sannata Cizre sempozyumu, Cizre ve Çevresinde Kürtçe Mevlidler ve Müzikal, Editör M. Nesim Doru, İstanbul 2012: Ev xebat li ser mewlûden kurdî yên li derdora Cizîrê û dîroka mewlûdan hatiye nivîsîn.

Babê Zêrevanî, Mela Huseynê Bateyî-1, Kovara Nûbihar, Cil 8, Hejmar 87, r 55-64

Babê Zêrevanî, Mela Huseynê Bateyî-1, Kovara Nûbihar, Cil 8, Hejmar 88, r 13-2: Di van her du xebatan de li ser jiyan û nasnameya Mela Huseynê Bateyî agahî hatine dayîn. Her weha li ser cih, dîrok û navê Bateyî nirxandinek hatiye kirin.

Nurullah Agitoğlu, Beyülşebab ve Molla Hüseyîn Bateyî Sempozyum Bildirileri, Molla Hüseyîn Bateyî Şiirleri Üzerindeki Bazı Hadiseler Üzerinede Bazı Değerlendirmeler, Şırnak Üniversitesi Yayınları No 5, İstambul 2015, Şırnak 2015: ev xebat li ser helbestên Bateyî û hedîseyên ku li ser wan tên gotin hatiye nivîsîn.

Hasan Karacan, Nurettîn Aykut, Mele Hüseynê Bateyî'nin Mewlid-i Nebî Adlı Eseri ile Mele Süleyman Kurşun'un Mewlida Pêxember Adlı Eserinin Karşılaştırılması, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Yıl:1, Cilt1, Sayı2, Kasım 2015, ss. 123-141: Ev xebat li ser danasîna du mewlûdên Kurmancî hatiye nivîsîn. Her weha mijarên her du mewlûdan hatine tesnîf kirin.

M. Zahir Ertekin, "Di Edebîyata Me de Mewlûd û Rûberûkirina Mewlûdên Pêşîn ên Kurdî û Tirkî", Uluslararası Kürdoloji Konferansı Bildirileri, Hakkâri Üniversitesi, Hakkâri 2011, s. 123-137: Ev xebat wekî cureyekî edebî li ser mewlûdê hatiye rawestan. Her weha li ser kevneşopiya nivîsîna mewlûdan û kurte dîroka mewlûdê hatiye nivîsîn. Xalekê din a giringiya vê xebatê ew e ku mewlûda yekem a edebiyata tirkî û mewlûda yekem a edebiyata kurdî hatine berawird kirin.

## II. BI AWAYEKÎ GIŞTÎ MEWLÛDNAME Û MEWLÛDNAMEYÊN KURDÎ

### 1. Bi Awayekî Giştî Mewlûdname

Wekî têgeheke edebiyata klasîk a Îslamî, mewlûdname, ew berhemên edebîne ku derheqê jidayîkbûna Cenabê Pêxember de hatine nivîsîn.[6] Peyva Mewlûdê bêjeyeke ‘Erebî ye û ji radera w-l-d “welede” an ku “wiladetê” peyada bûye.[7] Ev têgeh bi wateya xwe ya ferhengî tê wateya zayîn, jidayîkbûn û hatina dinyayê, dem, dîrok û cihê jidayîkbûnê.[8] Lê belê ev wate di nava dîrokê de hatiye guhertin û şiklekî din li xwe bar kiriye. Pîrozkirina jidayîkbûyîna Hz. Muhemmed û ahengên wekî dawet, şahî, çûyîna kesekî ji bo leşkerîyê, mirin, serkftinên ku di nav civakê de tên pîrozkirin (zewac, ezmûn, sinnet û hwd.) di bin vê têgehê de hatine bikaranîn. Wekî din di serî de ji bo bûyîna Pêxember, di nav ehlê tezwifê de ji bo bûyîna sofiyan û di erdnîgariya Îslamê de ji bo bûyîna kesayetên girîng wateyeke firih girtiye.[9]

Hz. Muhemmed li gorî gelek dîroknasên Îslamê, wexta ku waliyê Yemenê Ebrehe ji bo ku Mekkeyê hilweşîne êriş dike, di sala ku bûyera “*Fîlê*” dê pêk werê de hatiye dinyayê. Tê rîwayetkirin ku di vî warî de nêrînên cuda nînin. Di nav ‘Ereban de yên ku li gorî kevneşopiya “Nesî” diçin ev dîrok 569ê mîladî ye. Li gorî yên din 570 an jî 571 e. Herweha bi gelemperî tê pejirandin ku di 12 meha Nîsanê de di dema rojê de çêbûye. Li gorî rîwayeteke din ew di demsala biharê de di roja du, heşt, deh yan hivdehê vê mehê serê sibehê hatiye dine. Ji aliyekî din ve ew li ser bingeha hêjatirên rastîn tête zanîn ku roja jidayikbûnê roja duşemê ye.

Di zemanê Pêxember de salvegera jidayikbûna wî nayê pîroz kirin, her weha di heyama çar xelîfeyan, serdema Emewîyan û Ebbasiyan de jî pîrozkirina jidayîkbûyîna wî nehatiye kirin. Sedema vê yekê jî ew e ku di serdema her du xelîfêyên pêşî de bi fetihkirinêre mijûl bûne, di serdema her du xelîfeyên din de jî nakokiyên navxweyî derketine û di serdema Emewî û Ebasiyan de ji bo ku fikra piştevaniya silsileya Hz. Muhemmd belav nebe pîrozkirina jidayîkbûyîna Pêxember nehatiye kirin. Di warê pîrozkirina Mewlûdê de, piştî ku li Misrê dewleta Fatimîyan tê avakirin di serdema

---

6 Hasan Aksoy, *“Mevlid”,* DiA, Ankara 2004, b. 29, r. 483.
7 M. Edip Çağmar, *Edebi Açıdan Arapça Mevlitler,* İlahiyat, Ankara 2004, r. 13.
8 Soner Akdağ, *“Süleyman Çelebinin Mevlidi Üzerine*”, A.Ü., T.A.E, Dergisi 36, 2008, r. 85.
9 Ahmet Özel, *“Mevlid",* TDV., İslam Ansiklopedisi, Ankara 2007, r. 475.

Mu’iz-Lidînillah (362-365/972-975) de bi awayekî fermî pîrozkirina jidayîkbûna Hz. Muhemmed hatiye kirin.

Piştî ku li Misrê dewleta Fatimîyan ji holê radibe û dewleta Eyûbiyan (1171-1462) tê avakirin gelek merasim, cejin û aheng ji ber ku bi awayekî fermî giringî bi wan nehatiye dayîn ji holê radibin. Lê merasimên Mewlûdê di nava xelkê de tên pîrozkirin.

Di serdema Memlûkiyan de li Misrê pîrozbahiya merasimên Mewlûdê bi awayekî serkeftî berdewam dike. Di destpêka meha nîsanê de ji bo pîrozbahiyan: Xelîfe Qadiyên çar mezheban, Ehlê ‘ilm û tesewifê, erkanê dewletê, serok ‘eşîr û konsolê dewletên cîranan beşdarî van mersiman dibûn. Lê di vê serdemê de merasimên herî navdar ji aliye Sultan Kayitbay (873-902/1468-1495) ve hatine kirin.

Li welatên Bakûrê Mexrib (Afriqa) di destpêkê de kevneşopiya pîrozbahiya mewlûdê tunebûye. Di vî warî de cara yekem ji aliyê Qazî û Muhaddis Ebûl’l-‘Ebbas Ehmed b. Muhammed b. Huseyin es-Sebtî (633/1236) ve bi mebesta ku gel cejnên milletên Mesîhî pîroz nekin merasimên Mewlûdê hatine li darxistin.[10]

Di salên 586-629/1190-1232 de bûrayê Selaheddînê Eyûbî Muzafferûddînê Gokborî (1190-1233) ku di vê serdemê de mîrekê Erbîlê bû careke din bi fermî dest bi pîrozkirina Mewlûdê kiriye.[11] Di vê serdemê de ji meha Muheremê bigre heta meha Nîsanê ji Bexdayê, Musilê, Nisêbînê, Cizîrê û ji Şengalê heta ji bajarên ‘Eceman gelek feqîh û sofî ji bo amadehî û pîrozkirina mewlûde diçine Erbîlê.

Di serdema dîroka Împaratoriya Osmaniyan de di derbarê destpêka merasîmên ku li 12 Rebîûlewel de hatine kirin ku wekî salvegera pêxemberê tête pejirandin, agahiyek berbiçav tuneye. Herçiqas ku di tomarkirinên hin weqfiyeyande ev dîrok heta Osman Xazî (1258) here jî nêrînên giştî didin nîşandan ku destpeka merasimên mewlûdê di serdema Kanunî Sultan Süleyman de ye. Lê di dîroka Împaratoriya Osmaniyan de cara yekem ji aliyê Sultan Muradê sêyem ve 1588an de bi awayekî fermî pîrozbahiyên Mewlûdê dest pê kirine.

Herçiqasî ku Mewlûd ji sala 1910 pê da weke cejneke fermî hatibe pîroz kirin jî piştî ku Komara Tirkiyê hate damezrandin ev cejin jî ji fermiyetê tê derxistin. Îro Si’udî

---

10 Özel, h.b., r. 475-479.
11 Özel, h.b., r. 475-479.

‘Erebîstan ne tê de li welatên din ê Mislimanan tevan, di hinekan de bi awayekî fermî û di hinekan de jî bi awayekî ne fermî mewlûd tê pîrozkirin.[12]

## 2. Mewlûdnameyên Kurdî

Herçiqas metnên mevlûdên pêşî di nava civaka ‘Ereb û împaratoriya Osmaniyan de hatibin nivîsandin jî ji aliyê miletên din wekî Kurd, Tirk û Farisan ve jî hatine nivîsîn. An jî mevlûdên sereke wekî Süleyman Çelebî “Vesiletü'n-Necat” û Mewlûdên ‘Eerbî bal zimanê xwe ve guherandine.[13] Heta niha di nava van mewlûdan de her çiqasî li ser yên Tirkî û Erebî lêkolînên berfireh hatibin kirin jî,[14] lê li ser mewlûdên Kurdî xebat kêm in. Li gorî tespîtkirina M. Edîp Çağmar tenê M. Tayyib Okiç di gotareke xwe de behsa sê mewlûdên Kurdî dike, Necla Pekolcay jî di pirtûka xwe de cihê mewlûdeke bi Kurdi di piretûkxaneya netewî de destnîşan kiriye.[15] Di vê çarçoveyê de di nava civaka Kurdan de cara pêşî ji aliyê Melayê Bateyî ve bi zimanê Kurdî û bi zaraveya Kurmancî hatiye nivîsîn.

Di nav gelê Kurd de, kevneşopiya nivîsîn û xwendina Mewlûdê bi Melayê Huseynê Bateyî dest pê kiriye. Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (ss 17-18an) di nav kevneşopiyên kurdan de cihekî girîng digire. Berî Mewlûda Bateyî Kurdan Mewlûdên ‘Erebî bi kar dianîn.[16] Piştî ku Bateyî Mewlûda xwe nivîsî, di nava gelê Kurdistanê de bi piranî Mewlûda wî hate bikaranîn. Çanda Mewlûdê di nav civaka Kurdan de ew qas zindî ye ku kengî zarokek çêbibe, kengî kurek bê sinetkirin, ku yek ji leşkeriyê hat, roja dawetekê, yek ji hecê hat, yekî serkeftinek bi dest xist, ji pêkanîna qewlekî weke nezirkirinê, kengî kesek bimre di te’ziya wî kesî de, çaxê xêrekê, di ber bela û musîbetekê de Mewlûd tê xwendin û xêra wê Mewlûdê tê dayîn. Helbet ji bilî Bateyî gelek helbestvanên din ê Kurd jî metnan Mewlûdê nivîsîne.

Kesê ku dest bi vekolîna Mewlûdên bi zaravayê kurmancî hatine nivîsîn bike, divê ji Mewlûda Melayê Bateyî, Mewlûdu’n-Nebî, dest pê bike. Ev Mewlûd, ji heyama ku hatiye nivîsandin pê ve rastî eleqeyeke mezin hatiye. Ev Mewlûd li her derê tê xwendin û ew qasî navdar bûye digel ku gelek kes navê wê û nivîskarê wê nizanin jî ew malikên Mewlûdê yên destpêkê:

---

12 Mehmet Şeker, *"Mevlid"* T. D. V. İ. A. Türkiye Diyanet Vakfı, Ankara, 2004, r. 479-480.
13 Mehmet Tıraşcı, *“Güneydoğu ve Doğu Anadolu Çevresinde Arapça, Kürtçe, Zazaca Mevlidler Ve Müzikal Olarak İcra Ediliş Tarzları”* 17/2, 2013, r. 213-214.
14 M. Edip Çağmar, “*Edebi Açıdan Arapça Mevlidler*” İlahiyat Yayınları, Ankara 2004, r. 10
15 Kızıl, h.b., r. 117
16 Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar, İstanbul 2014, r. 278.

"Hemdê bêhed bo Xwedayê 'alemîn

Ew Xudayê daye me dînê mûbîn", ji ber dizanin. Heta serokê karên diyanetê yê Tirkiyeyê di çalakiyên jidayîkbûna pîroz de ku di sala 2011an de li Amedê hatibû lidarxistin ev malik xwendin. Piştî Melayê Bateyî heta îro digel ku Mewlûdên ji hev cûda hatine nivîsandin jî yek ji wan Mewlûdan mîna Mewlûda Mela Huseynê Bateyî bi nav û deng nebûye. Mewlûda Mela Huseynê Bateyî ji ber ku yekem Mewlûda Kurmancî ye, ji bo hemû Mewlûdên ku piştî wê hatine nivîsandin bûye çavkanî.

Bi qasî ku me tespît kiriye, di Mewlûdên ku li ber Mewlûda Melayê Bateyî hatine nivîsîn de heman mijar ji aliyê nivîskarên din ve jî hatine bikaranîn.

Heta niha mewlûdên Kurmancî yên ku hatine tespîtkirin ev in:

1. Mewlûda Bateyî: Mela Huseynê Bateyî[17]

2. Mewlida Pêxember: Mele Nûrîyê Hesarî (Pirêsan). Nivîskar di sala 1934an hatiye dinyayê û di sala 2011an wefat kiriye. Mewlûda wî çap nebûye.[18]

3. Sîyera Pêxember: Mele Zahid Pasor-Qulp/Amed 1976.

4. Rîsalet ul-usûl fî mewlid irresûlMele Mûhemmed Şerîf kurê Mele Şêxmûsê

Batêrgiz/Kercews/Batman 1976.

5. Mewlûdu Nebî: Mele Hesen kurê Elî Firfêlî /Hezex/Şirnex 1979

6. Mewlûda Nebî: Şêx Mûhemmed Emîn Heyderî.[19]

7. Mewlûda Şerîf: M. Zahit Kardeşlik[20]

8. Gula Narincî Mewlûda Kurmancî, Seyîd Feyzullah kurê Şêx Mûhemmed

Findikî/Dihê/Sêrt 1983.

9. Mewlûda Nebî: Mele Elîyê Baqustanî, Stewr[21]

10. Mewlid Nebî: Mele Zahid kurê Mele Mûhemmed Hadî Hezro/Amed, Sal:

---

17 M. Xalid Sadinî, *Mela Huseynê Bateyî*, Çapa duyem, Nûbibar 2011.

18 M. Zahir Ertekin, "*Yekem Mewlûda Kurdî û Bandora Wê ya Li Mewlûdên Dû Xwe"* Beytüşşebap Ve Molla Hüseyin Bateyî Sempozyum Bildirileri, Şırnak 2012, r.186.

19 Şex Muhemmed Emîn Heyderî, *Mewlûda Nebî*, Lîs, Stenbol 2007.

20 Ev berhem, di 1989an de ji aliyê M. Zahit Kardeşlik ve weke destxetê hatiye çapkirin. Çapxaneya berhemê ne eşkere ye.

21 Ev mewlûd wergera mewlûda Îbn Hecere Esqelanî ye. Eswelanî mewlûda xwe bi Erebî û pexşan nivîsanidiye. Mela 'Elî Baqustanî jî ew him kiriye Kurmancî him jî kiriye helbest. Bi vî awayî mewlûdek li mewlûdên Kurdî zêde kiriye. Ev mewlûd jî nehatiye çapkirin.

1989.

11. Fêkîyê Narencî Mewlûda Kurmancî: Mele Ehmed kurê Mele Yûsivê Zinarex/ Ehmed Nas[22]

12. Hate Sefa di Mewluda Mustafa: Seyîd Feyzullah kurê Şêx Mûhemmed Findikî[23]

13. Mewlûda Nebî: Mele Şewqî Helex/Midyat/Mêrdin,1994.

14. Mewlûda Kurmancî–Kurtehîya Mewlûda Bateyî, Şêx Mehdî Seyfulmulûk/Amed, Sal:2000.

15. Mewlûda Kurdî bi Zimanê Gundî: Seyyîd Bedreddîn Ibn Mela Salih ElHesenê Şefi'î El-Kefsûrî[24]

16. Ava Heyat: Mele Elî kurê Seyîd Ebdurrehman Omerî /Mehsertê/Mêrdin[25]

17. Mewlûda Mûhemmed Mustefa: Mele Ebdurrehman Bêcirmanî/Kercews/ Batman, Sal: 2000[26].

18. Mewlûda Şerîf Ji Ewwel Heta Axir Rehberî Xelasî Hz. Muhemmed[27]. (S.A.W.): Mele Mustafa kurê Mele Elîyê Êzdarî (Mustafa Turan)

19. Mewlûda Nebî: Mele Ehmed kurê Mele Osman Hêştrekî/Midyat/Mêrdin, Sal:2005.

20. Mewlûda Pêxember: Mele Suleyman Kurşun[28]

21. Mewlûda Pêxember: Seydayê Tîrêj[29]

22. Nezma Şêrîn Der Mewlid û Sîreta Resûlê Emîn: Mele Mûhemmed kurê

---

[22] Ev mewlûd heta niha çap nebûye; lê fotokopîyê hatiye zêdekirin. Seyda berhema xwe di sala 1990î de li Cizîrê nivvîsîye.

[23] Seyîd Feyzullahê Findikî, *Mewlîda Şerîf Hate Safa Di Mewlîda Mustafa*, Halk matbaacılık, Cizre 2004.

[24] Dîrok û cihê ku lê hatî çapkirin ne diyare.

[25] Ertekin, h.b., r. 187.

[26] Ertekin, h.b., r.187.

[27] Ertekin, h.b., r.187.

[28] Mela Silêman Kurşun, *Mewlîda Pêxember*, Beroj, Îstanbul 2010.

[29] Veguhestina tîpan û pêşkêşkirin, Dilawerê Zengî, Çapxane: Emîral, Beyrût-Libnan, Çapa yekemîn, 2006.

Mele Ehmedê Xursî (Mela Muhemmed Kurê Mela Ehmedê Xarsî Kızıltepe-Qoser)[30]

23. Mewlûda Pêxember – Resûlê bê hember: Şêx Feyzûllah Xiznewî, Qamişlo, Sal:2009.[31]

24. Mewlûda Sîyer, Mele Ebdûrrehman Xerxorî/Perwar/Sêrt, Sal: 2011.

25. Kitêba Durra Birincî Mewlûda Kurmancî28: Mela Muhemmed Sîraceddîn kurê Mela ‘Ebdulhekîmê Xelîlî

26. Herdûbat, Mele Zahidê Hadîyê Endarî yê bi navê Zahidê Dîyarbekirî,

27. Mewlûda Kurdî Bi Şêwaza Hedbî: M. Burhan el- Hedbî, Dêrik/Mêrdîn[32].

28. Mewlûda Şerîf: Mela Muhemmed Elî Fûdeylî.[33]

29. Pesindana Mûhemmed: Mihemmed Helîm Xursî: Destxet.[34]

30. Mewlûda Nebî: Mela Şewqî Xak[35]

31. Mewlûda Fexrê ‘Álemê Muhemmed: Seyîd Mela Ebdurrehman Kurê Mela Hemze

Mewlûdên Kirmancî/Zazakî

Li gorî tespîtkirina Mehmet Yergin bi Kirmanckî (Zazakî) 7 mewlûd hatine nivîsîn û çapkirin[36]. Li jêrê em ê cih bidin mewlûdên ku Yergîn behsa wan kiriye û bi kurtasî behsa wan bikin.

1- Mewlûda Ehmedê Xasî: Mewlûda yekemîn a Ehmedê Xasî (1867-1951) ye. Xasî dema ku li Liceyê Miftîtî dikir ev berhem nivîsiye. Taybetmendîya vê berhemê ya herî girîng, ji bilî mewlûdbûna wê, yekemîn pirtûka ku bi zaravayê zazakî hatîye nivîsandin e. Navê wê, Mewlûdê Kirdî an Mewlûdê Nebî ye û bi helbestkî hatîye nivîsîn. Di sala 1899’ê de li Dîyarbekirê bi destûra fermî 400 nusxe li çapxaneya Lîtografyayê hatîye çapkirin

---

30 Ertekin, h. b., r., r.187
31 Ertekin, h. b., r., r.187
32 http://rîyaroni.com/nuce/60-mewluda-kurdi-bi-sewaza-hebdi.html; 17/05/2014. S:17:20
33 Kızıl, b.n., r. 124
34 Ertekin, h. b., r.187
35 Mela Şewqî Xak, *Mewlûda Nebî*, amd. Şêxmûsê Talatî, Elele Birlik, Nusaybin 2003.
36 Yergin, b.n., r. 22

2- Duyemîn, mewlûda Osman Esad Efendî (Osman Efendîyo Babij) (1852-1929) ye. Osman Efendî di salên li Sêwrekê miftîtî dikir de ev berhem nivîsandîye. Navê mewlûda wî, Bîyîşa Pêxamberî ye. Mewlûd di sala 1933'ê de ji alîyê Celadet Elî Bedirxan ve (1893-1951) li Şamê hatîye weşandin

3- Mewlûda sêyemîn ya Mela Mehemed Elîyê Hûnî ye. Mela Mehmed Elî di sala 1930'yê de li gundê Hûnê ku nahîyeyeke navçeya Palo ye, hatîye dinyayê. Mewlûda xwe di sala 1970'yê de bi tîpên 'Erebî nivîsandîye. Mihemed Selîm Uzûnê Paloyî, di sala 2004'ê de transkirîbê tîpên latînî kirîyê û li Stenbolê, di nava weşanên Vateyê de weşandîye.

4- Mewlûda çaremîn, mewlûda Mela Mehemedê Muradan (1952-…), ne. Navê mewlûda wî Mewlidî Zazakî ye. Muradan, ji gundê Muradan a bi Hênê ve girêdayî ye. di sala 2000'ê de mewlûda xwe xilas dike. Mewlûda wî ji 7 beşan û 204 malikan pêk tê. Mewlûd ji alîyê W.K Merdimîn û N. Celalî ve hatîye tiranskirîbekirin û di hejmara 21. a Vateyê de hatîye weşandin.

5- Mewlûda pêncemîn mewlûda Mela Kamilê Puexî ye. Navê mewlûda wî Mewlidî Nebî ye. Pûexî, di sala 1938'ê de, li Bîngolê, li Puexê hatîye dinyayê. Pûex him navê 'eşîretê him jî navê herêmê ye. Mewlûd di sala 1999'ê de hatîye nivîsandin û ji 104 malikan pêk tê. Mewlûd, di sala 2003'ê de li Stenbolê hatîye çapkirin.

6- Mewlûda Mele Evdilqadirê Mûşekî Nivîskarê vê mewlûdê Mela Evdilqadir e. Ev mewlûd çap nebûye û bela nebûye. Mewlûd ji 15 beşan pêk tê û 288 beytan pêk tê.

7- Bîlal-Feqî Çolige, Mewlidê Peyximbêr Qey Tutanê Zazon.

Heta niha mewlûdên bi zaraveya Soranî hatin nivîsîn[37]

Husênê Qazî (1810-1875) ye. Lê belê mewlûda wî nesr e ne şi're. Ev mewlûd, ji alîyê Şêx Huseyn Qazî (1790-1869) ve hatîye nivîsîn. Nivîskar di naverokê de cih daye jidayikbûna Cenabê Pêxember, jîyana wî û şerên ku kirine. Berhem li Kurdistanê weke kitêba dersê hetîye xwendin. Cara yekem, di sala 1935an li Bexdayê hatîye çapkirin. Her weha ji aliyê Mela ᶜEbdullahê Koyî yê Celîzade ve jî (1835-1908) mewlûdek bi Kurdî nivîsîn.

Wekî ku me li jor jî got: Ji bilî Bateyî gelek helbestvanên kurd jî mewlûdname nivîsîne. Heta niha li ser hêjmarên mewlûdnameyên kurdî rast û durust xebat nehatine

[37] Ertekin, b.n.r., 2012, r.187.

kirin. Lê Zahir Ertekîn dibêje ku heta niha 31 kurmancî, 7 zazakî 10 soranî û hewramî, bi tevahî 48 mewlûdname tespît kirine. Helbet hejmar ji vê zêdetir in û hêjmarên mewlûdên kurdî xebateke serbixwe ye. Belkî di prosesa nivîsîna van mewlûdan tişta herî balkêş, mewlûdên ku hatine tespîtkirin piranî di van salên dawî de hatine nivîsîn. Demeke dirêj vala di navbera mewlûdên nû û mewlûda Bateyî de heye. Sedemên vê dema dirêj ên nebûna/nezanîna mewlûdên kurdî çi ne, baş nehatine tespîtkirin. An sedemên demdirêjiya di navbera yekem û duwem mewlûda kurmancî çi ne, baş nehatiye kolandin. Herwiha ev, mijareke sereke ye û bi serê xwe ye, ku divê ji aliye lêkolerên edebiyata klasîk a kurdî ve bête vekolîn[38]

## III. MUELLIFÊN HER DU MEWLÛDAN

### 1. MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ

#### 1.1. Jiyana Wî

Mela Sîraceddînê Xelîlî di sala 1930î de li gundekî Torê[39] binavê Xelîla hatiye dinyayê. Di sala 1982yan de teqawît bûye û di sala 1983yan de çûye rehmetê[40]. Li gorî agahiyên ku me ji birayê wî Ebdullah Ataç hildane navê bavê wî Mela Ebdulhekîm e. Mela Evdilhekîm, kurê Mela Birahîm, kurê Mirad, kurê ‘Umer, kurê Rustem, kurê Behrem, kurê Mustefa, kurê Şêlîl, kurê Xelîl, kurê Muhemed Ereb e. Muhemmed Ereb jî ew kes e ku ‘Eşîra ‘Erebiyan[41] pê bi nav bûye. Mela Sîrac di destpêka mevlûda xwe de ev nasname ya xwe weha aniye ziman:

“Bi Nezm û Pevgihandina,

Seydayê Mela Muhemmed Sîraceddîn Kurê Mela Ebdulhekîmê Xelîlî

Xudayê Mezin Li Wan Rehmê Bike (Amîn)”

Ji malbata wan gelek alimên mezin derketine. Bavê wî jî ‘alimekî mezin bû. Pênc bira û sê xuşkên wî hene. Birayên wî ev in: Mela Monîr, Mela Nezîr, Mela Ehmed, Şêx Beşîr û Mela Ebdullah. Ji xeynî Mela Ebdullah tevan emrê Xwedê kirine. Xuşkên wî jî ev in: Zeyneb, Reqiya û Fatima. Her sê xwîşkên wî jî çûne rehma Xwedê. Bi navê Wehbî,

---

38 M. Zahir Ertekin, “*Mela ’Elîyê Baqustanî û Mewlûda Wî*”, Mukaddime 6/1, MAÜ, Mardin 2015, r. 104.

39 Herêmeke di mineqeya Torabîdîn de ye. Ev herêm dikeve navbera bajarê Şirnex, Sêrt Batman û navçeya Mîdyadê de.

40 Gundekî hêrema Torê ye. Bi Tirkî “Kılavuz” tê gotin 30 km dûrî navçeya Hezex (bi tirkî İdil) a Şirnex û 10 km jî dûrî navçeya Kerboran (bi tirkî Dargeçît) a Merdînê ye.

41 ‘Eşîra ‘Erebiyan mezintirîn eşîreke herêma Tor ‘Ebidînê ye. Ji 33 gundan pêk tê. Navê xwe ji Muhemmed ‘Ereb hilgirtiye.

tenê kurekî wî heye. Wehbî li Diyarbekirê di saziyeke dewletê de dixebite. Ew û dayîka xwe Şerîfa Xanim (hevjina Mela Sîraceddîn) niha li Diyarbekirê bi hev re jiyana xwe didomînin.[42]

Navê helbestvan Sîraceddîn e. Bi awayê fermî paşnavê wî Ataç e. Lê ji ber ku mela ye û ji gundê Xelîla ye, wekî Mela Sîraceddînê Xelîlî tê binavkirin. Di nava gel de ji ber ku nav hinekî têne kurtkirin, bêhtir wekî Mela Sîracê Xelîlî tê naskirin.

### 1.2. Mexlesên wî

Di tradîsyona edebiyata klasîk a Îslamî de (edebiyatên ‘Erebî, Farisî, TirkîKurdî û hwd) helbestvan û naziman di helbest û menzûmeyên xwe de bi piranî ji bilî navên xwe yên rasteqîn navekî cuda û taybet wek navên xwe yên edebî bi kar anîne û di cîhana edebiyatê de bi wî navî hatine naskirin.[43]

Mela Sîraceddînê Xelîlî di helbestên xwe de gelek mexles bi kar anîne: “Sîraceddîn”, “Mihemed Sîraceddîn”, “Muḥemmed Sîrac”, “Sîrac”, “Sîraco”, “Sîracî”, “Sîracê Xelîlî”, “Sîn”, “Sîrac Ataç” û “Sîn û Cîm”.[44] Bi gelemperî mexlesa “Sîraceddîn” û varyantên peyva “Sîraceddîn; wekî “Sîrac”, “Sîracî”, “Sîraco” hwd. bi kar anîne. “Sîrac” li şêst cihî, “Sîraceddîn” li bîst û çar cihan, “Sîracî” li heşt cihan, “Sîraco” li hivdeh cihan “Sîn û Cîm” li şazdeh cihan, “Sîrac Atac” û Mihemed Sîraceddîn” li du cihan, “Sîn”, li çar cihan, Mihemed Sîrac” û “Sîracê Xelîlî” jî tenê li cihekî hatine di dîwana xwe de bikar anîne.  Di dîwana xwe de di hinek helbestên xwe de (51, 56, 75, 77, 79, 80, 81, 82, 84, 85, 87, 88, 90, 91, 92, 94, 95, 96, 97 û 98an) de mexlesa xwe bi kar neaniye. Ev jî bi piranî an helbestên, Erebî ne an jî werger in. Wekî din di hemî helbestên xwe de mexlesa xwe bi kar aniye.[45]

Mela Sîraceddîn zaroktiya xwe li Xelîla derbas kiriye. Heta panzdeh salan li Xelîla maye û li wir xwendiye. Xwendina xwe ya sereke li cem birayê xwe Şêx Beşîr dîtiye. Di sala 1945an de çûye Amûdê. Li Amûdê li cem mala Şêx Ehmedê Kesk xwendina xwe domandiye. Paşî çûye Qamîşlo û li wê derê li cem Mela Ehmedê Zivingî (miftiyê Qamişlo, zana û ‘alimekî wir e) xwendiye. Ji wê derê çûye Eleqemşê. Li wir li cem birayê xwe Şêx M. Beşîr maye. Ji wir diçe Danêrê (Duruköy) û li wê derê demekê melatiyê dike.

---

42 Mela Ebdullah Ataç, Kerboran 2018.

43 Abdurrahman Adak, *“Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”* Nûbihar Akademî, j.10, Stenbol 2018, r.12.

44 Adak, h.b., r..12.

45 Nezîr Gümüş, *Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî (Gulcivîn) -Metn Û Lêkolîn-*, Teza Lisansa Bilind Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mardîn, 2019, r. 6.

Li wê derê zewiciye. Şêx Beşîr çûbû Eyserê û ew jî bi xwe re biribû Danêrê. Danêrê jî gundekî Cizîrê ye. Nêzîkî panzdeh salan li wir maye. Wextê ku li wir bû, çûye eskeriyê. Piştî eskeriyê jî çend salan li wir ma. Piştre çûye Xirabê Nêriya. Li wir jî demekê melatî kiriye. Ji wir çûye gundê Dikiyê. Li Dikiyê jî demekê maye û melatiya wir jî kiriye. Ji wê derê çûye Kavilbekranê. Kavilbekranê gundekî Cizîrê ye. Ev gund jî dikeve ber hudûdê Sûriyê de û nêzîkî Dêrika Hemko ye. Di sala 1963an de çûye Cizîrê. Li Cizîrê bi awayê fermî melatî kiriye. Mela Sîrac di sala 1971ê de li gundê Behmûrê yê Cizîrê dest bi melatiya fermî kiriye. Di sala 1974an de tayîna wî çûye herêma Mîdyadê û li Êstilê nêzîkî çar salan melatî kiriye. Di sala 1977an de dîsa hatiye Cizîrê. Li mizgefta Hz. Nûh wezîfe kiriye. Di sala 1982an de teqawîd bûye. Di 3yê kanûna pêşîn (Aralık) a sala 1983yan de wefat kiriye. Tirba wî li ziyareta Mîr Evdaliyê ye.[46]

Wekî ku ji jiyana wî jî diyar dibe li gelek deveran geriyaye û melatî kiriye. Di ware helbesta kurdî de û di qada Edebiyata Kurdiya Klasîk de helbestvanekî bi hêz e. jiber vê teybetmendiya xwe helbestvanê nemir Cigerxwin ji bo wî weha gotiye "Feqîyê Torî tu xweş şaîr î.[47]

Wexta ku em bala xwe didin naveroka helbestên Mela Sîracê Xelîlî tê dîtin ku ew hezkiriyê Şêx Seyda (1890-1968) yê Cizîri bû ye. Ji xwe birayê wî yê mezin Şêx Beşîrê Baseyî jî xelîfeyê Şêx Seyîda bû. Wî di dîwana xwe de li ser Şêx Seyda çend helbest jî nivîsandine. Her weha li ser Şêx Mihemed Nûrullah jî du helbestên wî hene. Mela Sîracê Xelîlî di gel ku ji dergehê Şêx Seyda dûr dijiya jî dîsa bi dîwan û menzûmeyên xwe û bi taybet bi wan helbestê ku li ser postnîşînên dergehê Şêx Seyda nivîsandî, dikare wekî helbestvanekî herî girîng yê muhîta dergehê Şêx Seyda bê nirxandin[48]

## 1.3.Berhemên Wî

Li gor tesbitên Nezir Gümüş[49], berhemên Mela Sîraceddînê Xelîlî bi giştî çar heb in. Sê heb ji van gihane me, lêbelê yek ji wan negihaye me. Berhemên Mela Sîraceddînê Xelîlî yên ku gihane me sê ne: Durra Birincî (Mewlûda Kurmancî), Gulcivîn (Dîwan), Şîretên Hekîm Loqman.

---

[46] Abdurrahman Adak, *"Li cizîrê muhîteke Edebî: derheqê Şêx Seyda û Rola wî di Edebiyata kurdî de*. Zaningeha Mardin Artukluyê. Notên dersa edebiyata kurdî.", Mêrdîn 2014.

[47] Abdurrahman Adak, "*Dergahê Şêx Seyda*" *Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre*, (ed. M. Nesim Doru), Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2012, r. 239.

[48] Ev agahî ji birayê Mela Sîraceddîn yê bi navê Abdullah Ataç hatine wergirtin. Kerboran (Dargeçit), 20ê Hezîranê 2017.

[49] Gümüş, h.b., r. 14.

### 1.3.1. Mewlûd

Ji ber ku mijara teza me mewlûda wî ye, li vê derê ihtiyac tuneye em li ser mewlûdê rawestin.

### 1.3.2. Gulcivîn (Dîwan)

"Gulcivîn" dîwana wî ya helbestan e ku ji 143 helbestan pêk hatiye. Navê dîwanê (Gulcivîn) ji aliyê helbestvan ve hatiye danîn. Li ser cildê pirtûka destxet jî hatiye nivîsîn. Li ser mijarên civakî û eşqê hatiye nivîsîn. Di heman demê de helbestên dînî jî tê de pir in. Berhemeke giranbiha ye.

### 1.3.3. Şîretên Hekîm Loqman

"Şîretên Hekîm Loqman" jî weke ku ji navê wê jî tê zanîn ji şîretên ku Hekîm Loqman yên li kurê xwe kirine pêk tê. Nesîhetnameyeke menzûm e. Şîretên wî bi nezm û bi zimanekî herikbar nivîsîne. Ji zimanê Farisî hatiye tercûmekirin. Berhem ji neh rûpelan pêk tê. Bi destpêkekê dest pê dike û di bin 34 sernavan de tê temamkirin. Her sernavek bi gelemperî ju du-sê malikan pêk tê û li ser mijareke hikmetê disekine. Ev berhem jî nehatiye çapkirin. Li gor xebatên me destnivîsên wê jî di piyasê de nînin. Tenê fotokopiya destxeta Mela Ebdullahê Dêrgûlî di destê me de heye.[50]

Berhemên Mela Sîraceddîn yên ku negihane me jî hene. Çiqas berhemên wî negihane me, ji sedî sed ne zelal e; lêbelê berhema bi navê Gulbihara Kurdan yek ji wan e. Berhema Xelîlî ya ku negiyane me ya bi navê "Gulbihara Kurdan" e. Hebûna vê berhemê ji aliyê biraziyê wî Mihemed Siddîq Ataç ve hatiye tesbîtkirin. Li gor ku ew dibêje navê berhemê "Gulbihara Kurdan" e û mijara wê jî ev e: "Derb û meselokên Kurdî ne û gotinên pêşîvanan ji aqilmend û qendan".

Çawa ku tê dîtin, bêşik e ku berhemeke Xelîlî li ser gotinên pêşiyan yên Kurdan heye. Em dikarin bibibêjin ku ev berhemeke civakî û netewî ye. Mixabin heta niha ev berhem winda ye. Li gor agahiyên ku me ji malbatê bi dest xistine, malbatê ev berhem veşartiye û piştre berhem winda bûye.[51]

Biraziyê Xelîlî Ataç, ji vê berhemê du beyt neqil kirine. Ataç, di dawiya fotokopiya dîwanê de gotiye "Dersê Gulbiharê de ev şî"ra ha nivîsiye" û piştre cih daye her du beytan.

---

[50] Gümüş, h.b., r. 15.
[51] Gümüş, h.b., r. 14.

Birayê min bibêje feyde nîn e qet di vê xêzê

Heçî zanê dizanê Gulbiharem xeyrê payîzê

Heçî me danîbû li vir guh bidiyê rast tû bike xet

Tû l'me neke paşî nifir ger çî me xet bûye xelet[52]

# 2. MELA HUSEYNÊ BATEYÎ

## 2.1. Jiyana Wî

Derheqê jiyana Melayê Bateyî de agahiyên teqez ên ku xwe dispêrin jêderên nivîskî tunene. Bateyî demeke dirêj, wek helbestvanê sedsala XVem hatiye nîşandan. Çavkaniya vê nêrînê "Rîsaleya Şa'ir û Musennefên di Kurdistanê" ye ku ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatiye nivisîn û ji aliyê A. Jaba ve di sala 1860î de li Lenîngradê hatiye çapkirin. Li gor vê rîsaleyê Bateyî, di navbera salên 820-900 (1417-1495)an de jiyaye. Piştî çapkirina vê rîsaleyê gelek nivîskaran di destnîşankirina serdema Bateyî de ev zanyarî dubare kirine. Lêbelê hin argumanên ku vê zanyariyê şaş derdixin, vê dawiyê ji aliyê Doskiyan ve hatine destnîşankirin. Li gor van argumanên ku ji zanyariyên malbatî û hin nîşaneyên tarîxî hatine bidestxistin, bi rehetî dikare bê gotin ku Bateyî di dawiya sedsala hevdehem de hatiye dinyayê û heta bi çaryeka sêyem ji sedsala hijdehem jiyaye.[53]

Her wekî nakokiya jiyîna serdema wî de, li ser navê Mela Huseynê Bateyî jî nêrînê cuda derketine holê. Li gorî A. Jaba û dîroknas Îzadî navê Bateyî Ahmed e. Lê em karin bibêjin ku li ser tevahiyên Mewlûda Bateyî, Hesen el-Ertoşî tê nivîsandin.[54]

Li gorî çavkaniyan navê Melayê Bateyî Huseyn e. Lê ji ber ku hinek lêkolînvanan di hinek çapê di Mewlûda wî de navê wî bi şaşî weke Ehmed danîne. Ew, demeke dirêje wekî Mela Ehmedê Bateyî hatiye naskirin. Ew kesê ku cara yekem navê wî weke Mela Ehmed Daniye, Mela Mahmûdê Bazîdî ye. Piştî wî kesên wekî A. Jaba, Mîcîrson, Belec

---

52 Mela Sîraceddînê Xelîlî, *Kîtaba Gulcivîn*, 1999, r. 213.

53 Abdurrahman Adak, *"Destnivîsên Mewlûda Melayê Bateyî di Arşîva A. Jaba de: Nasandin û Analîz"* The Journal of Mesopotamian Studies, c. 2/2, Mardin Artuklu Üniversitesi, Mardin 2017, r. 3-4.

54 Hasan Karacan, Nurettti Aykut, "Mele Hüseynê Bateyî'nin Mewlid-İ Nebî Adlı Eseri İle Mele Süleyman Kurşun'un Mewlida Pêxember Adlı Eserinin Karşılaştırılması", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* 1/2, 2015.

Şîrkû, Celadet Bedîrxan, Mehmed Emîn Zekî Beg, Elaedînê Secadî û Qenadê Kurdo ev tişt dubare kirine.[55]

Dîsa her çiqas navê Melayê Bateyî di gelek çavkaniyên berê de wek Ehmed û di hinan de jî wek Hesen (Ertûşî, 1323) hatibe bikaranîn jî navê wî yê rastî Huseyn e. Ev jî ji zanyariyên malbata wî û hin qeydên nivîskî tê bidestxistin[56]

Herçiqas di çavkaniyande li ser jiyana wî agahî hatibin dayîn jî, biqasî ku tê dîtin ku tiştekî teqez li ser jiyana wî tineye. Li dijî van tomarkirina lêkolînên ku me li ser jiyana wî kirin em gihaştine van encaman:

Çawa ku ji nîsbeya wî ya bi bal Bateyî tê fêmkirin, Melayê Bateyî ji gundê Bateyê ye. Ev gund dikeve rojhilatê Beytuşşebabê (Elke). Eşîra wî jî eşîra Ertûşiyan e. Navê bavê wî Mela Mustafa ye. Mela Mustefa bi eslê xwe ji gundê Batuyan e ku niha li ser Şirnexê ye. Ew û sê birayên xwe ji wir çûne devera Zaxoyê li gundê Bazingîrê li nav Mamîzdînan bi cih bûne, piştre ji wir jî çûne û li gundê Bateyê bi cih bûne. Bi navê Osman, Ehmed, Mihemed sê birayên Melayê Bateyî û bi navê Mela Ehmed apekî wî hebûye. Melayê Bateyî, li cem apê xwe Mela Ehmed dest bi xwendinê kiriye, li Hekkarî di medreseya mîrgehê de perwerdeya xwe xilas kiriye, piştre jî li gundê Pîrosayê ku nêzî Bateyê ye, dest bi melatiyê kiriye. Bateyî, li gundê Pîrosayê, bi xanimeke bi navê Hemayil re zewiciye. Kurekî wî yê bi navê Mela Tahir û kurekî Mela Tahir yanî neviyekî wî yê bi navê Mela Dirbas hebûye. Li gor hinek rîwayetan bi navê Asmîn, Zulfê û Banê sê keçên Melayê Bateyî jî hebûne.[57]

Di Helbestên xwe û dawiya Mewlûda xwede bi giştî mexlesa Bateyî bi kar aniye.

Wekî mînak:

Hem ji bo her çar imamê caddeyê

Hem ji bona katibê vê nusxeyê

Bo cemî 'ê mûslimîn û salihe

Bo faqîr-ê Bateyî El-Fatihe[58]

---

55 Adak, b.n., 2014, r. 273
56 Adak, b.n., 2017, r. 4.
57 Adak, h.b. r., 2017, r. 4..
58 Babê Zêrevanî, “Mela Hisênê Bateyî-1”, *Nûbihar* 8/87 (Zivistan 2002): 55,64.

Mela Huseynê Bateyî yek ji helbestvanên kurd ên klasîk e. Di berhemên xwe de Kurmanciyeke pir xweş bi kar tîne. Heta mirov dikare bêje ku ew ji serekeyan e. Xwendina xwe ya pêşî li cem apê xwe Mela Ehmed dîtiye. Piştî xelaskirina xwendina xwe li gundê Pîrosa (nêzî Batê) dest bi melatiyê kiriye.[59] Tê fahmkirin ku wî Perwerdeya xwe li medreseyên Musil, Duhok, Hewlêr, Miksê hwd. ditîye. Ji alimên giring ders hildaye.

Mela Huseynê Bateyî, heta 15 saliya xwe li ber destê apê xwe li medreseyê xwendiye. Pişt re ew ji ber destê apê xwe derdikeve diçe medreseyên Colemergê û Mîksê û xwendina xwe li van deveran berdewam dike.[60] Li gelek gundên Kurdistanê melatî kiriye. Li cem 'ilmê xwe yê olî her weha ji aliyê Tibbê û Edebiyatê ve jî xwe bi pêş ve biriye û xwendiye.[61]

### 2.1.1. Berhemên wî

Wexta ku em li berhem û mijarên berhemên wî dinêrin tê dîtin ku Mela Huseynê Bateyî di dîroka Edebiyata Kurdî ya Klasîk de helbestvanekî pir bi tesîr e. Di qada edebiyata Kurdî ya klasîk û di warê edebiyata olî de derketiye pêş. Di dîroka edebiyata Kurdî de cara pêşî bi cureyê Mewlûdê berhemek nivîsiye. Ji bilî Mewlûda wî helbestên wî yên cur bi cur jî hene.

Mela Huseynê Bateyî du menzûmeyên olî (Mewlûd û Zembilfiroş[62]) berhemeke pexşan (Hemaîl) û helbestên cur bi cur nivîsandine.[63] Li jêr bi kurtasî em ê behsa van her du berheman bikin.

**Hemaîl:**

Ev berhema Bateyî ne bi Kurdî ye. Bi zimanê 'Erebî hatiye nivîsîn. Ev berhem hîn nehatiye latînîzekirin û çapkirin.[64] Di vê berhemê de derheqê nivişt û hemaîlên ku mirov bi xwe ve dike, derman û tilsimên hinek nexwşiya, îfadeyên sûreta û ayetên Quranê de agahî hene.[65]

---

59 Adak, b.n., 2014, r. 274
60 Sadinî, h.b., r. 29-30.
61 Mustafa Öztürk, "*Süleyman Çelebi ve Mela Huseynê Bateyî'nin Mevlidlerine Karşılaştırmalı Bir Bakış*", Ankara, 13/5, 2018, r. 389-418.
62 Ji bo agahiyên ber fereh bnr. Abdurrahman Adak, "*Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*", r. 271-284
63 Adak, b.n., 2014, r. 277
64 Zîwer Îlhan, *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metnê Rexneyî û Lêkolîn)*, Çapa Yekem, Avesta, Stembol 2016, r. 26
65 Adak, b.n., 2014, r. 283.

**Helbestên wî**:

Helbstên Bateyî ji aliyê wî ve nehatine komkirin. Helbestên wî di destxetên cur bi cur de hatine qeydkirin. Ev helbest, berya niha di hin kitêbên dîroka edebiyata kurdî wekî Maruf Xeznedar *Mêjûyî Edbî Kurdî* de, di kovarên wekî Nûbihar de, di hin berhemên bîbyografîk weke kitêba Tahsîn Îbrahîm Doskî Melayê Bateyî *Jiyan û Berhem* de jî çap bûne.[66]

**Zembîlfiroş:**

Teqez nehatibe îspatkirin jî, berhemeke din a Bateyî Zembîlfiroşa wî ye.

Li gorî hin lêkolîneran berhema duyem ya Melayê Bateyî Zembîlfiroş e. Zembîlfiroşa ku Qenatê Kurdo dibêje ya Bateyî ye ji aliyê A. Sosin ve hatiye weşandin. Kurdo, ji destnîvîsara xwe ji hin çarînên Zembîlfiroşê mînak dane.[67] Li Petersbûrgê di jimareyên Kurd 27, 45, 28, 36, 26an de nusxeyên Zembîlfiroşê hene. Piraniya van nusxeyan bal Bateyî ve tên nîspêtkirin.[68]

Her weha Babê Zerevanî behsa Tecwîda Qurana Pîroz û Aqîdeya Îmanê dike; lê ev kitêb widayî ne û tu delêl li ser wan nîne.[69]

### 2.1.2. Mewlûda Mela Huseynê Bateyî

Berhema herî girîng ya Melayê Bateyî “Mewlûdname” ye ku wekî “Mewlûda Kurmancî” meşhûr bûye.[70] Mewlûda Melayê Bateyî di dîroka edebiyata Kurdî de yekem berhem e ku di vî warî de hatiye nivîsîn. Gelek nusxe û çapê wê hene[71] Ji ber vê yeke Mewlûdanameyên din ku li pey wî hatin nivîsîn tev jî di bin bandora wî de mane. Wexta ku em di vê çarçoveyê de li Mewlûdname yên Kurdî binêrin tê dîtin ku piştî Melayê Bateyî ekoleke ku me di vê xebata xwe de wekî “Ekola Bateyî” bi nav kiriye derketiye meydanê.

Mele Mahmûdê Bazîdî di pêşgotina kitêba Elî Teremaxî de navê pênc berhemên ku di medreseyên Kurda de wekî kitêbên dersê tên xwendin dide ku yek ji van jî Mewlûda Melayê Bateyî ye. Ev jî giringiya Mewlûda Bateyî û cihê wê yê taybet di dîroka edebiyata kurdî de ji me re dide nîşandan. Berî ku Melayê Bateyî berhema xwe ya Mewlûdnameyê

---

66 Îlhan, h.b., r. 30.
67 Îlhan, h.b., r. 32.
68 Adak, b.n.r., 2014, r. 281.
69 Babê Zêrevanî, “*Mela Hisênê Bateyî-1*”, Nûbihar 8/87, Stenbol 2002, r. 61.
70 Adak, b.n.r., 2014, r. 278.
71 Îlhan, h.b., r. r. 26.

binivîsê, di nav civaka Kurda de Mewlûdnameyên ‘Erebî dihatin xwendin. Lê piştî ku Melayê Bateyî Mewlûda xwe bi zimanê Kurdî nivîsî ew kete şûna yên Erebî. Bandora Melayê Bateyî ji aliyê Mewlûdê ve li ser gelek helbestvanê kurd çê bû ye. Lewra gelek kesên ku pey wî re Mewlûd nivîsîne di bin bandora wî de mane.[72]

Wexta ku em ji aliye edebî ve li Mewlûdu’n-Nebî binerin; tê xuya kirin ku Melayê Bateyî bi ‘ilmê Farisî û ‘Erebî re pir mijûl bûye. Zimanê Mewlûda wî li gorî Mewlûdên din ên Kurdî girantire û di bin têsîra van her du zimanan de pir maye. Bê guman divê em di vê xalê de şert û mercên serdema wî li ber çava bigirin. Lewra di serdema wî de zimanên Farisî û ‘Erebî du zimanên sereke ên ‘ilmî bûn. Jiber vê yekê ne mumkûn e ku ew di bin têsîra van zimanan de nemine. Her weha cîrantiya zimanên Kurdî, Farisî û ‘Erebî û erdnîgariya van hersê nîjadan jî bi baweriya me têsîr lê kiriye.

Bi zimanê îroyîn ne mumkûn e ku ji sedî sed Mewlûda wî were famkirin. Şemaya qafiyeyên Mewlûda Bateyî weke hemû mesnewiyan bi şiklê aa, bb, cc, dd, ee…hatiye nivîsandin û her xane di nav xwe de biqafiye ye. Kîteya 11 kîteyî bikar aniye. Berhem bi serenavê cuda hatiye dabeşkirin.

Mewlûda Melayê Bateyî berhemeke girîng a edebiyata Kurdî ya klasîk e. Her çiqas ji aliyê gelek dîsîplînên zanistên sosyal ve li ser Mewlûdê xebat dikarin bên kirin jî berî her tiştî, ji aliyê dîsîplîna destnivîsariyê ve divê xebat bên kirin û li ser esasê nusxeyên destnivîs divê metneke durist û zanistî bê amadekirin. Nasandina nusxeyên destnivîs û analîza wan (nirxê nusxeyê, şecereya nusxeyan) di pêvajoya amadekirina metna zanistî ya berhemê de du karên pêşî ne ku divê bên kirin. Di arşîva A. Jaba de sê nusxeyên Mewlûda Bateyî hene ku yek ji wan di nav hemû nusxeyên ku tên zanîn de ya herî kevin e. Heta niha yazdeh nusxeyên Mewlûdê yên ku di qonaxa berî Şerê Cîhanê yê Yekem de hatine istînsaxkirin, tên zanîn ku sê heb ji van di arşîva A. Jaba de tên parastin[73].

72 Adak, b.n.r., 2014, r. 278.
73 Adak, b.n.r., 2017, r. 1-29.

# BEŞA YEKEM

## MEWLÛDA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ

### DURRA BİRİNCÎ MEWLÛDA KURMANCÎ

Di vê beşê de em ê li ser Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî rawestin. Me ev beş li ser du qisman dabeş kiriye. Di jêrbeşa yekem de berî her tiştî dê qala rêbaza amadekirina metna Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî bê kirin, bê ka çawa hatiye amadekirin û em ê ji hêla pêwenda metnê, rastnivîs, xalbendî û alfabeya transkripsiyonê ve bidin nasandin û nirxandinan bikin. Piştre di jêrbeşa duyem de jî em ê metna Mewlûda Xelîlî beş bi beş tevî naverok û sernavên wan bînin û di cihên ku pêwîst bikin de agahî û şiroveyan derheqê wan de pêşkêş bikin.

### 1.1. RÊBAZA AMADEKIRINA METNA MEWLÛDA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ

Mebesta me ji vê serenavê ew e ku em metneke nezîkî orjînala wê derxine holê. Lewra metna Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî yekem car e ku bi tîpên latinî tê weşandin. Ji ber vê yekê me jî xwest ku bi awayekî metodî metnê Mewlûdê biweşînin. Her weha li vir pêwist e ku em diyar bikin; me di vê xebate de li ser “Rexneya hundirê metnê” kar kiriye.

Di vê amadekirina metnê rexneyî de me ev xalên jêrê li ber çavan girtine:

1. Wekî ku me li jorê jî behs kir ji bo amadekirina metnê dîwanê me metnê ku M. Sıddik Ataç daye çapkirin esas qebûl kiriye.
2. Piştî ku me metnê mewlûdê bi awayê rast û dirust saz kir me dest bi xebata xwe kir.
3. Di latînîzekirina metnê orîjînal yê bi alfabeya kurdo-erebîk de, ji bo tîpên ku di alfabeya Kurdî ya latînî de cih nagirin, me alfabeya transkrîpsiyonê ya navnetewî ya ku di weşana berhemên bi tenqîd de tê bikaranîn, hilbijartiye.
4. Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî bi tîpên ‘Erebî hatiye nivîsandin. Ji tîpên Mewlûdê hin jê weke: Ç (چ), P (پ), J (ژ) di alfabeya ‘Erebî de nînin û ji berê de di alfabeya kurdî de hene. Me, di wergerandina tîpên ‘Erebî bal bi tîpên latinî ve ji bilî tîpên “Q, q” û “X, x” yê alfabeya navnetewî bi kar anî. Me pêşî alfabeya transkripsyonê derxist û paşê jî dest bikar kir. Alfabeya transkripsiyonê li jêr e:

A a: ا

B b: ب

P p: پ

T t: ت

C c: ج

Ç ç: چ

D d: د

R r: ر

Z z: ز

J j: ژ

S s: س

Ş ş: ش

G g: گ

E e: ە

F f: ف

Q q: ق

K k: ك

L l: ل

M m: م

N n: ن

W w: و

V v: ڤ

X x: خ

H h: ه

Y y: ى

Î î: ى

Ê ê: ي

Ê e: ى

Tîpên ku di alfabeya kurdî de nînin ev in:

ᵓ: ء

S̱s̱: ث

Ṭṭ: ط

Ẓẓ: ظ

ᶜ: ع

Ġġ: غ

Ḥḥ: ح

Ṣṣ: ص

Żż: ض

Ḋḋ: ض

Ẕẕ: ذ

5. Eger di metnê de xeletiyeke eşkere hebe, me ew sererast nekir. Di nusxeyê de çawa hatibe nivîsîn me jî weha nivîsî.

Ji ber ku di destxetê de hijmarên werqan hatibûne nîşandan, me jî ew hijmar di metnê latînîzekirî de bi şeklê **"[w.1]"** nîşan dan. Li vir tîpa "w" di wateya "wereq (rupel)" hejmara "1" hejmara wereqê nîşan dide. Paşî ji bo her beytê hejmara wereqê û hejmara beytên di wê wereqê de bi şiklê **(1/1)** li pêşiya beytan hatine nîşandan.

Wekî mînak:

**[w.1]**

(1/1) Piştî hemdê bêqiyas û bê ᶜeded
Bo Xudayê Waḥid û Ferd û Ṣemed

Di vir de nîşaneya [w.1] hejmara wereqê nîşan dide. Nîşaneya (1/1) jî reqama pêşî a 1ê wereqê reqema duyem a 1î hejmara beyte nîşan dide.

6. Di amadekirina metnê de me wezna mewlûdê yek bi yek li ser beytan tetbîq kir.

7. Peyv, qîmeta xwe ji wateya peyvên din distîne û ev jî pêwenda metnê derdixe pêş. Di vê xebatê de, li ser peyvan, du xebatên bingehîn hatine kirin ku ev rê li ber mirov vedikin ku mirov metnê rast fêhm bike: Pêşî bi xebata ferhengê kifşkirina wateyê, paşê li gorî peywenda metnê xebata hilbijartina wateyan. Hilbijartin, ji aliyekî ve cudahiyeke hişmendî ye û ji aliyekî din ve pêvekirin, tevîhevkirin û lihevanîn e. Vê hilbijartina hişmendî, pêwist bû ji nav van çewtiyên jêrîn biryar daba. Ev çewtî bêtir li ser tîpên ku çewt hatine nivîsandin in:[74]

8. Ji bo rastnivîs û xalbendiya me di amadekirina metna Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî de ev xalên jêr li ber çavan girtin:

Me navên taybet û serê risteyan bi tîpên girdek nivîsandin

Wekî mînak:

**P**iştî hemdê bêqiyas û bê ʻeded

**B**o **X**udayê **W**ahid û **F**erd û **S**emed

[74] Îlhan, h.b., r. 85-862

(1/1)

Me li gorî wateya beytan, cihê ku axaftin tê de hebûn, xalecot (:) bikar aniye:

Wekî mînak:

Polê goştê jehr kirî gotî bizûd**:**
"Min nexwe ez jehr kirim jinka yehûd

(7/4)

Ji bo ayet, hedîs û peyvên navdar me nîşaneya ("…") bikar aniye:

Wekî mînak:

Ewret û destav li 'erdê jê nedîn
Bes tenê bû "Rehmeten lil'alemîn"

(6/8)

Li gorî pêwendê eger ku di wateya beytan de cihê ku banîşan yan jî gazîkirin hebû, me nîşaneya banîşanê (!) bikar anî:

Wekî mînak:

Ey birano**!** pir selatan ser bidin

Lew du'a bê wî qe meqbûl nabitin

(9/1)

9. Di nusxeya mewlûdê de hejmara beytan nehatiye dayîn, lê belê me di vê xebata xwe de ji bo ku beyt hêsantir bêne dîtin, li pêşiya her malikekê hejmara wê nivîsî. Yanê me li binê her malikekê di kevanekê de du reqem nivîsîn, reqema yekem a li aliyê çepê hejmara beşê vedibêje û ya li aliyê rastê jî hejmara malikê derdibire.

Weke mînak:

Ew Xudayê pur li meni'met kirî

Ehmedê hadî li me xil'et kirî

(1/2)

10. Ji bo wekhevî û cudahiyên nusxeyan werin destnîşan kirin me navê nusxeya A.A (Abdurrahmna Adak) û N.G (Nezîr Gümüş binav kir. Cudahî nusxeyan jî me li jêrê destnîşan kirin.

## 1.2. DANASÎNA NUSXEYÊN MEWLÛDÊ

Ji bo destxetên mewlûda Xelîlî, biqasî ku me vekolî, fotokopiyeke destxet û destxeteke eslî ya mewlûdê me bi dest xist. Her weha du çapên mewlûdê yên metbû’ jî me bi dest xistin. Li jêrê em ê li gorî ûsula navnetewî danasîna van nusxeyên destxet bikin û yên metbu’ jî bidin naskirin. Her weha em ê di dawiya vê xebatê de wekî pêvek cih bidin wêneyên van nusxeyan.

Berî ku em dest bi danasîna nusxeyan bikin lazime ku em destnîşan bikin, ku fotokopiya destxeta mewlûda Xelîlî me li cen Abdurraman Adak peyda kir. Wêneyên vê destxetê me di dawiya teza xwe de wekî pêvek bi giştî me bi cih kiriye. Her weha nusxeyekî din ê destxet jî me li cem Nezîr Gümüş jî peyda kir. Nusxeya ku me li cem Abdurrahman Adak peyda kirî me wekî nusxeya Adak Binav kir. Her weha Nusxeya ku me li cem Nezîr Gümüş jî peyda kir me wekî nusxeya Gümüş binav kiriye.

Nusxeya destxet ya Adak ji 27 rûpelan pêk tê û li ser kaxezên bi rengê spî bi tîpên Erebî hatiye nivîsîn. Rûpel li ser du milan bi du xêzên li rex hevdu hatiye dabeşkirin û misra'a yekem li aliyê rastê û ya duyem jî li pêşberî wê bi rengê reş hatiye nivîsîn. Herwiha dorhêla rûpelan jî bi heman awayî bi du xêzên paralel li rex hevdu hatine xêzkirin. Di dawiya her rûpelekê de peyva ku rûpela din bi wê tê destpêkirin, hatiye nivîsîn. Malika ku her beş pê tê destpêkirin, bê navber piştî bidawîbûna beşa berî xwe di nava xêzikên çargoşe de hatiye nivîsîn û misra'ên yekem û duyem li ser hev hatine nivîsîn, yanê misra'a duyem di binê ya yekem de hatiye nivîsîn. Herwiha ji destpêk heya dawiya berhemê, herekeyên rênivîsa Erebî yên weke “ ـَ ,ـِ ,ـُ ,ـّ ” û hwd hatine nivîsîn.

Di beşa peyrew de li ser esasê zanyariyên tewsîfa nusxeyan, em dê li ser nusxeya Adak em ê analîzeke berfireh bikin. Her weha em ê nusxeyên berdest li gorî ûsula navnetewî tewsîfa wan bikin.

**Nusxeya A.A**

Ji ber ku agahî li ser vê nusxeyê kêm in û ji ber ku me ev destxet li cem Abdurrahman Adak peyda kir, me ev nusxe bi vî awayî binav kir.

Li jêrê em ê li gor usûla navnetewî ya danasîna destxetan, tewsîfa destxeta Adak ya mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî pêşkêş bikin. Wekî me li jor jî îfade kir, me ev destxet li cem Abdurraman Adak di dîroka 28.10.2019an de li Mêrdînê me bidest xist. Di vê destxetê de di'aya mewlûdê nehatiye nivîsin. Îstîsnaxê vê destxeta, tarîxa nivîsînê û cihê nivîsînê ne diyare. Her weha ji bo ku şaşî werin serastkirin îstîsnax hinek rêzik ser wan xêz kiriye û ji nûve nivîsiye. Bi gumana me ev yek dide nîşandan ku ev destxet ya xwediyê muellîfên mewlûdê bixwe ye. Lewra ew kesê ku li ber orjînalê metnê mewlûdê îstisnax bike heman şaşiyê di ya xwe de na nivîse. Her weha li gorî texmîna me ev destxet ne ya pêşî ya mûellîf jî be ev destxet ya herî kevin e ku heta niha hatî peyda kirin e. Di heman demê de ev nusxe tam hatiye nivîsîn. Me jî ji ber vê yekê di amadekirina metnê bi tenkît yê mewlûda Xelîlî de ev nusxe li ber çavan girt.

**1. Navê berhemê:** Durra Birincî Mewlûda Kurmancî

**2. Te'lîf, tercume, Şerh:** Te''lîf

**3. Navê nivîskar:** Muhemmed Sîraceddînê Xelîlî

**4. Navê xwedî:** Ne diyar e.

**5. Zimanê destxetê:** Kurdî (Kurmancî)

**6. Serbixwe-mecmû'e:** Serbixwe

**7. Menzûm-mensûr:** Menzûm

**8. Rengê kaxezê:** Rengê kaxizê sipî ye. Lê ji bo ku ev destxet fotokopiye ne kifşe ku orjînala kaxizê çi reng e.

**9. Jimara wereqan:** Berhem tevde 28 wereq e. Lêbelê li gor sîstema rûpelan jî, ji heta jimara 20 jimare hatine dayîn.

**10. Ebadên kaxezê:** 21x15

**11. Cureya xetê:** Şexsî

**12. Îmla:** Îmlaya wê xweş e û bi hereke ye.

**13. Murekkeb:** Reş

**14. Cedwel:** Di hemû wereqan de li her çar kenaran çarçoveyek heye. Lê ji ber ku fotokopiye ev yek di hemû wereqande ne kifşe

**15. Serlewhe:** Nîne

**16. Besmele:** Heye

**17. Sernav:** Nîne

**18. Jimara beytan:** Tevî beytên neqerat bi giştî 174 beyt in.

**19. Jimara rêzan:** Beşa dîbacê 9, beşa sêyem 12 û beşa dehem ji 10 rêzan pêk tê. Beşên din hemû ji 11 rêzan pêk tên

**20. Peyva te'qîbê:** Heye

**21. Qeyda istînsaxê:** Nîne

**22. Tarîxa çapê:** Nîne

**23. Cihê çapê:** Nîne

**24. Temelluk:** Nîne

**25. Destpêka destxetê:** Piştî hemdê bêqiyas û bê ᶜeded
Bo Xudayê Waḥid û Ferd û Ṣemed

**26. Dawiya destxetê:** Bo Sîrac û hazir û her ṣaliha

**Nusxeya N.G**

Ev destxet me 16.12. 2019an de li cem Nezîr Gümüş. Wî jî li Stenbolê li cem melayekî bi dest xistiye. Ev destxet, li gorî agahiyên li ser destxetê, ji aliyê Mela Sîraceddînê Xelîlî bi xwe ve di sala 1976ê Mîladî -1396 Hicrî de li Gundê Dubeynê (İkizdere) bi ser Qezaya Mîdyadê ve girêdayî ye ji bo Sileman Hacî 'Ummer nivîsiye.

Ji ber ku ev destxet me li cem Nezîr Gümüş peyda kir me ev destxet bi vî awayî binav kir. Ev destxet li gorî ya Adak 51 beytan kêm hatiye nivîsîn. Cudahiya vê nusxeyê ji ya Adak ew e ku hem hejmara beytan kêm hatiye nivîsîn hem jî beşa di'ayê

bi awayekî mensur hatiye nivîsin. Giringiyeke din a vê nusxeyê ew e ku îstinsax nivîsîna tarix û cihê nivîsîne destnîşan kiriye. Li jêrê em ê li gor usûla navnetewî ya danasîna destxetan, tewsîfa destxeta Gümüş bikin.

Nusxeya destxet ya Gümüş ji 26 rûpelan pêk tê û li ser kaxezên bi rengê zer bi tîpên Erebî hatiye nivîsîn. Rûpel li ser du milan bi du xêzên li rex hevdu hatiye dabeşkirin û misra'a yekem li aliyê rastê û ya duyem jî li pêşberî wê bi rengê reş hatiye nivîsîn. Herwiha dorhêla rûpelan jî bi heman awayî bi du xêzên paralel li rex hevdu hatine xêzkirin. Di dawiya her rûpelekê de peyva ku rûpela din bi wê tê destpêkirin, hatiye nivîsîn. Malika ku her beş pê tê destpêkirin, bê navber piştî bidawîbûna beşa berî xwe di nava xêzikên çargoşe de hatiye nivîsîn û misra'ên yekem û duyem li rex hev hatine nivîsîn, yanê misra'a duyem li cem ya yekem de hatiye nivîsîn. Di navabera beyta yekem û duyem de ji serî heta dawiyê situnek hatiye keşandin. Wekî neqerat sê beyt tên dubarekirin lê tenê ev beyta jê di nava çarçoveyekê de hatiye nivîsîn.

Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam

Tû bide her dem li fexrê ‘am û tam

Herwiha ji destpêk heya dawiya berhemê, herekeyên rênivîsa Erebî yên weke “ ـَ ,ـِ ,ـُ ,ـّ ” û hwd hatine nivîsîn. Di vê nusxeyê de serlewhe jî heye. Dîsa divê were gotin ku ev destxet ne bi serêxwe ye. Di dawiya destxetê de eqaîdek hatiye nivîsîn.

Di beşa peyrew de li ser esasê zanyariyên tewsîfa nusxeyan, em dê li ser nusxeya Gümüş em ê analîzeke berfireh bikin

.

**1. Navê berhemê:** Durra Birincî Mewlûda Kurmancî

**2. Te’lîf, tercume, Şerh:** Te‟lîf

**3. Navê nivîskar:** Muhemmed Sîraceddînê Xelîlî

**4. Navê xwedî:** Muhemmed Sîraceddînê Xelîlî

**5. Zimanê destxetê:** Kurdî (Kurmancî)

**6. Serbixwe-mecmû’e:** Mecmû’e

**7. Menzûm-mensûr:** Menzûm

**8. Rengê kaxezê:** Rengê kaxizê zer e.

**9. Jimara wereqan:** Berhem tevde 26 wereq e. Her weha li gorî sîstema rûpelan jî hejmar li ser rûpelan bi ‘erebî hanine nivîsîn.

**10. Ebadên kaxezê:** 21x16

**11. Cureya xetê:** Şexsî

**12. Îmla:** Îmlaya wê xweş e û bi hereke ye.

**13. Murekkeb:** Reş

**14. Cedwel:** Di hemû wereqan de li her çar kenaran çarçoveyek heye. Di navbera beytan de sitûnek hatiye dayîn. Beytên neqeratê di nava çarçoveyekî de hatiye nivîsîn. Her weha di nava berhemê de nexşên cuda jî hatine nexşandin.

**15. Serlewhe:** Heye

**16. Besmele:** Heye

**17. Sernav:** Nîne. Lê ji bo beşa di’a ye serenav hatiye bikaranîn.

**18. Jimara beytan:** Tevî beytên neqerat bi giştî 125 beyt in.

**19. Jimara rêzan:** Beşa dîbacê 9, beşa sêyem 12 û beşa dehem ji 10 rêzan pêk tê. Beşên din hemû ji 11 rêzan pêk tên

**20. Peyva te’qîbê:** Heye

**21. Qeyda istînsaxê:** Nîne

**22. Tarîxa çapê:** 1976 M. (1396 H.)

**23. Cihê çapê:** Gundê Dubeynê (İkizdere) Qezaya Mîdyadê

**24. Temelluk:** Nîne

**25. Destpêka destxetê:** Piştî hemdê bêqiyas û bê ᶜeded
Bo Xudayê Waḥid û Ferd û Ṣemed

**26. Dawiya destxetê:** Ji me û dê û bavê me, kiflet û ehl û dost û cîranê me û çiqa kesê ehlê îmanê û ji vê meclisê re, û xwedî xêran temaman re; El-Fatihete.

Li jêr em ê her du nusxeyên metbu’ yên mewlûda Xalîlî bidin nasandin.

Nusxeya ku ji aliyê M. Siddîq Ataç ve di sala 2001î de li Nisêbînê hatî weşandin. Ji weşanxaneya Renk Ofset ve hatiye weşandin. Bergê vê nusxeyê yê pêşî kesk e û li ser bergê wê bi tîpên Erebî: Kitêba Durra Birincî Mewlûda Kurmancî Bi Nezm û Pevgihandina, Seydayê Mela Muhemmed Sîraceddîn Kurê Mela Ebdulhekîmê Xelîlî Xudayê Mezin Li Wan Rehmê Bike (amîn) hatiye nivîsin. Ebadên kaxizê 27x20 e. Renge kaxizê spî ye û bi hibra ra reş hatiye nivîsîn. Berhem bi tevahî 182 beyt in. Dawiya berhemê de, Di'a bi awayekî mensûr hatiye nivîsîn. Diwazdeh rupel e lê li gorî sîstema rûpelan jî hejmar hatine dayîn. Qeyda îstinsax nîne lê yê ku tehqîq kiri M. Sidiq Ataç e. Di dawiya berhemê de bi tîpên Erebî behsa Mela Sîraceddînê Xelîlî û malbata wî hatiye kirin. Her weha di dawiya berhemê de bi serenaveke cuda behsa gundê Xelîla hatiye kirin.

Her weha nusxeyeke din a metbu' ya mewlûda Xelîlî din jî me peyda kir. Ev nusxe di sala di sala 2009an de ji aliyê weşanxaneya Dua ve li Stenbolê hatiye weşandin. Bergê vê nusxeyê şîn e. Li ser bergê wê bi tîpên erebî navê mewlûdê û mûellîfên mewlûdê hatiye nivîsin. Berî ku dest bi metnê mewlûdê were kirin bi serenava muqeddemet bi erebî jiyan û mewlûda wî hatiye nivîsîn. Bi tevahî ji 23 rûpelan pêk tê. Li gorî sîstema rûpelan hejamar bi tîpên latinî li jêr û li milê çepê hejmar li ser hatine nivîsîn. Bi tevahî ev nusxe ji 89 beytan pêk hatiye. Wekî nusxeya destxet ya fotokopî di vê nusxeyê de jî beşa di'ayê bi awayekî menzûm hatiye nivîsîn. Li her çar kenaran çarçoveyek hatiye dayîn û dora vê çarçoveyê hatiye neqişandin. Renge kaxizan zer e û rengê murekkebê reş e. Lê ji bo beyta neqerat e rengê sor hatiye bikar anîn. Li ser bergê dawî yê mewlûdê bi zimanê Tirkî "Kürtçe Mevlid-i Şerif" hatiye nivîsîn. Her navê berhemê û mûellîfên berhemê jî hatiye nivîsîn. Her weha li vir îstinsaxê vê nusxeyê bi navê Molla Abdullah el-Botî hatiye nivîsîn. Li jêr me weneyê vê nusxeyê wekî pêvek bi cih kiriye.

## 1.3. METNÊ MEWLÛDA XELÎLÎ

**Mewlûda Xelîlî bi Navê**

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî**

**Bismillahîrrehmanirrehîm**

**[Faʿilatun Faʿilatun Faʿilun]**

**[w.1]**

(1/1) Piştî ḥemdê bê qiyas û bê ᶜeded
Bo Xudayê Waḥid û Ferd û Ṣemed

(1/2) Ew Xudayê pur li me niᶜmet kirî
Eḥmedê hadî li me xilᶜet kirî

(1/3) Çêtir e bo me ji rûḥ û can û mal
Şafi'ê roja giran e ey heval

(1/4) Wa Xudayo! her bibarîn bêjimar
Mis̱lê baran û mij û ṭav û bihar

(1/5) Reḥmet û êmintiya j' derd û kula
Ser Muhemmed melhema can û dila

(1/6) Hem li al û hogir û yarê ewî
Hem li etbaᶜ û ricadarê ewî

**[w.2]**

(2/1) Heq te ᶜala pur bibê raẓî ji wan
Çar(i)yarê rêberê zan û nezan

(2/2) Hem me jî raẓî bike ya Reb hewar
Xatirê Muḥemmed û her çar (i)yar

**(2/3) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(2/4) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(2/5) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê 'am û tam**

(2/6) Min divê ez bo bira xizmet bikim
Reşbelek Kurmanciya xwe xet bikim

(2/7) Mewlûda Peyġemberê axir zeman
Çê bikim da zanibin pê yê nezan

**[w.3]**

(3/1) Wextê xwendin ku li wêna guh bidin
Yek bi yek me'nê ewê tev zanibin

(3/2) Da bi wê me'dê temaman xweş bibê
Muḥbeta Eḥmed di dil de geş bibê

(3/3) Belkî hişyar bin ji ġeflet hin ji me
Zanibin rêgirtina wî lazim e

(3/4) Piştî ferẓan sunnetê wî da bikin
Mehdera heşrê bi heq haṣil bikin

(3/5) Nekne dil ḥubba evê dunya ġedar
Her wekî gotî ewî Şahê Kubar:

(3/6) "*Muḥbeta dunya serê çiqqa gunah*"
Ê xwe jê dûr kê ew e dostê Îlah

---

A.A. Wextê] N.G: Weqtê

**(3/7) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**[w.4]**

**(4/1) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(4/2) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê 'am û tam**

(4/3) Weṣfê Eḥmed kî bibêjê her zeman
Qeṭ xelaṣ nakin qelem zar û ziman

(4/4) Dar û ber ger tev qelem bin hem hibir
Jê re çêbin avê rûbar û behir

(4/5) Cumleyê cinn û melek insan û ᶜam
Tev bibin katib heta roja qiyam

(4/6) Qeṭ nikarin weṣfê wechê wî bidin
Nûr û tîrêjê ku her dem jê diçin

(4/7) Çêtir e j'çiqqa kesê ġeyrî Xudê
Hem ji bo wî Heq Xuda reḥmê didê

**[w.5]**

(5/1) Çê kirin Rebbê mezin hejdeh hezar
ᶜAlemê mis̱lê evê dunya ġedar

(5/2) Tev ji bona xatirê Peyġemberî
Daye wî bo van temaman serwerî

(5/3) Ṣed hezar û bîst hezar û çar hezar
Enbiya çê bûn ji nûra Şehsuwar

(5/4) Ew temam hêvî dikin jê mehderê
Da ku êmin bin ji tirsa mehşerê

**(5/6) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(5/7) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(5/8) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê 'am û tam**

**[w.6]**

(6/1) Qam û bejna wî ne kin bû ne dirêj
Wechê wî ṣor û sipî bû nûr dirêj

(6/2) Her dû çavê reş belek qozî hebûn
Birh û mijgûla muwê reş pur hebûn

(6/3) Aniya peḥn û fereh bêhvil çelak
Dev wekî gustîl didan mircanê pak

(6/4) Wî guliyya reş ji pêşa nîvê ser
Hin li rast û hin li çep kir bû du ker

(6/5) Ew riha ṭahir çi reş bû pir bi mû
Lê girover j'gerdenê derbas nebû

**[w.7]**

(7/1) Nav milê peḥn û bi mû çengê dirêj
Sing fereh bû zik çiqa rast e bibêj

---

3/12 Xas û 'am] N.G: 'am û tam
4/2 Çavên] N.G: Çavê

(7/2) Bes mil û çengê ewî mû lê hebûn
Ser û rih nozdeh muwê spî tê de bûn

(7/3) Pir nebû qor û qelew levhatî bû
Bejn û bala ku Xuda hostayî bû

**(7/4) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(7/5) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(7/6) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê 'am û tam**

(7/7) Ṭeb^c û exlaqê wî yê qenc ey bira!
Nagihin hedd û hisabê deftera

(7/8) Ġeyd û dilgirtin li ser tiştên dinê
Qeṭ nekir zatê ewî yek car tenê

**[w.8]**

(8/1) Lê li ser bêşer^ciya hiddet dikir
Hingî kê karî li wechê wî fekir

(8/2) Pur fihêtî wî hebû hê zêdetir
J' wê keça bûka li pişt perd û sitir

(8/3) Wî selama xwe d'veda berya heval
Meş wekî herkandina ava zelal

5/2 Carek tenê] N.G: yek car tenê

(8/4) Cil digel ṣola xwe pîne lê didan
Gel feqîran wî dixwarî av û nan

(8/5) Ku berê xwe b'da hevalan laş hemî
Wî diqulbandî bi wa re d'kelimî

(8/6) Pir beşaş û kêm ken û merdî hebû
Xeṣletê napak û şik yek lê nebû

**(8/7) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**[w.9]**

**(9/1) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(9/2) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê 'am û tam**

(9/3) Xassetê wî roj û şev wek hev didî
Hem li pêş û paş wekî hev wî didî

(9/4) Sih li ᶜerdê wî nebû çavên belek
Radizan qelbî dikir zikrê gelek

(9/5) Ling di qûmê nediçû xwarê li bin
Lê diçû xwarê di teḥta wek hesin

(9/6) Ger birûniṣta li nav komek zilam
Her dû mil zêde j'milê wan xaṣ û ᶜam

(9/7) Destê xwe ger wî bida destê yekî
Bêhna miskê jê dikir sê rojekî

**[w.10]**

(10/1) Pêl nekir şeyṭên û bawuşkî nebû
Kovî û ṭeyran ji ber wî rev nebû

(10/2) Mêş nedanîbû li ser laş û li cil
Hatî dunya sunnetî dû çav bi kil

(10/3) ‘Ewret û destav li ᶜerdê jê nedîn
Bes tenê bû “*rehmeten lil’alemîn*”.

**(10/4) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(10/5) Qeṭ nekin vala devê xwe j’ṣelewat**
**Da Xuda we b’ parizênê ji şewat**

(10/6) **Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê ‘am û tam**

(10/7) Pê re dişteġlîn gelek hişk û bi can
Hin nebûn dev hin jî bê zehr û ziman

**[w.11]**

(11/1) Wek zuġur xwarin di mista wî de bûn
His kirin ehlê civatê dîtibûn

(11/2) Dar û ber ser wî selam dan bêjimar
Qurmê xurmê j’firqetê kir zarezar

(11/3) Polê goştê jehr kirî gotî bi zûd:
“Min nexwe ez jehr kirim jinka yehûd”

(11/4) Ba dikir dara bi lez hatin li cem
Koviyan ser dan selam û pur kerem

(11/5) Pêre diştexlîn deve żebb û xezal
Gur ji xelqê re digo zû herne bal

(11/6) Av ji nav tilya diherkî ku du<sup>c</sup>a
Wî dikir bo her nexweş dîtin şifa

(11/7) Ev bes e Qurʾan ji bo te Heq şiyand
Dînê baṭil te bi wê lev wergerand

**[w.12]**

**(12/1) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(12/2) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(12/3) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê 'am û tam**

(12/4) Ku ᶜumir bû bîst û pênc sal ey heval
Zewicî ew bi Xedîca pak û 'al

(12/5) Wextê çil sal wî li dunyayê buwar
Ewwelê Qurʾanê "Iqreʾ" hate xwar

(12/6) ᶜUmrî bû pêncî yû sê hicret kirî
Bal Medînê ve li wê dê êwirî

(12/7) Piştî heşt sala ji hicret feteḥand
Mekkeha şîrîn ji dest muşrik derand

**[w.13]**

(13/1) Ya dehê hicret ku çû ḥecca mezin
Bûye ḥecca xatira hem barkirin

(13/2) Cumᶜe bû ser ‘Erefatê xutbe da

Dîn bi teblîġa wî ekmel kir Xuda

(13/3) Taliya Qurʾanê hingî jê re hat
Bîst û sê sala temam bû ew xelat

(13/4) Yazdehê hicret Rebîᶜulewwelê

Şêst û sê sal kir gehayî ezelê

**(13/5) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**

**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(13/6) Qeṭ nekin vala devê xwe j’ṣelewat**

**Da Xuda we b’ parizênê ji şewat**

**(13/7) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**

**Tû bide her dem li fexrê ‘am û tam**

(9/1) Ey birano! Pir ṣelatan ser bidin

Lew du’a bê wî qe meqbûl nabitin

**[w.14]**

(14/1) Gotî wî ẕatê hebîbê rûh û can

Yek ṣelatê ser me bê şekk û guman

(14/2) Ê bidê Ḥeq ser didê deh reḥmeta

Deh bi ṣed ṣed bi hezarê niᶜmeta

(14/3) Ê hezara ser me dê roja giran

Dê ez û ew tev de çin baġê cinan

(14/4) Yek melek ser rewḋeya min her heye

Kî ṣelata ser me dê pê zane ye

(14/5) Paşî wê bêjê filan lawê filan
Ev ṣelatê ha li ser canê te dan

(14/6) Hingî ez dilxweş dibim pê wê demê
Mehdera min Ḥeq kirî roja ġemê

(14/7) Ya Îlahî me bike bin mehderê
Me bi wî re tu bibe ser kewserê

**[w.15]**

**(15/1) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(15/2) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(15/3) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê 'am û tam**

(15/4) Qedrê mewlûdu'n-nebî bigrin heval
Da ḥeşir bin hun digel ehlê kemal

(15/5) Guh bidin ser xwendinê ġafil nebin
Qal û qîla hûn nekin ẕikrê bidin

(15/6) Pêbixin fanûs û find û lukusa
ᶜÛd û ᶜenber hun bişewtênin wusa

**[w.16]**

(16/1) Xaniyê ku lê bixwênin mewludê
Heq Xuda çavê xerab wê jê vedê

(16/2) Xêr û ber'ket pur dibê rehm lê dibar
Tên melek şef şef ji jorê têne xwar

(16/3) Av û zad û zêr û zîv zêde dibin
Xwendina mewlûdê ku ser wan bidin

(16/4) Qedrê wê zehf e qe nayê weşfetê
Lê di xêrê de nekin hun rûmetê

**(16/5) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(16/6) Qeṭ nekin vala devê xwe j'şelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(16/7) Ya Îlahî şed şelat û şed selam**
**Tû bide her dem li fexrê 'am û tam**

**[w.17]**

(17/1) Nûriha wî j'Ademî ket pişt û zik
Ta bi ᶜEbdullah xelaşin nîne şik

(17/2) Lê ji ᶜEbdullah heta ᶜEdnan ev in
Bîst û yek bav in hemî lê guh bidin

(17/3) ᶜEbdullah ᶜEbdu'l-muṭellib Haşim e
Yek ji wan ᶜEbdu'l-menafê ᶜalim e

(17/4) Yek Quşey û yek Kulab û Murre Keᶜb
Hem Lueyy û Xalib û Fehrê ᶜEreb

(17/5) Malik û Neđret Kenan e ey ceger
Yek Xuzeyme Mudrîk e Ilyas Muđer

(17/6) Yek Nizar û yek Me'ed ᶜEdnan temam
Tev behiştî ne diçin daru's-selam

(17/7) Lê ji ᶜEdnanî heta Adem neseb
Bê tifaq in ᶜalim û ehlê edeb

**[w.18]**

(18/1) Ya Îlahî me ᶜefû ke el-eman
Xatirê vê silsila qîmet giran

**(18/2) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(18/3) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(18/4) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê ᶜam û tam**

(18/5) Amîna ew horiya baġê cemal
Wextê hemlê xemmilî j'nûra zelal

(18/6) Got: Çiqa heyvek ji hemlê min dihat
Yek nebî bo min bi mizgînî dihat

(18/7) Ya yekî heyva Recep bavê beşer
Hatibû Adem dida min xweş xeber

**[w.19]**

(19/1) Ya dido Şîs̱ ya sisê Idrîs nebî
Ṣed ṣelat gotin li ser hemlê te bî

(19/2) Nûh di çarê Hûd di pêncê de me dîn
Dane mizgînî bi "Xeyru'l-Murselîn"

(19/3) Mahê şeş va hatî Îbrahîm di heft
Hatî Isma'îl bi şahî hem bi bext

(19/4) Hem di heştê de nebî Mûsa dihat
Ser Muḥemmed pur digotin ṣelewat

(19/5) Ya nehê ᶜÎsa dixwendin es-selam
Tu gehiştiye hebîbê xaṣ û ᶜam

**(19/6) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(19/7) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**[w.20]**

**(20/1) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê ᶜam û tam**

(20/2) Min di hemlê de gelek nîşan didîn
Hem ji ber min perde bi'l-cumle firîn

(20/3) Meşriq û meġrib dibûn rohnî żiya
Qeṣrê Buṣrayê ji Şamê bûn xuya

(20/4) Ta "Rebî'ul Ewwelê" heyva nehê
Heşt şevê min çûn ketî şêva nehê

(20/5) Ya deh û yazdeh li min tirsek nebû
Bû duwazdeh ew şeva dûşembe bû

(20/6) Kes li mala min nebû kiflet temam
Wan bi xwe ava dikir Beytu'l-Ḥeram

(20/7) Semsemê weldandinê ẓahir dibûn
Beyreqê kesk j'asîman nazil dibûn

**[w.21]**

(21/1) Yek li banê beytê danîn yek li ġerb
Yek li şerqê min didîtî bêᶜeceb

(22/2) Bir bi bir hor û melek va têne xwar
Şuᶜle û nûrê digirtim çar kenar

**(22/3) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(22/4) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(22/5) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê ᶜam û tam**

(22/6) Tirsiyam min dî di cih de ew mezel
Rohnî bû şewqê dida çol û cebel

(22/7) Şeq dibû dîwar ji navê têne der
Çar jinê horîṣifet wek qozeqer[75]

**[w.22]**

(22/1) Meryem û Hewwa û Sara Asiye
Bûne pîrik bo Ḥebîbê hadiye

(22/3) Tî dibûm hingî gelek min dî yekê
Dabû destê min qedeh ser destekê

[75] Qozeqer: Bûka baranê

(22/4)  Tev gulab û ᶜenber û şekkir di nav
Min vexwar hînik dibûn cerg û hinav

(22/5) Sala Fîl mîladî hingî ev hebû
Pênc sed û heftê û yek salê de bû

(22/6)  Mahê Nîsan bîst û do çê bû bihar
Gul ji bişkojan dibişkiftin li dar

(22/7)  Ṭeyrekî spî çengê xwe ser min re bir
Hingî bûbû Ehmedê min ṣed şikir

**(14/9)  Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**[w.23]**

**(23/1) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(23/2)  Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê ᶜam û tam**

(23/3) Xweş bi xêr hat xweş bi xêr hat xweş bi xêr
Xweş bi xêr hat wî tijî kir xêr û bêr

(23/4)  Xweş bi xêr hat lew sitêr bûne bizot
Xweş bi xêr hat canê şeytanan disot

(23/5)  Xweş bi xêr hat dîn û meẕheb red kirin
Xweş bi xêr hat ins û cin esᶜed kirin

(23/6) Xweş bi xêr hat agir û eṣnam û lat
Xweş bi xêr hat kirne bê ṣebr û tebat

**[w.24]**

(24/1) Xweş bi xêr hat reḥmeten li'l- ᶜalemîn
Xweş bi xêr hat xwendî Qurʾana mubîn

(24/2) Xweş bi xêr hat wextê ku nû bû ji da
Xweş bi xêr hat dest bi jor ve hildida

(24/3) Xweş bi xêr hat kir duᶜa bo ummetê
Xweş bi xêr hat da nebîne zeḥmetê

(24/4) Xweş bi xêr hat ya Xuda her mu'minîn
Xweş bi xêr hat ᶜef ke bo Şahê emîn

**(24/5) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(24/6) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(24/7) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê ᶜam û tam**

**[w.25]**

(25/1) Hemd û weṣfê çê ji bo Rebbê mezin
Ew Xudayê em ji axê çêkirin

(25/2) Bêḥesêb min dan ṣelat û pur selam
Ser Muḥemmed al û eṣḥaban temam

(25/3) Ya Xuda em hewce ne merdî ji te
Em neqenc in luṭf û ġufran her ji te

(17/4) Tu bi ḥeqqê Eḥmedê nûrîn bikê
Me di dunya hewceyê pîsa nekê

(25/5) Ber mirin me b'parêzênê j'le'netê
Wextê heşrê qeṭ nedê yek zeḥmetê

**[w.26]**

(26/1) Me ji bona xatirê vê mewludê
Her musulman saḥibê vê mewlidê

(26/2) Rast bike ᶜîşê me tev tu l'vê dinê
Hem li wê dunya me dûr ke j'ṣotinê

(26/3) Bo **Sîrac** û ḥazir û her ṣaliḥa
Ku temam bû hun bixwênin Fatiḥa

**(26/4) Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî**
**Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî**

**(226/5) Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat**
**Da Xuda we b' parizênê ji şewat**

**(26/6) Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam**
**Tû bide her dem li fexrê ᶜam û tam**

**Bismi'l-lahirreḥmani'r-rehîm**

El-Ḥemdu li'l-lahî Rebbi'l-ᶜalemîn. We's-ṣelatu we's-selamu ᶜela seyyidina Muḥemmedin xatemil-enbiyaî we'l-murselîn. We ᶜela alihî we ṣehbihî ecmeᶜîn.

Ellahumme ya Rebbî tu bi heqqê zat û ṣifatê xwe kî, tu bi hurmeta Muhemmedini'l- Muṣṭefa hebîbê xwe kî, tu ġeẓeba xwe ji me dûr bikî, reḥma xwe li me bikî, me ji $^{c}$ezabê qebrê û fitna saġbûnê û mirinê û ji $^{c}$ezabê Cehnemê êmin bikî. Li vê dunyayê xweşkatiyê û başiyê bidî me. Tu ḥifẓa me ji şerê cin û ins û şeyṭanan bikî. Li ber mirinê îmana me qaîm bikî. Di heşrê de me fihêtkar nekî. Li ber mirinê me deyndar nekî. Di ser pirê ve me derbas bikî. Derê Cehnemê li ber me bigirî. Ê Cennetê li ber me vekî. Di Cennetu-l firdewsê de, di Cîrantiya Muhemmed Muṣṭefa de ṣellellah û ‘eleyhî we-sellem cihê me çê bikî. Bi dîtina nûr û cemala wechê xwe çavê me rohnî bikî. Dilê me geş û şa bikî. Ji me û dê û bavê me, kiflet û ehl û dost û cîranê me û çiqa kesê ehlê îmanê û ji vê meclisê re, û xwedî xêran temaman re; El-Fatihete me$^{c}$e-s-Ṣelewat.

# BEŞA DUYEM

# VEKOLÎNA MEWLÛDA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ

Di vê beşê de dê li ser Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî bê rawestandin û ev mewlûd ji hêlên cuda ve dê bê nirxandin û şirovekirin. Di vê çarçoveyê de ev beş li ser çar mijarên sereke dê bê dabeşkirin. Di qismê yekem de em ê Mewlûda Sîrceddînê Xelîlî bi awayekî giştî bidin nasîn û li ser navê wê yê orjînal, sebebên nivîsandina wê û piştre jî li ser tertîba wê bisekinin bê ka ji kîjan beşan pêk tê û beşên wê çawa hatine rêzkirin. Di qismê duyem de em ê li ser zimanê Mewlûdê bisekinin bê ka çawa hatiye nivîsandin û li gor berhemên din ên Kurdî yên kilasîk taybetî û cudahiyên wê çi ne? Herwiha em ê unsurên zimanên erebî, farisî û tirkî yên ku tê de cih digirin destnîşan bikin. Di qismê sêyem de em ê berhemê ji hêla teşe û taybetiyên helbestê ve binirxînin. Li vê derê em ê mewlûda Xelîlî ji hêla wezn, qafiye, cureyên qafiyeyan, redîf û cureyên wê ve binirxînin. Di mijara dawîn ango çarem de jî em ê Mewlûdê ji aliyê hunerên edebî ve binirxînin û bidin nasandin. Di çarçoveya vê mijarê de em ê li ser hêla weke teşbîh, istîare, tenasûb, telmîh, tekrîr, intaq, nîda, tezat, îstîfham, alîterasyon, asonans, mubalexe û îqtibas bisekirin. Herwiha di vê beşê de em ê mewlûdê ji aliyê naverokê ve jî binirxînin; bê ka Mewlûda Xelîlî ji hêla naverok û rêzebûyeran ve çawan e.

## 2.1. DANASÎNA GIŞTÎ

### 2.1.1. Navê Berhemê

Mela Sîracedînê Xelîlî navekî taybet li mewlûda xwe kiriye. Li ser berga Mewlûdê

“Durra Birincî Mewlûda Kurmancî”

Bi Nezm Û Pevgihandina,

Seydayê Mela Muhemmed Sîraceddîn Kurê Mela Ebdulhekîmê Xelîlî

Xudayê Mezin Li Wan Rehmê Bike (amîn).”

Mela Sîracedînê Xelîlî di van beytên jêrîn de jî navê Mewlûda xwe wek *Durra Birîncî* diyar kiriye:

Ji pêla yekê bi destê Sîracî

Derxistiye ev **Durra birincî**

Wekî ku ji agahiyên jor jî diyar dibe, Mela Sîreceddînê Xelîlî navê berhema xwe *Durra Birincî Mewlûda Kurmancî* daniye. Hêjayî gotinê ye ku Xelîlî di navê mewlûda xwe de serî li hunera sec'ê daye û di dawiya ravekan de qafiyeya "ci" yê bi kar aniye.

### 2.1.2. Sebebê Te'lifê

Di berhemên destnivîs û bi taybetî di yên edebiyata klasîk de zikirkirina tarîxa berhemê xaleke giring e. Ev yek nirxê berhemê zêde dike.

Mela Sîraceddînê Xelîlî jî serî li vê kevneşopiyê daye û dîroka nivîsîna Mewlûda xwe di van beytên jêr de weha destnîşan kiriye:

Ger te bivê tarîxê bizanî

Xewwasê mahir ji behra sanî

Çilîqa çarê ku lanehî bû

Di gêra yekê de mewca sanî bû

Ji pêla yekê bi destê Sîracî

Derxistiye ev Durra birincî

Tarîxa nivîsandinê / Hicrî 1381 / Mîladî 1960

## 2.2.AVAHIYA DEREKÎ

### 2.2.1. Teşeya Nezmê

Di edebiyata klasîk de Mewlûdnameyên menzûm bi teşeya mesnewiyê hatine nivîsîn û teşeya mesnewiyê jî qafiyeyeyek xwe ya taybet heye. Bi gotineke din yeke nezmê ya mewlûdê beyt e û bi yekeya mesnewiyê hatiye nivîsîn.

Peyva mesnewiyê di zimanê Erebî de bi rêya nisbetê ji cotepeyva “mesna mesna” yê hatiye daraştin ku wateya wê “didu didu”, yan jî “cot cot” e. Ji ber ku di teşeya mesnewiyê de du misrayên her beytekê di nava xwe de hemserwa ne, bi gotineke dî ji ber ku serwaya beytên wê cot, di edebiyata Farisî de ji vê teşeyê re “mesnewî” hatiye gotin.[76]

Di mesnewiyê de yekeya nezmê û sîstema serwayê weha tê şematîzekirin:

aa, bb, cc …[77]

### 2.2.2. Tertîba Berhemê

Tertîb yek ji mijarên herî girîng a berhemên menzûm e ku divê bê berçavkirin. Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî beş bi beş hatiye rêzkirin. Berhem ji pazdeh beşan pêk hatiye. Li gorî naveroka mijaran beşên mewlûdê weha ne:

1. Hemd û Sena
2. Sebeba Nivîsandina Mewlûda Nebî
3. Pesna Nebî
4. Şekla Nebî
5. Tebî’eta Nebî
6. Xasiyeta Nebî
7. Mu’cîzatê Nebî
8. Şiyandina Nebî
9. Xêra Selewatan Li Ser Nebî
10. Xêra Mewlûdu’n-Nebî
11. Silsila Nebî
12. Wiladeta Nebî (Bi Navê “Wiladeta Nebî” Sê Beş Hene)
13. Bixêrhatina Nebî
14. Dawiya Mewlûdu’n-Nebî
15. Du’aya Mewlûdu’n-Nebî

Di dawiya hemî beşan de sê malik têne dubarekirin. Beşa dawî du’aya Mewlûdê jî bi awayekî mensûr hatiye nivîsandin.

---

[76] Adak, b.n., 2019, r. 245.
[77] Adak, h.b., r. 246.

Çawa ku me got, tertîb yek ji mijarên herî girîng a berhemên menzûm e. Mewlûda Xelîlî bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsandin. Mesnewî bi piranî ji bo nivîsandina berhemên dûr û dirêj tê bikaranîn. Ji ber ku di mesneiyê de tu sînorek li hember hejmara beytan tuneye destê helbestvanan ji bo nivîsandina helbestên dirêj vekirî ye. Standarteke mesnewiyan ji hêla pêkhateya wan ve heye. Pêkhateya wan ji sê beşên sereke pêk tê ku ew jî Dîbaçe, Mijara Sereke û Xatîme ye.[78] Em ê li jêrê Mewlûda Xelîlî ji van hêlan ve binirxînin û nîşan bidin bê ka kîjan sernavên mewlûda wî dikevin kîjan beşa mesnewiyê.

#### 4.1.1. Dîbace

Mesnewî çi kurt bin, çi dirêj, dîbace ango pêşek şert e. Di mesnewiyan de mesnewînûs bi beşa dîbaçeyê dest bi berhema xwe dike û di vê beşê de berî her tiştî cih dide "besmele"yê (Bismillahi'r-rehmani'r-rehîm) ku destpêkirina bi navê Xwedê îfade dike. Piştre berî ku dest bi mijara sereke ya mesnewiyê bike, di beşa dîbaçeyê de cih dide çendîn mijarên destpêkî ku di berhemên edebî yên serdema kilasîk de hebûna wan wek stansarteke edebî dihat qebûlkirin. Ev mijarên ku di beşên dîbaçeyê yên mesnewiyan de cih digirtin bi rêzê û bi awayekî giştî ev in: Tewhîd, munacat, ne't, medhiye û sebebê te'lîfê.[79]

Di mewlûda Xelîlî de ku mesnewiyek e 11 malikên pêşîn li ser hemdê Xwedê û ne'ta Resûlê Xwedê û medha her çar yar (xelîfe) û heval û hogirên pêxemberê îslamê ne û şîretan li guhdarên Mewlûda Nebî dikin. Bi vî awayî tehmîd, ne’t û medhê çar xelîfeyan di bin yek sernavî de hatine komkirin. Di beşa duyem de ango sebebê nivîsandina Mewlûdu’n-Nebî de jî bi zimanekî fesîh û zelal qala sedemên nivîsandina berhemê tê kirin.

Bi vî awayî em dikarin 22 malikên pêşîn yanê beşa yekem ku hemd û sena ye û herwiha beşa duyem ku tê de sebebên nivîsandina berhemê tên gotin, weke dîbaçeya Mewlûda Xelîlî dikarin binirxînin.

---

[78] Adak, b.n., 2019, r. 267-321.

[79] Adak, h.b., r. 268.

### 4.1.2. Beşa Sereke

Beşa sereke, beşa herî berfireh a mesnewiyê ye ku tê de mijara bingehîn a mesnewiyê bi hûrgilî tê pêşkêşkirin. Di terîba mesnewiyê de beşa sereke piştî dîbaçeyê û berî xatîmeyê cih digire. Di vê beşê de mijar bi piranî weke xelekên zincîrî bi hev ve girêdayî ne û ji bo her xelekekê sernavek tê bikaranîn. Di edebiyatên Farisî û Tirkî de xeleka yekem beşa sereke di bin sernavên wek "axazê dastan", "axazê qisse" û "metle'ê dastan" de tê nivîsîn ku hemû jî wateya destpêka dastanê didin. Ji van sernavan tê fêmkirin ku dîbaçeya mesnewiyê qediyaye û êdî beşa sereke dest pê kiriye.[80]

Ji beşa sisiyan heya bi beşa sêzdehan a Mewlûda Xelîlî weke mijara sereke berhemê ne. Ji ber ku Mela Sîracedîn di van beşan de derbasî naveroka berhema xwe bûye û tê de qala pesnê nebî, şeklê nebî, xasiyetê nebî, mucîzatê nebî, şiyandina nebî, xêra selewatan li ser nebî, xêra mewlûdu'n-nebî, silsila nebî, wiladeta nebî û bixêrhatina wî dike. Mijara Sereke ya Mewlûda Xelîlî ji 11 beşan û 121 malikan pêk tê.

### 4.1.3. Xatîme

Beşa xatîmeyê ya mesnewiyan, beşa xilaskirin û dawîlêanîna mesnewiyê ye. Di nav beşa xatîmeyê de bi piranî binbeş tunene û ji ber vê jî di beşa xatîmeyê de tenê sernavek tê bikaranîn. Di vî sernavî de jî terkîbên wek xatîmetu'-kîtab" (terkîba erebî), "xatîmeê kîtab" (terkîba Farisî), yan jî "xetmşodenê kîtab" (terkîba Erebî-Farisî) tên bikaranîn. Çawa ku tê dîtin, di her sê terkîban de jî peyvên "xatîme" yan jî "xetm"ê derbas dibin ku wateya xilaskirina kîtabê didin.[81] Di Mewlûda Xelîlî de jî çawa ku ji navê wê diyar e, beşa Dawiya Mewlûdu'n-Nebî weke xatimeya berhemê hatiye nivîsandin. Ev beş jî ji 11 malikan pêk tê.

## 2.2.3. Hecma Wê

Tişta ku hecma Mewlûdan diyar dike jimara beytên wan e. Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî bi tevahî ji 17 beşan û tevî beytên neqeratê ji 182 beytan pêk tê. Her weha ji xeynî serenav, qertaf, daçek û gîhanekan bi tevahî di mewlûdê de 2015 peyv hatine bikaranîn.

---

80 Adak, b.n., 2019, r. 310-311.
81 Adak, h.b., r. 315.

Ji ber ku Xelîlî beşa yekem wekî beş hejmar nedayê me jî beşên mewlûdê li gorî hejmar dayîna wî berçav kirin. Lê şeş beytên di destpêka mewlûdê de me li tevahiya hejmara beytan zêde kirin. Li jêrê hejmara beytên her beşê û serenav û naveroka wan bi kurtasî hatine nivîsîn.

Beşa Yekem: Ji bo vê beşê sernav nehatiye nivîsandin. Ji 8 beytan pêk tê. Di vê beşê de li ser hemd û sena û şikir kirina xwedê sekiniye.

Beşa Duyem: **“Sebebê Nivîsandina Mewlûdu’n-Nebî”** ye. Ji 8 beytan pêk te. Di vê beşê de wekî ku ji serenavê jî tê diyarkirin behsa sebebê nivîsandina Mewlûda “Durra Birincî Mewlûda Kurmancî” hatiye kirin. Her weha di vê beşê de aniye ziman ku ji bo gelê xwe û zimanê xwe xizmet bike

Beşa Sêyem: **“Pesnê Nebî”** ye. Ji 9 beytan pêk tê Di vê beşê de behsa pesindayîna Hz. Muhemmed (s.a.w.) hatiye kirin

Beşa Çarem: **“Şeklê Nebî”**ye. Ji 8 beytan pêk tê. Di vê beşê de behsa şekl û şemala Hz. Muhemmed (s.a.w.) hatiye kirin

Beşa Pêncem: **“Tebî’eta Nebî”** ye ji 8 beytan pêk tê. Di vê beşe de behsa exlaqê Hz. Muhemmed (s.a.w) hatiye kiri

Beşa Şeşem: **“Xasiyetên Nebî”**ye. Ji 8 beytan pêk. Di vê beşê de behsa teybetmendiyên Hz. Muhemmed (s.a.w) hatiye kirin.

Beşa Heftem: **“Mu’cîzeta Nebî”** ye. Ji 8 beytan pêk tê. Di vê beşêde behsa mu’cîzetên ku di jiyana Hz. Muhemmed de (s.a.w.) hatine dîtin û çendek ji wan mu’cîzetan hatine bikaranîn

Beşa Heştem: **“Şiyandina Nebî”**ye. Ji 8 beytan pêk tê. Di vê beşê de behsa zewac bi Hz. Xatîce re, hatine ayeta İqra’, koçkirina bal Medîneyê, derxistina bajarê Mekkehê ji destê mişrikan û hatina temamê Qurana Pîroz di a di jiyna Hz. Muhemmed (s.a.w.) hatine behskirin.

Beşa Nehem: **“Xêra Selewatan li Ser Nebî”** ye. Ji 8beytan pêk tê. Di vê beşê de behsa giringiya selewatên li ser Hz. Muhemmed (s.a.w.) hatiye kirin.

Beşa Dehem: **“Xêra Mewlûdu’n-Nebî”** ye. Ji 7 beytan pêk tê. Di vê beşê de behsa giringiya xwendina Mewlûdê, Cihê ku Mewlûd lê were xwendin ji qeza û

belayan dûr dikeve, Xêr û bereketa wir zêde dibe, Rehm lê dibare, zad, av, zêr û zîvên ku Mewlûd li ser were xwendin zêde dibin. Hatiye behskirin

Beşa Yazdehem: **"Silsileya Nebî"**ye. Ji 8 beytan pêk tê. Di vê beşêde behsa silsileya Hz. Muhemmed (s.a.w.) hatiye kirin. Di vê beşê de behsa 21baviken Hz. Muhemmed (s.a.w.) hatiye kirin

Beşa Dozdehem: **"Wîladeta Nebî"** ye. Ji 8 beytan pêk tê. Di vê beşê de: Hemlebûyîna Hz. Emîne û mizgîniya Pêxemberan di pevajoya di hemlebûyîna wê de hatine bikaranîn.

Beşa Sêzdehemîn: **"Wîladeta Nebî"** ye. Ji 8 beytan pêk tê. Di vê beşê de diîtina hin bûyerên di peyvajoya hemlebûna Hz. Amîne ku dîtin tê behskirin.

Beşa Çardehemîn: **"Wîladeta Nebî"** ye. Ji 8 beytan pêk tê. Di vê beşê de behsa roja jidayîkbûyîn û dîroka jidayîkbûyîna Hz. Muhemmed (s.a.w.) hatiye kirin.

Beşa Pazdehemîn: "**Bixêrhatina Nebî**" ye. Ji 8 beytan pêk tê. Di vê beşê de gazîkirin, Şabaşî, silavdayîna ji bo çêbûna Hz. Muhemmed (s.a.w.) hatiye bikaranîn.

Beş Şazdehemîn: "**Dawiya Mewlûdu'n-Nebî"** ye. Ji 8 beytan pêk tê. Kurtasiyek ji beşên Mewlûdeye. Di vê beşê de di'a ji xwedê re hatine kirin ku ew kesên Mewlûdê didin xwendin wan bide xatirê xêra Mewlûdê. Her weha nivîskarê "Mewlûda Durra birîncî Mewlûda Kurmancî" Mela Sîraceddînê Xelîlî di vê beşê de wekî mexlas "Sîrac" bi kar anîye.

Beşa Hevdehem: **"Du'aya Mewlûdu'n-Nebî"** ye. Ev beş bi şiklê pexşankî hatiye nivîsandin. Di vê beşê de ji du'a ji bo xwedê hatiye kirin.

Wekî ku ji hejmara beytên beşan jî diyar dibe Xelîlî mewlûda xwe di nava ahengekî de nivîsiye. Ji bilî beşa sêyem (9 beyt) û beşa dehem (7 beyt) beşên din tev ji bilî beytên neqeratê ji 8 beytan pêk hatine.

Ji bo ku em hecma Mewlûda Xelîlî binirxînin me serî li mewlûdên din da bê ka hecm wan çiqas e û ji çend beş û malikan pêk tên:

*Gula Narincî Mewlûda Kurmancî*, Şêx Feyzullahê Findikî, 3 beş, 91 malik.[82]

---

[82] M. Zahir Ertekin, "*Seyîd Feyzullahê Findikî û Herdu Mewlûdên Wî yên Kurdî"*, Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu Bildirileri, y.y., İstanbul 2012, r. 9.

*Hate Sefa di Mewlûda Mistefa*, Şêx Feyzullahê Findikî, 10, 111 malik. [83]

*Mewlûda Pêxember*, Tîrêj, 10 beş, 321 malik.[84]

*Mewlûd,* Adar Jiyan, 9 beş, 304 malik.[85]

*Mewlûda Fexri Alemê Muhammed (s.a),* Seyyid Mela Abdurrehman weledê Mela Hemze, 16 beş, 220 malik.[86]

*Mewlûdu'n-Nebî 'eleyhi's selatu we's-selam*, Mela Eliyê Baqustanî, 13 beş, 519 malik. (Nusxeya destxeta Baqustanî bi xwe)[87]

*Mewlîdî' n-Nebî* Şeyh Muhhammed Emîn Haydarî, beş nehatiye diyarkirin, 320 malik.[88]

*Mewlûd-î Şerîf,* M. Zahid Kardeşlîk, 22 beş, 687 malik.[89]

*Mewlûda Kurdî bi Zimanê Gundî*, Es-Seyyid Bedreddin İbni Molla Salih el-Hüseyni eş-Şafii el-Kufsurî, 220 malik.[90]

*Ava Heyat*, Mele Alî bîn es-Seyyîd Abdurrahman, 17 beş, 247 malik.[91]

*Mewlûda Şerîf,* Mela Muhammed Ali Fudeylî, 16-18 beş, 510-514 malik.[92]

*Mewlîda Pêxember*, Mele Silêman Kurşun, 286 malik.[93]

*Mewlûda Kurdî bi Şêwaza Hedbî,* M. Burhan el-Hedbî, 199 malik.[94]

*Mewlida Pêxember,* Feyzullah Xaznewî Xizmetkarê Ma'newî, 410 malik.[95]

Heke em hecma Mewlûda Xelîlî li gor van mewlûdan binirxînin, em dibînin ku hecma wê li gor yên din hindiktir e. Yanê em bi hesabkirina nîveka van mewlûdan

---

83 Ertekin, b.n., 2012, r. 9.
84 Hayreddin Kızıl, *"Sê Mewlûdnameyên Nuh Ên Bi Kurdiya Kurmancî*", e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi 10/3, 2018, r. 1039.
85 Kızıl, b.n., 2018, r. 1045.
86 Kızıl, h.b., r. 1048.
87 M. Zahir Ertekin, Me*la 'Eliyê Baqustanî û Mewlûda Wî,* Mukaddime, 2015, r. 105.
88 Hayreddin Kızıl *"Ceribandinek Li Ser Senifandina Mewlûdên Kurdiya Kurmancî Li Gorî Mijarên Wan*", International Journal of Kurdish Studies 1/1, 2015, r. 60.
89 h., b., r. 61.
90 h., b., r. 62.
91 h., b., r. 63.
92 h., b., r. 63.
93 h., b., r. 86.
94 h., b., r. 88.
95 h., b., r. 92.

dibînin ku serê her mewlûdekê bi qasî 302 malikan dikeve, ev li halekî ye ku hejmara malikên Mewlûda Xelîlî 182 ye.

## 2.3.ZIMANÊ MEWLÛDÊ

Mela Sîraceddînê Xelîlî Mewlûda xwe bi zimanekî fesîh û zelal nivîsandiye û zimanê rojane bi kar aniye. Wexta ku em li bikaranîna zimanê mewlûdê dinêrin, em dikarin bi rehetî vê bibibêjin ku Mela Sîraceddînê Xelîlî ji aliyê zimên ve gelekî serkeftî ye. Zimanê ku di mewlûda xwe de bi kar aniye xurt û herikbar e. Wekî din zimanê wî gelekî sivik e û di roja me de bi hêsanî tê fêhmkirin. Kesekî ku xwendina wî tunebe jî dikare bi hesanî zimanê Mewlûda wî fêhm bike. Peyvên ku bi zimanên biyanî bi kar anîne jî, ew peyv in ku derbasî zimanê kurdî bûne û têgihiştina wan pir hêsan e.

Di edebiyata klasîk de teybetiyeke weha heye ku helbetvan di nava helbestên xwe de dixwazin hunera xwe yên ziman bidin nîşandan. Helbestvan û nivîskarên Edebiyata Kurdî ya Klasîk jî di helbestên xwe de ev hunera xwe bi awayekî eşkere destnîşan kirine. Ev hunera xwe carinan bi giştî di nivîsîna helbesteke zimanê biyanî de, carinan jê jî di nava riste, beyt û hevokên xwe de destnîşan kirine. Mele Sîraceddînê Xelîlî jî ev hunera xwe di mewlûda xwe de daye ber çavan.

Wekî ku Nezîr Gümüş jî tesbît kiriye, Xelîlî bi Kurdî, Erebî, Farisî û Tirkî dizanîbû. Ji xeynî Tirkî di her sê zimanên dî de gelekî serkeftî ye. Lewra di dîwana xwe de helbestên spehî bi van her sê zimanan nivîsandine.[96] Wek dîwana wî, di mewlûda wî de jî bandora van her çar zimanan tê dîtin. Em ê li jêr bandora van zimanan li ser mewlûda wî rave bikin.

### 2.3.1. Unsûren ‘Erebî

Xelîlî di mewlûda xwe de piştî zimanê Kurdî bi piranî ji zimanê ‘Erebî sûd wergirtiye û ev ziman gelekî bi kar aniye. Di beytên mewlûda xwe de carinan îfadeyên ‘Erebî bi kar anîne, carinan jî ji ayet û hedîsan îqtibas kiriye.

Hin peyvên ‘Erebî ku Xelîlî di mewlûda xwe de bikaranîn ev in: Hemd, qiyas, ‘eded, wahid, ferd, semed, ni’met, hadî, xil’et, rûh, can, mal, şafî, misle, rahmet, al,

[96] Gümüş, b.n.r., 2019, r.17.

etba’, heq te’ela, reb, nebî, selewat, ilahî, fexir, xizmet, mewlûd, axir, zeman, me’ne, me’d, muhebet, xeflet, ferz, sunnet, mehder, heşir, hasil, hubba, xelas, qelem, hibir, behr, cin, ins, wesf, wech, nûr, rebb, enbîya, mehşer, mircan, tahir, teb’, beşer, sitir, qelb, zikir, xas, ‘am, misk, firqet, kerem, batil, hicret…




**Grafîk 1:** Bi tevahî hejmara peyvan û hejmara peyvên ‘Erebî.

Me tevahiya peyvên ku di mewlûda Xelîlî de hatine bikaranîn hejmartin. Li gorî vê yekê ji xeynî serenav, daçek, gîhanek û qertafan bi tevahî 2015 peyv hatine tespîtkirin. Di nava van peyvan de 587 peyv ku bi zimanê ‘Erebî hatin nivîsîn. Ev yek di grafîka jorîn de jî tê dîtin.

### 2.3.2. Unsûrên Farisî

Di mewlûda Xelîlî de bandora unsûrên zimanê Farisî kêm tê dîtin. Tenê di nav beytan de hin peyvên Farisî hatine bikaranîn. Wekî mînak em dikarin van peyvan nîşan bidin. **“pesin, mah, çar, sê, pur, perd, dost, şehsuwar, gulab”**

Xelîlî car caran terkîbên farisî jî bi kar anîne.

Wekî mînak:

Heq te ᶜala pur bibê raẓî ji wan
**Çar(i)yarê** rêberê zan û nezan

(2/1)

Hem me jî raẓî bike ya Reb hewar
Xatirê Muḥemmed û her **çar (i)yar**

(2/2)

Nekne dil ḥubba evê dunya ġedar
Her wekî gotî ewî Şahê Kubar:

(3/5)

### 2.3.3. Unsûrên Tirkî

Di mewlûda Xelîlî de unsûrên Tirkî jî pir kêm in. Di mewlûdê de me peyvên wekî “bayrak, birinci, lûkus, nîsan” peyda kirin.

Wekî mînak:

Ji pêla yekê bi destê Sîracî

Derxistiye ev Dura **Birincî**

## 2.4.WEZN, QAFIYE, REDÎF

### 2.4.1. Wezna mewlûdê

Wezna Mewlûda Xelîlî bi keşa, “Fâ’ilatûn / Fâ’ilatûn / Fâ’ilûn” ku ji behra remelê ye û qalibekî nesalim e hatiye nivîsîn.

Wa Xudayo! her bibarîn bêjimar

— + — — / — + — — / — + — — / — + —

Mis̱lê baran û mij û ṭav û bihar

— + — — / — + — — / — + — — / — + —

(1/4)

Di beyta jêrîn de serî li zîhafê daye:

Pir nebû qor û qelew levhatî bû

— + — — / — + — — / — + — — / — + —

Bejn û bala ku Xuda hostayî bû

— + — — / — + — — / — + — — / — + —

(7/3)

Di vê beytê de di hêceya dawîn a “levhatî” de zîhaf heye.

Di beyta jêrîn de jî serî li îmaleyê daye:

Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat
Da Xuda we b' parizênê ji şewat

(2/4)

Di vê beytê de di hêceya yekem a "ṣelewat" û "ji" ya "ji şewat"ê de îmale heye.

Nav milê peḥn û bi mû çengê dirêj
Sing fereh bû zik çiqa rast e bibêj

(7/1)

Di vê beytê de di hêceya dawîn a "rast e" de îmale heye.

### 2.4.2. Qafiye

Di ferhengê de wateya qafiyeyê, pişta serî ye ku ev peyv bi forma "qefa" derbasî Kurdî jî bûye. Peyva piştre wateya "dawiya tiştekî" û di edebiyatê de jî "dawiya beytê" bi dest xistiye. Wekî têgeheke edebî qafiye ew ahenga ku di dawiya betê yan jî di wî cehê ku wekî dawiya beytê tê qebûlkirin de, ji dubarekirina dengên di navbera peyvên cihêwate de derdikeve meydanê. Di edebiyata kilasîk de ji wan herfên ku tên dubarekirin re herfên "rewî" yê tê gotin. Hevbeşiya redîfê pêwist e di binemaya bêjeyan de çêbibe.[97]

#### 2.4.2.1. Qafiyeya Tam

Qafiyeya tam, di helbestan de ji paşiya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji bilî redîfê, wekheviya du dengan e[98]. Ev cureyê qafiyeyê di mewlûda Xelîlî de pir hatiye biakaranîn.

Wekî mînak

Kes li mala min nebû kiflet tem**am**
Wan bi xwe ava dikir Beytu'l-Ḥer**am**

(20/6)

Bir bi bir hor û melek va têne xw**ar**
Şuᶜle û nûrê digirtim çar ken**ar**

97 Adak, b.n., 2014, r. 395.
98 M. Ali Yekta Saraç, "*Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*", 2. Bs, 3F, İstanbul 2007, r. 270-271.

(22/2)

Weke ku ji beytên jor jî diyar dibe tîpên**…am…am, …ar…ar** weke qafiyeya tam hatine bikaranîn.

### 2.4.2.2. Qafiyeya Dewlemend

Qafiyeya dewlemend, di helbestan de ji paşiya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji bilî redîfê, wekheviya sê dengan e.[99]

Wekî mînak:

Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣel**ewat**
Da Xuda we b' parizênê ji ş**ewat**

(2/4)

Lewra Xuda 'efû dikê gun**ehan**

Çiqqa bikê bende di sal û m**ehan**

Di beytên jor de tîpên **ewat, ehan weke** qafiyeya dewlemend hatine bikaranîn.

### 2.4.2.3. Qafiyeya Nîv

Qafiyeya nîv, di helbestan de ji paşiya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji bilî redîfê, wekheviya dengekî bitenê ye.[100]

Wekî mînak:

Ew riha ṭahir çi reş bû pir bi m**û**
Lê girover j'gerdenê derbas neb**û**

(6/5)

99 Saraç, h.b., r. 269-271-272.
100 Saraç, h.b., r. 267




**Grafîk 2:** Li gorî hejmara beytan rêjeya qafiyeyan di mewlûda Xelîlî de.




**Grafîk 3:** Hejmara cureyên qafiyeyan di mewlûda Xelîlî de.

### 2.4.3. Redîf

Redîf digel kêşa erûzê unsura herî girîng ên estetîk û ahenga helbesta klasîk e. Piştî serwayê û di dawiya misrayan de ji her cure tekrarênku tên kirin re paşserwa (redîf) tê gotin.[101]

Wekî Mînak:

Da bi wê me<sup>c</sup>dê temaman xweş bibê
Muḥbeta Eḥmed di dil de geş bibê

(3/2)

**eş bibê**: redîf.

Li gorî tiştên ku tên dubarekirin sê cureyên redîfê hene.

### 2.4.4. Qertaf

Di vê cureya redîfê de tiştên ku tên dubarekirin ji qertafan tenê pêk tên.[102]

Wekî mînak:

Ya Îlahî me bike bin mehderê
Me bi wî re tu bibe ser kewserê

(14/7)

**ê:** redîf

### 2.4.5. Qertaf û Bêje/Kombêje

Di vê cureya redîfê de titên ku tên dubarekirin ji qertaf û bêje yan jî ji kombêjeyan pêk tên[103]

Wekî Mînak:

**Bêje**

Ew Xudayê pur li me ni<sup>c</sup>met kirî
Eḥmedê hadî li me xil<sup>c</sup>et kirî

(1/2)

---

[101] Adak, b.n., 2014, r. 395.
[102] Adak, b.n.r., 2014, r. 399.
[103] Adak, h.b., r. 399-400.

**kirî:** redîf

**Qertaf û kombêje:**

Ta "Rebî'ul Ewwelê" heyva nehê
Heşt şevê min çûn ketî şêva nehê

(20/4)

**a nehê:** redif

### 2.4.6. Tenê Bêje/Kombêje

Di vê cureya redîfê de qertaf tine ye. Piştî Qafiye yê bêje yan jî kombêje tên dubarekirin.[104]

Wekî Minak:

Çilîqa çarê gola nehê **bû**

Di gêra yekê de mewca sisê **bû**

**bû:** redîf

## 2.5. HÛNERÊN EDEBÎ

Di metnên edebî de hûnerên edebî ji bo têgihiştin û şîrovekirinê cihekî xwe yê giring hene. Mela Sîraceddînê Xelîlî jî di Mewlûda xwe de cih daye hûnerên edebî. Gava ku em li Mewlûda Xelîlî dinêrin tê dîtin ku herî zêde hunera teşbîhê derdikeve pêş. Her weha hûnerên telmîh, tezat û nîdayê jî gelekî derdikevin pêşya me.

Li jêrê em dê hûnerên edebî yek bi yek di gel mînakan ji bo mewlûda Xelîlî bidin.

### 2.5.1. Teşbîh

Teşbîh bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê şibandin û lêkçivandin e. Hûnera şibandinê ye. Ji bo ku peyv bêtir bihêz bibe mirov pêyva bêhêz dişibîne ya bihêz.[105]

Wekî mînak

Reḥmet û êmintiya j' derd û kula

[104] Adak, b.n.r., 2014, r. 400.
[105] Vedat Ali Tok, "*Edebi Sanatlar Ansiklopedisi*", Konya, 2011, r. 285.

**Ser Muhemmed melhema can û dila**

(1/5)

Di vir de di navbera Muhemmed û melhemêde şibandinek heye.

Aniya peḥn û fereh bêhvil çelak

Dev wekî gustîl didan mircanê pak

(6/3)

Di vê beytê de dev û gustîl, didan û mircan hatine şibandin

### 2.5.2. Îstîare

Îsti'are bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê jî emanetgirtin an jî deynkirin e.[106] Ev huner, hunereke şibandinê ye; lê di vê şibandinê de ji ya ku dişibe û ya ku tê şibandin yek tenê tê bikaranîn. Her weha bêjeya ku bêjeya ku bi emanenetî hatiye hilgirtin dikare di wateya mecazî de jî were bikaranîn.

Di îsti'areyê de hunera teşbîhê pêwist e, ev yek jî nîşan dide ku îsti'are rewşeke taybetiya hunera teşbîhê ye. Li gorî vê taybetiyê jî îsti'are, bi riya negotina muşebbehê yan jî muşebbehun bîhê derdikeve hole. Ji her duyan yek nayê bikaranîn[107]

Wekî mînak:

Wek zuġur xwarin di mista wî de bûn
His kirin ehlê civatê dîtibûn

(11/1)

Gotî wî ẕatê hebîbê rûh û can

Yek ṣelatê ser me bê şekk û guman

(14/1)

Ehle civatê û zatê hebîb wekî hunera îsti'areyê hatine bikaranîn.

### 2.5.3. Tenasûb

Tenasûb ji koka nesebe tê û bêjeyeke 'Erebî ye. Wayeta wê ya ferhengî, lêhatin, munasibî, pêketin û bihevgirtin e.[108] Di yekeya helbestekê de eger peyvên ku di

---

[106] Ferit Devellioğlu, "*Osmanlıca Türkçe Ansiklopedik Sözlük*," Aydın Kitapevi Yayınları, Ankara 2008, r. 453.

[107] Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2009, r. 412.

[108] Devellioğlu, h.b., r. 1076.

navbera wan de têkilî hene bi hevre werine bikaranîn wê çaxê hunera Tenasûbê li wir heye.[109]

Wekî mînak:

Pêbixin fanûs û find û lukusa
ᶜÛd û ᶜenber hun bişewtênin wusa

(15/6)

Wekî ku ji wateya wan jî diyar dibe, di navbera "pêxistin, fanus, find û lûkus" têkiliyek heye. Ev yek jî di yekeya helbestê de wekî hunera tenasûbê tê dîtin.

Ew Xudayê pur li me niᶜmet kirî
Eḥmedê hadî li me xilᶜet kirî

(1/2)

Heman tişt ji bo "baran, mij û bihar" ê jî derbas dibe.

### 2.5.4. Telmîh

Telmîh peyveke 'Erebîye û wateya wê ya ferhengî çirûsandin e. Wekî hunereke edebî ev huner kesên navdar û dîrokî tîne bîra mirovan. Ev bîranîn, bîranîneke Qur'anê, bîranîna kesayetên navdar, gotineke pêşiyan, pêkenokeke navdar, bûyereke dîrokî an jî helbesteke navdar e.[110]

Wekî mînak:

Yek Quṣey û yek Kulab û Murre Keᶜb
Hem Lueyy û Xalib û Fehrê ᶜEreb

(17/4)

Mahê şeş va hatî Îbrahîm di heft
Hatî Isma'îl bi şahî hem bi bext

(19/3)

Di van her du beytan de navê çên pêxemberan hatiye yadkirin. Wate jê yanî div ir de hunera telmîhê heye.

---

109 Tok, h.b., r. 274.
110 R. Selçuk Uysal, "*Belagat ve Edebi Sanatlar Lügatı*", Doğu Kitapevi, İstanbul 2010, r. 198.

### 2.5.5. Tekrîr

Tekrîr bêjeyeke 'Erebî ye û tê wateya dubarekirinê.[111] Ev huner, di yekeya helbestê de gotinek an jî peyvek du sê caran werin dubarekirin, tê wê wateyê ku li wir hunera tekrîrê heye. Hûnera tekrîrê dibe hegera afirandina musîqaya wateyî û hunduranî.[112]

Wekî mînak:

Xweş bi xêr hat xweş bi xêr hat xweş bi xêr
Xweş bi xêr hat wî tijî kir xêr û bêr

(23/3)

Wekî ku ji beyta jor jî diyar dibe hunera tekrîrê hatiye bikaranîn.

### 2.5.6. Teşxîs û Întaq

Teşxîs peyveke erebî ye û tê wateya kesatîpêdanê. Di nav hunerên edebî de jî ew e ku kesek taybetiyên mirovan û kesan bide tiştan û wan bi rewş û tîtalên mirovan bide nîşandan û wek mirovan raber bike[113].

Wateya teşxîs û întaqê ya têgehî jî ew e ku tiştên hest, tevger, axaftina wan tunebe wekî mirovan dibihîsin, hereket dikin, hîs dikin û diaxivin[114]

Wekî mînak:

Dar û ber ser wî selam dan bêjimar
Qurmê xurmê j'firqetê kir zarezar

(11/2)

Polê goştê jehr kirî gotî bi zûd:
"Min nexwe ez jehr kirim jinka yehûd"

(11/3)

Bi awayekî eşkere tê dîtin ku ji bilî mirovan hebûnên din diaxivin. Ev yek jî dide nîşandan ku hunera întaqê xwe div an beytan de nîşanî me dide.

---

111 Devellioğlu, h.b., r. 1067.
112 Perwîz Cîhanî, *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Çapa Yekem, Nûbihar, İstanbul 2010, r. 57.
113 Cîhanî, h.b., r. 54.
114 Tok, h.b., r. 294.

### 2.5.7. Nîda

Nîda bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê bangkirin, gazîkirin û qîrîn e.[115] Hunera edebî ya gazîkiri an jî dengkirinê ye. Hin bûyerên ku helbestkar gelekî hestiyar dikin û kelecana wî bilind dikin vê hunerê derdixin meydanê. Piştî vê hestiyarî û kelecanê, helbestkar wan bûyeran û kesan tîne ber çavên xwe û bangî wan dike.[116] Ji ber vê yekê jî gelek caran nîda bi hunerên tekrîr û teşxîsê re tê bikaranîn. Bi peyvên weke "ey, ya, aya, wa" ev huner tê kirin.

Wekî mînak:

**Wa** Xuday**o**! her bibarîn bêjimar
Mis̱lê baran û mij û ṭav û bihar
(1/4)

Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî
Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî
(2/3)

Bi peyvên "wa, o û ey" hunera nîdayê pêk hatiye.

### 2.5.8. Tezat

Ev huner, hunera dijitiyê ye. Yanî du peyvên li dijî hev bi hev re tên bikaranîn.

Wekî mînak:

Qam û bejna wî ne kin bû ne dirêj
Wechê wî ṣor û sipî bû nûr dirêj
(6/1)

Wî guliyya reş ji pêşa nîvê ser
Hin li rast û hin li çep kir bû du ker
(6/4)

Bi peyvên "kin-dirêj û rast-çep" hunera tezatê hatiye kirin.

---

115 Devellioğlu, h.b., r. 833.
116 Dilçin, h.b., r. 412. 253.

### 2.5.9. Îstîfham

Di yekeya helbestê de îstîfaham, hunera pirsê ye. Ji bo ku wate bi hêz bi be pirs tê kirin. Gelek caran ev pirs ne li hêviya bersivê ye.

Wekî mînak:

Polê goştê jehr kirî gotî bi zûd:
“Min nexwe ez jehr kirim jinka yehûd”

(11/3)

### 2.5.10. Alîterasyon

Wateya hunera alîterasyonê ya têgehîn, dubarekirina konsonantên (bêdeng) bêjeyên di helbestê an jî di nesrê de ye. Armanca vê hunerê ew e ku di helbestê de ahengeke xweş derxe meydanê[117]

Wekî mînak:

Xweş bi xêr hat kir du’a bo ummetê

Xweş bi xêr hat da nebînê zehmetê

(16/1)

Wekî ji beyta jor jî diyar dibe, bêdengên wekî “x,b, w, t” hatine dubarekirin. Wate jê ew e ku vir de hunera alîterasyonê heye.

### 2.5.11. Asonans

Wateya hunera asonansê ya têgehî, dubarekirina vokalên (bi deng) bêjeyên di helbestê an jî di nesrê de ye[118]

Wekî mînak:

Xweş bi xêr hat kir duᶜa bo ummetê
Xweş bi xêr hat da nebîne zeḥmetê

(24/3)

Wekî ku me ji bo hunera alîterasyonê goti bû, di vir de berevajiyê wê dengdêrên wekî “e, ê, i, a” hatine dubarekirin. Ev yek jî hunera asonans ê di de nîşandan.

---

117 Tok, h.b., r. 35.
118 Tok, h.b., r. 35.

### 2.5.12. Mubalexa

Mubalexe peyveke erebî ye û tê wateya pir mezinkirina karekî yan tiştekî[119] Wateya mubalexeyê ya têgehîn jî, bi tesîra bûyerekê an jî kelecanekê objeyê ji şiklê wê yî rastînî pir mezintir an jî pir biçûktir nîşandan.[120] Kesek li şîroveya tiştekî gelekî zêderewiyê bike mirov dikare bibêje di vir de mubalexe heye. Di mubalexeyê de tiştên ku mirov jê bawer neke û li dijî hewna mirovan tê dîtin û ev tiştên ku tên bilêvkirin tu caran pêk nayên.

Wekî mînak:

Weṣfê Eḥmed kî bibêjê her zeman
Qeṭ xelaṣ nakin qelem zar û ziman

(4/3)

Dar û ber ger tev qelem bin hem hibir
Jê re çêbin avê rûbar û behir

(4/4)

Cumleyê cinn û melek insan û ᶜam
Tev bibin katib heta roja qiyam

(4/5)

Qeṭ nikarin weṣfê wechê wî bidin
Nûr û tîrêjê ku her dem jê diçin

(4/6)

Wexta em bi tevahî liv an beytên jor binerin tê dîtin ku mubalexayek derdikeve pêş me. Ev yek jî hunera mubelexa yê ji me re dide nîşandan

### 2.5.13. Îqtibas

Îqtibas bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê, bêyî guherîn jêgirtina hevokekê an jî bêjeyekê ye[121] Wateya wê ya têgehîn, di helbest an di nesrekê de– divê bi mijara ku tê behskirin re eleqedar be- nivîsîna ayetek, hedîsek, qisseyeke navdar, gotineke navdar û hwd. Were bikaranîn wê demê hunera îqtibasê çêdibe. Di helbestan de bi gelemperî ayet yan hedîsên ku tên zikr kirin tenê qismek ji wan tên îqtîbaskirin[122]

[119] Devellioğlu, h.b., r. 630.
[120] Tok, h.b., r. 189.
[121] Devellioğlu, h.b., r. 424.
[122] Tok, h.b., r. 189.

Di mewlûda Xelîlî de di hin cihan de me îqtibas jî tespît kirin. Ev îqtibas hinek ayet, hedîs û bûyerên dîrokî destnîşan dikin.

Wekî mînak:

‘Ewret û destav li ᶜerdê jê nedîn
Bes tenê bû ***“rehmeten lil’alemîn”.***

(10/3)

“*Muḥbeta dunya serê çiqqa gunah*”
Ê xwe jê dûr kê ew e dostê Îlah

(3/6)

Ev îqtibasa ku me nîşan kirî. Di qur’ana pîroz de di sureya enbîyayê weha derbas dibe: “Me ti ji bo rehmeta ‘aleman şand” ayeta 107 nîşan dike.

Di beyteke din de:

Wextê çil sal wî li dunyayê buwar
Ewwelê Qurʾanê “Iqreʾ” hate xwar

(12/5)

Îqtibasa ku me nîşan kirî, di sureya ‘Eleqê de ayeta ku pêşî hatî nazil kirin nîşan dide.

## 2.6. NAVEROK

Dema ku ji aliyê naverokî û rêzebûyeran ve em li mewlûda Xelîlî dinêrin, tê dîtin ku bi tevahî li ser wîladeta Hz. Muhemmed hetiye rawestan. Xelîlî bi hemd û senayê dest bi mewlûda xwe kiriye. Berdewama wê de di beşa duyem de sebê nivîsandina mewlûda xwe eşkere kiriye. Piştî vê beşê bi rêzê li ser pesnê nebî, şeklê nebî, tebî’etê nebî, xasiyetê nebî, mu’cîzatê nebî, şiyandina nebî, xêra selewatan li ser nebî, xêra mewlûda Nebî, silsila nebî, wiladeta nebî (bi navê “wiladeta nebî” sê beş hene), bixêrhatina nebî û di’aya mewlûda nebî dawî li mewlûda xwe aniye.

Ji bo ku naveroka mewlûdê baş were famkirin li jêrê, beş bi beş naveroka mewlûda Xelîlî em ê binivîsin.

**Beş 1**

Ji beyta 1ê destpê dike û bi beyta 8an bi dawî dibe. Ev beş beşa Hemd û Senayê ye. Piştî pesindayîna bê hempa di gel navê xwedê, Wahid, Ferd û Samed, ew xudayê

ku pir nî'met dane me û Ehmedê Hadî (Hz. Muhemmed) şiyandiye ji bo me, çêtire ji rih, can û malê me lewra di roja nexweş û girande ew ê şefa'etê li me bike. Berdewama vê de ji xwedê lava û hêviyan dike ku ew herdem weke mislê barana biharî, bi qasî ewr û asîmanan rehmetê li ser Muhemmed ê ku wekî can û dil bi nav kiriye bike. Hem li al, heval, hogir û ricaderê wî, hem jî çar xelîfeyên ummeta wî xwdê razî be. Dawiya her du beytên beşa yekem de hewra xwe digihîne xwe ku ji bo xatirê Muhemmd Pexember û herçar xelîfeyan rehmetê li wan bike.

Wekî Bateyî Mela Sîracceddînê Xelîlî jî di vê beşê de navên xwedê yên cur bi cur wekî: Wahid, Ferd û Semed bikar anîne.

**Beş 2**

Ji beyta 9an dest pê dike bi beyta 16an dawî dibe. Ev beş ji 8 beytan pêk tê. Sebebê Nivîsandina Mewlûdu'n-Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin) hatiye binavkirin. Di vê beşê de Mela Sîracceddînê Xelîlî sebebê nivisandina Mewlûda xwe aniye ziman.

Min divê ku ez ji bo gelê xwe xizmet bikim û bi gotina wî "Reşbelek Kurmanciya" xwe binivîsim. Mewlûda axirê zeman binivîsim da ku yên nezan hîn bibin. Wexta ku Mewlûd hate xwendin û yên nezan guhdana Mewlûdê kirin, wê ma'neya wê tê derxin û hîn bibin. Bi vî awayî ma'dê temaman wê xweş bibi, işq û muhbeta Ehmedî wê di dilê wan de geş bibî. Belkî hinek ji me, ew ê ku ne di reya Hz. Muhemmed de, ji xelfetê hişyar bibin û di reya wî de bi meşin. Bi vî awayî piştî ferzên limêjê sinetê wî bikin û roja mehşerê li xwe hasil bikin. Her wekî ku xudê gotiye bila "nekne dilê xwe ew ê ku li pey putperestan dimeşin". Wê wan ji muhbeta û mal û milkê dinyayê bi xêra Cenabê Pêxember dur bibe.

**Beş 3**

Ji beyta 9an dest pê dike bi beyta 16an bi dawî dibe. Ev beş ji 9 beyta pêk tê û di vê beşê de pesnê Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin) hatiye dayîn.

Di her çar beytên pêşî yên vê beşê de Mela Sîracceddînê Xelîlî pesindayîna Cenabê Pexembêr weha aniye ziman: Kî bixwazê ku wesfê Hz. Muhemmed bide ticarî xelas nake. Pênûs, ziman û zarave têra dayîna wesfê wî nakin. Eger dar û ber tev jî bibin hibir û wekî rubaran û derayayan bibin jî û 'alema insan û cinan tev jî bibin

nivîskar heta roja qiyametê jî nikarin nûr û tîrêja ku tenê ji suretê wî diçe bidin û binivîsin. Piştî çar beytên sereke yên vê beşê de, di her çar beytên din de li ser afirandina Cenabê Pêxeber sekiniye. Ji xeynî xwedê ew ji herkesi çêtir e. Wekî ava dinayê Xwedayê mezin hîjdeh hezr a'lem çêkirina ji bona wî û ew kiriye serwerê her kesî. Berdewama vê de gotiye ku xwedê sed û bîst û çar hezar enbiya çêkirine û hemû jî ji wî mehderê dixwazin da ku roja mahşerê ummetên xwe xelas bikin.

Der barê pesnê nebî de Bateyî di beşa duyem de li ser vê mijarê sekinîbû lê Xelîlî di beşa sêyem de li ser pesindayîna cenabê Pexember sekiniye.

**Beş 4**

Ji 8 beytan pêk tê. Xelîlî di vê beşê de li ser şiklê Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin)" sekiniye. Di vê beşê de Xelîlî li ser şeklê Hz. Muhemmed sekiniye û weha behskiriye: Suretê wî sor û spî, qama wî ne kin û ne jî direj bû. Çav, mijang û birhê wî reş aniya wî pahn û ferih, devê wî wekî gustîl û dinanê wî wekî mircanan pak û xweşik bûn. Riha wî reş û pir mû têde hebûn lê girover bû gerdana wî derbas nedikir. Navmilê wî pahn û çengê wî dirêj bûn. Singa wî ferih zikê wî çiqas tu bêje rast bû. Bes mû li ser mil û çengê wî hebîn û nozdeh mûyên spî li ser serêrî û riha wî hebûn. Bejn û bala wîya ku Xwedê bi hostayî çêkiri ne qelew û ne jî zeîf bû.

**Beş 5**

Ji 8 beytan pêk tê. Ev beş li ser tebî'etê Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin) ye. Di vê beşê de Xelîlî li ser tebî'eta Hz. Muhemmed sekiniye û weha gotiye: exlaq û tebî'eta wî ew qas xweş û qenc e, ti hesap û defter têra tera nivîsandinê nakin. Wî li ser tiştên dinyayê ti carî xeyd û dilgirti nekir. Lê li ser tiştên bê şerî'et wî ticara gotina xwe venedişard. Pir fehêkar bû, ticarî bê silav derbas ne dibû, meşa wî weke ava zelal bû, cil û sola wî pîne lê bûn, li gel feqîran diruniş û bi wan re nan û ava wan vedixwar, kêm dikeni, pir merd bû xesletên nepak û nebaşî qed li cem nebûn.

**Beş 6**

Ji 8 beytan pêk tê û li ser xesiyetên Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin) hatiye sekinîn.

Di vê beşê de Xelîlî li ser xasiyeta Hz. Muhemmed sekiniye û weha berdewam kiriye: Xesetê wî şev û roj wekî hevdu didî û wî jî pêşiya xwe û paşiya xwe weke hev

didî. Wexta ku radiza dilê wî zikir dikir, wexta ku bi rê de diçû qum di bin lingê wî de ne diçû xwar lê erda wekî hesin di bin lingê wî de diçû xwar. Gava destê xwe bida destê yekî bêhna miskê ji destê wî kesî difûrî, ti carî Şeytan ne dihate derdora wî, ajalên kovî û teyr ticaran ji ber ne direvîn, mêşa qed ne dihatin ser laş û cilê wî, gava ku ji dayîka xwe bûye her du çavên wî kil kirî û sinnet kiri bûye.

**Beş 7**

Beşa heftem a Durra Birincî Mewlûda Kurmancî ji 8 beytan pêk tê û li ser mu'cizatên Nebî (Selhat û Selamê Xudê li Ser Bin)" hatiye sekinîn. Xelîlî di vê beşêde li ser mu'cîzeyên Hz. Muhemmed sekiniye.

Xelîlî hin ji van mu'cîzeyan weha rêz kirine: Pê re xeber didan gelek hişk û bican, hin ji wan bê dev û bê ziman bûn. Dar û beran li ser wî her dem sellat didan. Goştê ku ji aliyê jineke Cihû ve hatî jahr kirin pê re xeber dide û dibêje: Min nexwe ez jarh kirima jinka Cihû. Ajalên kovî her dem dihatin cem û bi wan re xeber dida. Wexta di'a dikir av ji nava teliyên wî diherikî û ji bo kîjan nexweşî di'a bikirana ew nexweş baş dibû.

**Beş 8**

Ji 8 beytan pêk tê û ev beş li ser şiyandina Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin) ye. Xelîlî di vê beşê de behsa hin bûyerên ji 25 saliya Hz. Muhemmed bigire hetanî wefata wî kiriye.

Gava ku 'emrê wî hate bîst û pênca ew bi Hz. Xatîce re zewicî. Gava hate çil saliya xwe ayeta Qur'anê "Îqra" jê re hat. Di pêncih û sê saliya xwe de hîcretî Medîneyê kir. Piştî ku heşt salan Mekkeha şîrîn ji destê muşrikan deran. Dih saliya hîcreta xwe de diçe heca mezin, ku ev heca wî ya dawî bû, roja înê li çiyayê 'Erefatê xutbe da û ayeta Qur'anê ya dawî jê re hat. Bîst û sê salên wî derbasbûn bi vê xelatê û di yazdeh saliya hîcreta xwede goça dawî dike.

**Beş 9**

Ji 8 beytan pêk tê. Xelîlî di vê beşê de li ser xêra selewatên li Ser Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin) sekiniye. Weki ku ji naveroka vê beşê jî diyar dibe, li ser xêra selewatên ku li ser Hz. Muhemmed tên kirin hatiye rawestandin.

Xelîlî di vê beşê de gaziyekî dike ji bo ummetê ku ew li ser Hz. Muhemmed pir selewatan bin. Lewra bê wî du'a qebul nabin. Dîsa dibêje ku Hz. Muhemmed gotiye: Ew kesê ku selewatan ser min bide, bê şik û bê guman yek selewat wê bibe deh rehmetullah, deh selewat wê bibe bi sedan nî'met û yê ku di roja giran de bi hezara selewatan bide ez û ew, em ê bi hev re herin baxê Cinan. Berdewama wêde dibêje ku melekek heye, kî selatan bi de pê zaneye û paşî wê bêje: Felan lawê kesê felan ser rih û canê te selat didan. Ez wê demê hengî pê keyfxweş dibim, ew kes dê di roja Xemê de mehdera min heq bike.

**Beş 10**

Ji 7 beytan pêk tê. Ev beş bi li ser xêra Mewlûdu'n-Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin) ye. Xelîlî di vê beşê de li ser xwendina xêra Mewlûdê sekiniye.

Ew kesê ku qedrê Mewlûdê bigire wê roja mahşerê di gel ehlê Kemal here bihiştê. Ew xaniyê ku Mewlûd lê were xwendin Xwedê çavên xerab ji wir dur dike, xêr, bereketa û rehm li wir zêde dibe û Melek sef bi sef têne wê dere. Av û xwarin, zîv û zêrên ku Mewlûd li ser wan were xwendin bereketa wan zêde dibe. Loma qedrê Mewlûdê bigirin û bixwînin.

**Beş 11**

Ji 8 beytan pêk tê. Ev beş li ser silsileya Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin) ye. Xelîlî di vê beşê de, wekî ku ji serenava vê beşê diyar dibe, li ser silsileya Hz. Muhemmed sekiniye.

Ji ᶜEbdullah bigre heta 'Ednan hemû bavikên Hz. Muhemmed di vê beşê de hatine bahskirin. Li gorî vê silsileye ceddên Hz. Muhemmed ev in. Ebdullah kurê 'Ebdulmutallib kurê Haşim kurê 'Ebdulmenafê kurê Qusey kurê Kulab kurê Murre Ke'b kurê Luey kurê Xalib kurê Le'b kurê Malik kurê Nedret Kinan kurê Xuzeymet Mudrîk kurê Ilyas Muder kurê Niza kurê Me'ed kurê 'Ednan e.

**Beş 12**

Ji 8 beytan pêk tê. Ev beş li ser wiladeta Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin) ye. Di vê beşêde Xelîlî li ser hemlebûyîna Amîne û mizgîniya pêxemberan sekiniye. Di vê beşê de Amîne weha dibêje: çiqas mehek ji hemlê min dihat, her mehekî nebiyek ji bo min mizgînî dihat. Meha yekî, ya Recebê, Adem pêxember ya dido Şîs ya sise

Îdrîs nebî ya çarê Nebî Nuh ya pêncê Hûd ya şeşe Îbrahîm ya heftê Isma'îl ya heştê Nebî Musa û ya nihê Îsa mizgînî ji bo Hz. Muhemmed didan.

**Beş 13**

Ji 8 beytan pêk tê. Wekî beşa diwazdehan ev beş jî li ser wiladeta Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin) hatiye nivîsin. Xîlîlî di vê beşêde; çaxê ku Amîne di hemlebûna xwede bûyerên ku dîtin tesfîr kirine, sekiniye.

Li gorî ku Amîne gotiye: min di hemla xaw de gelek nişane didîtin; min didît meşriq û mexrib ronahî dibûn, qesra Busrayê ji Şamê xuya dibû li ber çavê min.

Di beytên 80-84an de li ser welidîna Hz. Muhemmed Amîne weha dibêje: kes li mala min nebû. Melekan Beytul Heram ava dikirin. Dema ku ez welidim beyreqên kesk ji asîmanan nazil dibûn. Yek ji van beyreqan li ser Betul Heramê min didît, yek jê jî min li şerqê didît. Ref bi ref melek ji jor dihatin xwar, li çar kenaran şu'leya nûrê digirtin.

**Beş 14**

Ji 8 beytan pêk tê. Ev beş jî wekî beşên diwazdeh û sêzdehan li ser wiladeta Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin) hatiye nivîsin. Xelîlî navê beşa diwazdehem sêzdeme û çardehem bi heman serenavê binav kiriye.

Ev beş berdewama beşa diwazdeh û sêzdehem e. Wekî beşê diwazdehm û sêzdehem ev beş jî li ser bûyerên gava ku Hz. Muhemmed di welide hatiye nivîsandin. Di vê beşê de Amîne dibêje: şeva ku Muhemmed wê çêbibe oda ku ez tê de şewq û ronahî da û çar jinên horî sifet (Meryem, Hawwa, Sara û Asiya) dihatin dora min. Gava ku ez tî bûm ji nişkave li ser destan îskanek didan min ku ev îskan tijî avagula, 'enber û şekir bû. Gava min vexwar dil û hinavê min hînk bûn. Her weha Amîne dîroka rojbûna Muhemmed weha rdigihîne: pênç sed û heft û yekê mîladî di bîst û diduyê meha Nîsanê de gava ku gul ji bişkojan dibişkiftin ji daran, teyrekî çeng sipî baskên xwe ser min re birin. Wê gavê çêbû Ehmedê min şekir.

**Beş 15**

Ji heşt beyatan pêk tê. Ev beş li ser bixêrhatina Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin) ye. Ev beş beşa bi xêrhatinê ye.

Ev beş di her du Mewlûdan de hatiye nivîsandin. Lê di ve xalêde, ji bo ku muhtevaya merhebaya her du Mewlûdan baş were fahmkirin, em ê li jêr her du merhebayan bidin ber hevdu.

Weku ku li jêr tê dîtin jî di beşa bixêrhatin an jî merhebaya her du Mewlûdan de ti wekhevî tineye. Bateyî di beşa merhabayêde bi piranî peyva “merheba” bi kar aniye. Xelîlî jî bi piranî forma “xweş bi xêr hat” bi kar aniye. Bateyî beşa merhebayê di Mewlûda xwe de di bin serenava “Der Medhî Hebîbî Îlahî Seyyîdîna Muhemmed Kî Sahîbî ‘Izz Û Cahî” de nivîsiye. Xelîlî beşa xêrhatinê, Bateyî wekî merheba gotiye, di bin serenava “Bixêrhatina Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin)” de nivîsiye.

**Beş 16**

Ji 8 bêytan pêk tê. Dawiya Mewlûdu’n-Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin) ye. Wekî ku ji serenava vê beşê jî diyar dibe muhtevaya Mewlûdê bi dawî dibe. Beşa xatîmê ye. Di vê beşê de Xelîlî bi zimanekî opsîyonî dawiyê li Mewlûda xwe tîne. Weke ku ji beyta jêr jî diyar dibe Mela Sîraceddînê Xelîlî wekî mexlas “Sîrac” bi kar aniye.

Bo Sîrac û hazir û her saliha          Ku temam bû hun bixwênin Fatiha

**Beş 17**

Beşa hivdehem a Mewlûda “Durra Birinci Mewlûda Kurmancî” ji du’ayê pêk hatiye. Xelîlî di vê beşê de weha du’a dike:

El –Hemdu lillahî Rebbîl-alemîn. Wes-selatu wes-selamu ‘ela seyyidina Muhemmedin xatimel-enbiyai wel-murselîn. We ‘ela alihî we sehbihî ecme’în.

Ellahumme ya Rebbî tu bi heqqê zat û sifatê xwe kî, tu bi hurmeta Muhemmedinîl- Mustefa hebîbê xwe kî, tu xezeba xwe ji me dûr bikî, rehma xwe li me bikî, me ji ‘ezabê qebrê û fitna saxbûnê û mirinê û ji ‘ezabê cehnemê êmin bikî. Li vê dunyayê xweşkatiyê û başiyê bidî me. Tu hifza me ji şerê cin û ins û şeytanan bikî. Li ber mirinê îmana me qaîm bikî. Di heşrê de me fihêtkar nekî. Li ber mirinê me deyndar nekî. Di ser pirê ve me derbas bikî. Derê cehnemê li ber me bigirî. Ê cennetê li ber me vekî. Di cennet-ul firdewsê de, di cîrantiya Muhemmed Mustefa de sellellah û ‘eleyhî we-sellem cihê me çê bikî. Bi dîtina nûr û cemala wechê xwe çavê me rohnî bikî. Dilê me geş û şa bikî. Ji me û dê û bavê me, kiflet û ehl û dost û cîranê me û çiqa

kesê ehlê îmanê û ji vê meclisê re, û xudyê xêran temaman re; El-Fatihete Me’ehes-Selewat

# BEŞA SÊYEM

# BERAWIRDKIRINA MEWLÛDA XELÎLÎ BI MEWLÛDA BATEYÎ RE

Di vê beşê de mewlûdên Xelîlî û Bateyî di çarçoveya taybetiyên giştî, avahiya derekî, ziman û şêwaz, wezn-qafiye-redîf, hunerên edebî û naverokê ve dê bên berawirdkirin.

## 3.1. JI ALIYÊ TAYBETIYÊN GIŞTÎ VE

### 3.1.1. Navên Berheman

Hasan Karacan û Nurettîn Akut di xebata xwe ya bi navê "***Mele Huseynê Bateyî'nin Mewlid-İ Nebî Adlı Eseri ile Mele Süleyman Kurşun'un Mewlida Pêxember Adlı Eserinin Karşılaştırılması"*** de nîşan kirine ku Mela Huseynê Bateyî di van her du beytên jêr de navê Mewlûda xwe wekî "Mewlûdu'n-Nebî" binav kiriye.[123]

Herkesê guhdarê **Mewlûda Nebî**

Dergehê mizgîniyan dê lê vebî

Dirhemek bit serfê **Mewlûda Nebî**

Xêrekî mezin ji bo hasil dibî

Lê bi qasî ku me li ser Mewlûda Bateyî analîz kir, em ne gehiştin encameke ku Bateyî navê Mewlûda xwe wekî "Mewlûdu'n-Nebî" nivîsîandi be. Em bi teqezî nikarin îsbat bikin ku mebesta Bateyî ji vê yekê navê Mewlûdê ye. Dibe ku navê cureyê jî be.

Li ser hin nusxeyên destxetî, wekî nusxeya Şêx Muşeref[124] û çapên metbu'î navê Mewlûda Bateyî wekî Mewlûdu'n-Nebî hatiye nivîsandin. Her weha di nava gel de navê Mewlûda Bateyî wekî "Mewlûda Kurmancî" belav bûye û gel mevlûda Bateyî

[123] Hasan Karacan, Aykut Nuretti, *"Mele Hüseynê Bateyî'nin Mewlid-i Nebî Adlı Eseri ile Mele Süleyman Kurşun'un Mewlida Pêxember Adlı Eserinin Karşılaştırılması"*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi 1/2, Bingöl 2015. r, 127-128

[124] Îlhan, h.b., r. 76

bi vî navî nas dike. Li gorî Zeynelabidin Zinar: “ji bo ku Mewlûda Bateyî yekem Mewlûda Kurdî ye di nava gel de bi vî navî hatiye naskirin û navê Mewlûda Bateyî “Mewlûda Kurmancî” ye.”[125]

Mewlûda Bateyî ji ber ku bi zaraveya Kurmacî hatiye nivîsandin û di medreseyan de piştî Qur’ana pîroz hatiye xwendin bi têgeha “Mewlûda Kurmancî” hatiye nas kirin.[126]

Mela Sîracedînê Xelîlî jî di van beytan de navê Mewlûda xwe bi navê “Durra Birîncî Mewlûda Kurmancî” bi nav kiriye.

Ji pêla yekê bi destê Sîracî

Derxistiye ev **Dura birinci**

Ji xeynî beyta jor, her weha li ser berga Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî ya ku ji aliyê Mehmet Sıddik Ataç ve hatî serast kirin de weha hatiye ragihandin.

Kitêba Durra Birincî Mewlûda Kurmancî

Bi Nezm Û Pevgihandina,

Seydayê Mela Muhemmed Sîraceddîn Kurê Mela Ebdulhekîmê Xelîlî

Xudayê Mezin Li Wan Rehmê Bike (amîn).

Wekî ku ji agahiyên jor jî diyar dibe, Mela Sîreceddînê Xelîlî navê berhema xwe Durra Birincî Mewlûda Kurmancî daniye.

Bi giştî em karin bibêjin ku Mela Sîraceddînê Xelîlî navekî tabet li Mewlûda xwe kiriye. Lê belê Mela Huseynê Bateyî navekî taybet li Mewlûda xwe nekiriye. Mewlûdu’n-Nebî navekî kollektîf e. Dibe ku mustensîxan jî ev nav lê kiribin. Li vir hebûna navekî taybet weke xweseriya Mewlûda Xelîlî derdikeve pêş.

### 3.1.2. Sebebê Te’lifê

Her wekî ku me li jor jî goti bû, li ser serdema jiyana Melayê Bateyî gelek nîqaş hene. Lê me li gorî van nîqaşan qeneat anî ku ew di ss.17-18em de jiyaye. Di gel vê yekê; me di Mewlûda Bateyî de ti ergumanên ku li ser dîroka nivîsandina Mewlûda wî bi dest ne xistin. Le wexta ku em di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de li qada

---

125 Li gorî hevpeyvîna ku me pê re kirî.
126 Karacan, Nurettti, h.b., r.140

Mewlûdnameya dinerin bi hêsanî tê xuya kirin ku yekem berhema Mewlûdê ya Mela Huseyînê Bateyî "Mewlûdu'n-Nebî" ye.

Mela Sîraceddînê Xelîlî nivîsandina dîraka Mewlûda xwe di van beytên jêr de weha nivîsiye.

Ger te bivê tarîxê bizanî

Xewwasê mahir ji behra sanî

Çilîqa çarê ku lanehî bû

Di gêra yekê de mewca sanî bû

Ji pêla yekê bi destê Sîracî

Derxistiye ev Durra birinci

Tarîxa nivîsandinê / Hicrî 1381 / Mîladî 1960

Bateyî cih nedaye tarîxa nivîsîna Mewlûda xwe, lê Xelîlî tarîxa nivîsîna Mewlûda xwe aşkera kiriye. Bêguman zikirkirina tarîxa nivîsîna berhemekê xaleke girîng e û nirxê wê berhemê zêdetir dike. Mewlûda Xelîlî di vê xalê de jî ji ya Bateyî cuda ye. Ev jî nirxê Mewlûda Xelîlî bilind dike.

## 3.2. JI ALIYÊ AVAHIYA DEREKÎ VE

Di vê beşê de her du berhem ji aliyê taybetmendiyên avahıya derekî ve dê bên berawirdkirin. Di vê çarçoveyê de li ser mijarên wek tertîb û hecma berheman, teşeya nezmê, ziman û şêwaz û taybetmendiyên ritmîk dê bê rawestan.

### 3.2.1. Teşeya Nezmê

Di edebiyata klasîk de Mewlûdnameyên menzûm bi teşeya mesnewiyê hatine nivîsîn û teşeya mesnewiyê jî qafiyeyeyek xwe ya taybet heye. Di mesnewiyan de her malik di nava xwe de biqafiye ye.: aa, bb, cc, dd, ee…[127] Mewlûdnameyên jî mesnewî

[127] Îlhan, h.b., r. 35-36

ne û bi vê şemaya taybet hatine nivîsîn. Bi kurti wekî hemû mesnewiyan, di Mewlûdnameyên, de jî her malik di nava xwe de biqafiye ye: Li jêrê em ji her du

| **Mewlûdu'n-Nebî:** | **Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:** |
|---|---|
| Hemdê bêhed bo Xudayê 'alem**în** | Piştî hemdê bêqiyas û bê 'ed**ed** |
| Ew Xudayê daye me dînê mub**în** | Bo Xudayê Wahid û Ferd û Sem**ed** |
| Em kirine ummeta xeyru-'l beş**er** | Ew Xudayê pur li meni'm**et kirî** |
| Tabi'ê wî muqtedayê nam(i)uw**er** | Ehmedê hadî li me xil'**et kirî** |
| Ew xwedayê maliku'l- mûlkê 'az**îm** | Çêtir e bo me ji rûh û can û m**al** |
| Daye me mîrasa Qur'anâ ker**îm** | Şafî'ê roja giran e ey hev**al** |
| Dînê me kir amil û ni'met tem**am** | Wa Xudayo! her bi barîn bêjim**ar** |
| Ye'nî da me Ehmed û Daru-'s-Sel**am** | Mislê baran û mij û ṭav û bih**ar** |
| Ew xwedayê bênazîr û zû'l-Cel**âl** | Rehmet û êmintiya j'derd û ku**la** |
| Bêmîsal û bê heval û bê zew**al** | Ser Muhemmed melhema can û di**la** |

Wekî ku tê dîtin jî her du Mewlûd bi şiklê mesnewiyê hatine nivîsandin û şemaya qafiyeyên wan jî wekî hemû mesnewiyan, her malik di nava xwe de biqafiye ne. Ev hevbeşiyeke wan e.

### 3.2.2. Tertîb

Me li jorê mijarên mewlûda Xelîlî digel sernavên wan pêşkêş kiribûn. Ji bo ku em bikarin vê yekê bi mewlûda Bateyî re berawird bikin, em dê pêşî mijarên mewlûda Bateyî bidin, piştre her duyan berawird bikin:

Bi Kurtasî Mijarên Beşên Mewlûda Bateyî weha ne:

Beşa Yekem: Ev beş ji 11 beytan pêk tê. Piştî ku hemd û senaya xwe ji Xwedê re tîne behsa çend sifatê xwedê û meznahiya wî tê kirin. Bi serenava "**Bismillahîrrahmanırrahîm**" hatiye binavkirin.

Beşa Duyem: Ji 13 beytan pêk tê. Di vê beşê de Selawat Li Ser Pêxember tê kirin. Beşa pesindana Hz. Muhemmed e. Bi serenava "**Der Ne'tî Muhemmed (Sellalahu 'Eleyhî We Sellem)"** hatiye binavkirin.

Beşa Sêyem: Ji 21 beytan pêk tê. Di vê beşe mijarên weke: Xêra xwendina Mewlûdê, Cihê ku Mewlûd lê were xwendin ji qeza û belayan dûr dikeve û pereyên ku ji bo xêra xwendina Mewlûdê çiqasî ji meriv re xêrê tîne hatine bikaranîn. Bi serenava "**Der Feza'îlî Mewlûdu'n Nebî (Sellalahu 'Eleyhî We Sellem)"** hatiye binavkirin.

Beşa Çarem: Ji 33 beytan pêk tê. Di vê beşê de: Xuliqandina Ronahîya Pêxember, Xuliqandina Cîhanê û meznahiya ûmmeta Muhemmed ji ûmmetên din hatine bikaranîn. Bi serenava "**Îbtidaî Nurî Muhemmed (Sellallahu 'Eleyhî We Sellem)"** hatiye binavkirin

Beşa Pêncem: Ji 39 beytan pêk hatiye. Di vê beşe de: Afirandina Adem Pêxember û Secdekirina Ferîşteyên din ji bo Adem Pêxember hatine bikarnîn. Bi serenava **"Der Xulqiyetî Adem Pexember 'Eleyhî 'S-Selam"** hatiye binavkirin.

Beşa Şeşem: Ji 11 beytan pêk tê. Di vê beşêde behsa pakî û paqijiya malbata Hz. Muhammed (s.a.v.) û navê Ceddên wî hatiye kirin. Bi serenava **"Întiqalî Nûrî Muhemmed (Sellallahu Eleyhî We Sellem)"** hatiye binavkirin.

Beşa Heftem: Ji 35 beytan pêk tê. Di vê beşê de mijarên wekî: Bûyîna bavê Pêxember, Ebdullahê kurê Evdilmutelib û wexta ku Hz. Muhmmed (s.a.v.) dikeve malzaroka diya xwe hatine bikaranîn. Bi serenava **"Der Întiqalî Nûrî Muhemmed (Sellallahu Te 'ala 'Eleyhî We Sellem)"** hatiye binavkirin.

Beşa Heştem: ji 20 beytan pêk tê divê beşe de mijra kuştina bavê Hz. Mumemmed (s.a.v.) Ebdullah û planên Cihûyan hatiye bikaranîn. Bi serenava **"Der Dil Uftaden Kî Amîne Be 'Ebdullah Be Behed"** hatiye binavkirin.

Beşa Nehem: Ji 50 beytî pêk hatiye. Di vê beşe de: Zewaca Dê û Bavê Hz. Muhemmed (s.a.v) hatine bikaranîn. Bi serenava **"Amedenî Der An Weqtî Întiqalî Nûr Ba Amîne"** hatiye binavkirin

Beşa Dehem: Ji 25 beytan pêk tê. Di vê beşê de: Hemlebûyîna Hz. Emîne û mizgîniya Pexemberan di pevajoya di hemlebûyîna wê de hatine bikaranîn. Bi serenava **"Der Muddetî Waqî'atî Hemlî Amîne"** hatiye binavkirin.

Beşa Yazdehem: Ji 27 beytan pêk tê. Di vê beşê de: Jidayikbûna Pêxember û hin bûyerên piştî jidayîkbûna ku pêk hatin hatne bikaranîn. Bi serenava "**Amedenî**

**Weqtî Weladetî Seyyîdina Muhemmed (Sellallahu Aleyhî We Sellem)"** hatiye navkirin.

Beşa Dozdehem: Ji 21 beytan pêk tê. Di vê beşê de: Gazî û şabaşî an jî Beşa Merhebayê û hin sifatên Hz. Muhemmed hatine bikaranîn. Bi serenava **"Der İkramî Qiyam Li Wiladetî Xayr l- Enam 'Eleyhî Efdelu's- Salatî We's-Selam"** hatiye binavkirin.

Beşa Sêzdehemîn: Ji 18 beytan pêk tê. Di vê beşe de: Bûyerên Ku di Şeva Jîyadikbûna wî de qewimîne hatine bikaranîn. Bi serenava "**Der Medhî Hebîbî Îlahî Seyyîdîna Muhemmed Kî Sahîbî 'Izz Û Cahî"** hatiye binavkirin.

Beşa Çardehemîn: Ji 21 beytan pêk tê. Di vê beşe de: Roja jidayikbûna Pêxember, Nîşanên ku Ebdulmutelip dîtine hatine bikaranîn. Bi serenava **"Amadenî Der An Waqtî 'Ebdulmuttalıb Ez Ka'be"** hatiye binavkirin.

Beşa Pazdehemîn: Ji 58 beytan pêk tê. Di vê beşe de Hatina Helîma Sadîya û Birina Pêxember, ji bo şîrdayinê hatine bikaranîn. Bi serenava **"Amedenî Halîme Û Bordenî Muhemmed (Sellallahu 'Eleyhî We Sellem)"** hatiye navkirin.

Beş Şazdehemîn: Ji 25 beytan pêk tê. Di vê beşe de: Vegera Karwanên Se''dîyan, ji Mekkehê hatiye bikaranîn. Bi serenava **"Waqi'at Kî Der Meyan Qabîleyî Benî Sa'dıyan Bûden"** hatiye binavkirin.

Beşa Hevdehemîn: Ji 69 beytan pêk tê. Beşa herî berfireh a Mewlûdê ye. Di vê beşê de behsa 'Eşîra Se''dîyan û bereketbûna anîna Pêxeber, hatine bikaranîn. Bi serenava **"Baz Avverdenî Halîme Muhemmed Sellallahueyhî We Sellem Bi Mekkeyî Şerîfe"** hatiye binavkirin.

Beşa Hejdehemîn: Ji 49 beytan pêk tê. Vegera Pêxember ji Welatê Se''dîyan (Mekkeh) û hin sifatên wî hatine bikaranîn.

Beşa Nozdehemîn: ji 25 beytan pêk tê. Beşa encam bûyîna Mewlûdu'n-Nebî ye. Her wekî ku ev beş kurtasiyek ji Mewlûdu'n-Nebî be. Wekî beşa 1î, 12an û 18an di vê beşê de jî behsa sifatên Pexember hatiye kirin. Bi serenava **"Haza Menacatî**

**Mewlana Muhemmed Batê Rahîmallahu Te'ala We Hem Xitmî Kitabî Mewlûd"** hatiye binavkirin.[128]

[128] Îlhan, h.b., r. 93-167.

Di tabloya jêrîn de li gorî naveroka beşan, sernavên beşên her du mewlûdan û hejmara beytên wan hatine dayîn:

**Tablo 1:** Tabloya hejmara beytan di her du Mewlûdan de.

| J. | Mewlûda Xelîlî | Mewlûda Bateyî | J. |
|---|---|---|---|
| 1 | "**Kitêba Durra Birincî Mewlûda Kurmancî Bismillahîrrehmanirrehîm**"<br>8 beyt | "**Bismillahîrrahmanırrahîm**"<br>11 beyt | 1 |
| 2 | **"Sebebê Nivîsandina Mewlûdu-n Nebî"**<br>8 beyt | "**Der Ne'tî Muhemmed**<br>13 beyt | 2 |
| 3 | **"Pesnê Nebî"**<br>9 beyt | "**Der Feza'îlî Mewlûdu'n Nebî**<br>21 beyt | 3 |
| 4 | **"Şeklê Nebî"**<br>Ji 8 beyt | "**Îbtidaî Nurî Muhemmed**<br>33 beyt | 4 |
| 5 | **"Tebî'eta Nebî"**<br>Ji 8 beyt | **"Der Xulqiyetî Adem Pexember**<br>39 beyt | 5 |
| 6 | **"Xasiyetên Nebî"**<br>Ji 8 beyt | **"Întiqalî Nûrî Muhemmed"**<br>Ji 11 beyt | 6 |
| 7 | **"Mu'cîzeta Nebî"**<br>Ji 8 beyt | **"Der Întiqalî Nûrî Muhemmed**<br>Ji 35 beyt | 7 |
| 8 | **"Şiyandina Nebî"**<br>Ji 8 beyt | **"Der Dil Uftaden Kî Amîne Be ʿEbdullah Be Behed"**<br>Ji 20 beyt | 8 |
| 9 | **"Xêra Selewatan li Ser Nebî"**<br>Ji 8 beyt | **"Amedenî Der An Weqtî Întiqalî Nûr B a Amîne"**<br>Ji 50 beyt | 9 |
| 10 | **"Xêra Mewlûdu-n Nebî"**<br>Ji 7 beyt | **"Der Muddetî Waqî'atî Hemlî Amîne"**<br>Ji 25 beyt | 10 |
| 11 | **"Silsileya Nebî"**<br>Ji 8 beyt | "**Amedenî Weqtî Weladetî Seyyîdina Muhemmed"**<br>Ji 27 beyt | 11 |

| | | | |
|---|---|---|---|
| 12 | **"Wîladeta Nebî".** Ji 8 beyt | **"Der İkramî Qiyam Li Wiladetî Xayr l-Enam** Ji 21 beyt | 12 |
| 13 | **"Wîladeta Nebî"** Ji 8 beyt | "**Der Medhî Hebîbî Îlahî Seyyîdîna Muhemmed Kî Sahîbî 'Izz Û Cahî"** Ji 18 beyt | 13 |
| 14 | **"Wîladeta Nebî"** Ji 8 beyt | **"AmadenîDerAnWaqtî 'Ebdulmuttalıb Ez Ka'be"** Ji 21 beyt | 14 |
| 15 | "**Bixêrhatina Nebî**" Ji 8 beyt | **"Amedenî Halîme Û Bordenî Muhemmed"** Ji 58 beyt | 15 |
| 16 | "**Dawiya Mewlûdu-n Nebî"** Ji 8 beyt | **"Waqi'at Kî Der Meyan Qabîleyî Benî Sa'dıyan Bûden"** Ji 25 beyt | 16 |
| 17 | Beşa **"Du'aya Mewlûdu-n Nebî"** ye. Bi vê serenavê hatiye binavkirin. Ev beş bi şiklê pexşankî hatiye nivîsandin. Di vê beşê de ji du'a ji bo xwedê hatiye kirin. | **"Baz Avverdenî Halîme Muhemmed Sellallahueyhî We Sellem Bi Mekkeyî Şerîfe"** Ji 69 beyt | 17 |
| | | **"Haza Menacatî Mewlana Muhemmed Batê Rahîmallahu Te'ala We Hem Xitmî Kitabî Mewlûd"** Ji 25 beyt | 18 |

Wexta ku em li beşên her du Mewlûdan dinêrin tê dîtin ku di Mewlûdu'n-Nebî û Durra Birinci Mewlûda Kurmancî de her beş bi serenavekî hatine binav kirin. Lê di Mewlûdu'n-Nebî de di hin nusxeyan de navê hin beşan nehatiye nivîsîn.

Li gor vê em dibînin ku beşên Mewlûda Bateyî ji yên Xelîlî dirêjtir in. Dîsa em têdigihin ku Xelîlî li gor standart û sîmetriyekê beşên xwe ava kirine. Lêbelê Bateyî ev yek li ber çavan negirtiye.

Bi tevahî neqerat di Mewlûdan de zahf hatine bikaranîn. Li gorî çavkaniya Şener Demirel sebeba vê, ji bo ku dîqat û eleqeya guhdaran bikşînin ser xwendina Mewlûdê

ye.[129] Di her du Mewlûdan de neqeret di dawiya her beşekî de hatine bikaranîn. Di "Durra Birincî Mewlûda Kurmancî" de li gorî "Mewlûdu'n-Nebî" hejmara beytên neqeratê zêdetir in. Neqeratên her du Mewlûdan ev in:

**Mewlûdu'n-Nebî:**

"Ger divêtin hûn ji narê bin necat

Bi eşq û şewq hûn bi bibêjin es-selat"

Di Mewlûda Bateyî de di dawiya her beşê de wekî neqerat ev beyta jor 19 caran hetiye bikaranîn

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

Ey gelî guhdarê Mewlûda Nebî
Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî

(2/3)

Qeṭ nekin vala devê xwe j'ṣelewat
Da Xuda we b' parizênê ji şewat

(2/4)

Ya Îlahî ṣed ṣelat û ṣed selam
Tû bide her dem li fexrê 'am û tam

(2/5)

Di Mewlûda Xelîlî de di dawiya her beşê de wekî neqerat ev hersê beytên li jor hatine bikar anîn. Her yek ji van beytan 16 caran di Mewlûda Xelîlî de hatine bikaranîn

Di her du Mewlûdan de jî di navbera beşan de beytên neqereatê hatine bikaranîn. Ji vî aliyî ve di navbera wan de wekhevî heye. Lêbelê di ya Bateyî de di tevahiya Mewlûdê de heman beyt hatiye bikarann, hal ew e ku di ya Xelîlî de 3 beytên cuda hatine bikaranîn.

Mewlûd mesnewiyek e û di tertîba mesnewiyan de dîbace, mijara sereke û xatîme hene. Di her du Mewlûdan de jî dîbace heye. Em dê li jêr van her du dîbaceyan berawird bikin.

[129] Şener Demirel, "*Süleyman Çelebi'nin Vesiletü'n-Necat adlı Eseri ile Behişti Ahmed Sinan Çelebi'nin Viladet-i Resûl Adlı Eserinin Karşılaştırılması*", Fırat Üniversitesi, Eğitim Fakültesi, 2014, r. 8.

**Duraa Birincî Mewlûda Kurmancî**

Bi Nezm Û Pevgihandina,
Seydayê Mela Muhemmed Sîraceddîn Kurê
Mela Ebdulhekîmê Xelîlî, Xudayê Mezin
Li Wan Rehmê Bike (Amîn).

Rica dikim ez ji te ya xwendevan:
Du’a bike ji Rebbê pur dilovan

‘Efû bikê zinûb û gunhê Sîrac
Lewra tunîne ne dewa ne ‘îlac

Lewra Xuda ‘efû dikê gunehan
Çiqqa bikê bende di sal û mehan

Ger te bivê tarîxê bizanî
Xewwasê mahir ji behra sanî

Çilîqa çarê gola nehê bû
Di gera yekê de mewca sanî bû

Ji pêla yekê bi destê Sîracî
Derxistiye ev Dura birinci

Tarîxa nivîsandinê / Hicrî 1381 / Mîladî 1960

**Mewlûdu’n-Nebî**

BISMILLAHÎRRAHMANIRRAHÎM

Hemdê bêhed bo Xudayê ‘alemîn
Ew Xudayê daye me dînê mubîn

Em kirine ummea xeyru-‘l beşer
Tabi’ê wî muqtedayê nam(i)uwer

Ew xwedayê maliku’l- mûlkê ‘azîm
Daye me mîrasa Qur’anâ kerîm

Dînê me kir kamil û ni’met temam
Ye’nî da me Ehmed û Daru-‘sSelam

Ew xwedayê bênazîr û zû’l-Celâl
Bêmîsal û bê heval û bê zewal

Raziqê bêdest û pa û mar û mûr
‘Alimê sirra negotî der sudûr

Kar(i)sazê bende û sultanê can
Rahîm û Rehman Laṭîf û Mîhrîban

Asîmanê bêsutûn wi kir bedîd
Sûretê ba xal û xat wî aferîd

Hêvîdar in em ji te Şahê Kerîm
Îhdîna ya rab sîrate’l- musteqîm

Nê ji me sûc û xeta tên û sîtem
Lê ji te îhsan û ġufran kerem

Ya rab îmanê dixwazin em mudam
Jê rê alaya Muhemmed we’s-selam

Li vê derê em di dixwazin bi awayekî giştî li mijarên ku di dîbaceyên her du mewlûdan de hatine nivîsîn bidin ber çavan.  Ji ber vê yekê me pêwist dît ku em wekî nimûne dîbaceyên her du mewlûdan li jor binivîsin. Ev mijarên ku di beşên dîbaceyê yên mesnewiyan de cih digirtin bi rêzê û bi awayekî giştî ev in: Tewhîd, munacat, ne't, medhiye û sebebê te'lîfê. Dema em her du mewlûdan ji aliyê tertîbê ve berawird dikin em dibînin ku di navbera wan de cudahî û wekheviyên girîng hene:

Çawa ku ji beytên jor jî dîyar dibe, hem ji aliyê ruxsarî ve û hem jî ji aliyê naverokî ve cudahiyek di navbera her du dibaceyan de xwe nîşan dide. Cudahiyên ruxsarî ku hatine tespîtkirin ev in:

Xelîlî hem awayekî pexşan û hem jî bi awayekî menzum dibaceya Mewlûda xwe nivîsîye. Li hem ber vê yekê Bateyî bi awayekî menzum dibaceya Mewlûda xwe nivîsîye. Ji vî aliyî ve cudahiyeke girîng di navbera her du Mewlûdan de heye.

Mewlûda Bateyî bi “besmele” yê dest pê dike, lê Mewlûda Xelîlî piştî danasîna xwediyê nezmê bi besmelê dest pê kiriye.

Dîbaceya Mewlûdu’n-Nebî ji 11 xaneyan pêk hatiye. Dîbaceya Durra Birincî Mewlûda Kurmancî ji bilî hevokeke pexşan ji 6 xaneyan pêk hatiye.

Wexta ku em ji aliyê naverokî ve li her du dibaceyan dinêrin ev xalên jêr xwe nîşan didin:

Xelîlî di dibaceya Mewlûda xwede bi nezm û pevgihandina nivîskarê Mewlûdê sekiniye. Yanî di vir de li ser nasnameya xwe sekiniye û xwe daye naskirin. Piştî vê yekê, sê beytên ku ji xwendevanên xwe tika dike ku ji bo zinûb û gunehên wî di’a bikin; lewra dibêje ne derman û ne jî dewaya gunehên wî heye. Di **her sê** xaneyên din de jî tarîxa nivîsîna Mewlûda xwe bi hesabê mîladî û hicrî nivîsiye. Ev taybetî ya ku Xelîlî di derbarê xwe Mewlûda xwe de dayîn nirxê Mewlûda wî zêdetir dike.

Bateyî di dîbaceya Mewlûda xwe de hemd û şikir ji Xudê re aniye ku dînê mubîn dayiyê. Behsa hêza xweda ya bê sînor dike, ku xwedayê te’ala, rizqê candarên bê dest û bê ling ên wekî mar û moriyan dide. Razên di dila de waqif dike û asîmanên bê sitûn avakirî behs dike. Di hersê beytên dawiya vê beşê de ji xwedê lavan û hêviyan dike ku ji bo gunehên kirin wan bi bexşîne, berê wan her dem bide riya qenciyê û wan bi Kerem û İhsana xwe kamil bike, her dem dibin ala îmanê û ji pey riya Hz.

Muhemmed wan ne veqetîne dike. Her weha di vê beşê de Bateyî hêst û ramnên xwe digel navên xwedê yên wekî: Zûl-Celal, Rahman, Rehîm, Kerîm, Alim û Letîf tîne ziman.

Beşa sereke, beşa herî berfireh a mewlûdê ye kut ê de mijara bingehîn a mewlûdê bi hûrgilî tê pêşkeşkirin.

Wexta ku em beşên sereke yên her du mewlûdan berawird bikin; hem ji aliyên ruxsarî ve û hem jî ji aliyên naverokî ve wekhevî û cûdahiyên her du mewlûdan derdikevin pêşiya me.

Her du muelîfan jî di vê beşê de bi pesindayîna pêxember dest bi mijarê kirine. Bateyî ji beytên 12a heta beyta 24a li ser net'ê pêxember sekiniye. Ji beyta 25a û heta beyta 45an li ser fezîletên Mewlûda Nebî, paşî bi rêzê li ser nazilbûna pêxember, xuliqandina Adem pêxember, nazilbûna nûra pêxember, gihiştina Amînê bi Abdullah, nazilbûna nûra Muhemmed ji bo Amîne, hemlebûyîna Amîne bi Muhemmd, welidîna Muhemmd, medhê Muhemmed û heta vegerîna Helîme bal Mekkehê berdewam kiriye. Bi kurtasî em karin bibêjin ku ji beyta 12an dest pê kiriye û beyta 538an bi awayekî dûvdirêj li ser vê beşê sekiniye.

Xelîlî di mewlûda xwe de ji beşa sêyem dest pê kirye û heta beşa 16an tenê li ser pesn Nebî, şiklê Nebî, xesiyeta Nebî, mu'cîz Nebî, şiyandina Nebî, xêra selewatan li ser Nebî, xêra mewlûda Nebî, silsileya Nebî, behsa welidîna Nebî ji aliyê Amîne ve, welîdîna Muhemmed û bixêrhatina Muhemmed bi rêzê hatiye vegotin.

Eger awarte neyêne hesibandin, di Mewlûdnameyan de ji xelekên mijra jidayîkbûyîna Cenabê Pêxember, di çarçoveya seyra tarîxî ya bûyeran de li gorî pêlekaneke diyar têne pêşkeşkirin.[130]

Di çarçoveya vê xalê de wexta ku em li beşên sereke yên van her du mewlûdan binerin: Her du mewlûd jî li gorî planekê hatine nivîsîn. Lê ji aliyê palansaziya mijaran ve Xelîlî li gorî Bateyî serkeftîtir e. Lewra wexta ku em bala xwe didin rêzebûyera mijaran Xelîlî li gorî kironolojiyekî mijar nivîsîne. Li dijî vê yekê Bateyî ev yek li ber çavan ne girtiye.

[130] Adak, b.n., 2019, r. 311-312.

Xelîlî mijar bi awayekî kurt û zelal bi kar anîne. Bateyî bi awayekî dirêj û li gorî Xelîlî nezelal bi kar anîne.

Beşa xatîmeya her du mewlûdan ji serenavekî pêk hatiye. Bi gotineke din binbeşên vê beşê nînin.

Di vê beşê de wekî terkîb Bateyî terkîba “xatîmetu’l kîtab” bi kar aniye. Xelîlî di beşa xatîmeyê de wekî terkî tiştek bikar ne aniye. Di beşa xatîmeyê de li cehê terkîbeke Erebî an jî Farisî wekî terkib “dawiya mewlûda nebî û di’a” bi kar aniye.

Beşa xatîmeya Mewlûdu-n Nebî ji 25 beytan pêk tê. Bateyî di vê beşê de bi pesindayîna Cenabê Pêxember dest pê kiriye û destnîşan kiriye ku sed hezar deve wî hebe, şev û roj bahs jî bike û ev yek heta sed carî qiyamet biqewime jî berdewam bike dîsa têra xweşikî û pesindayîna Cenabê pêxember nake. Berdewama wê de ji bo gunehên xwe ji Cenabê Pêxember şefe’et û ji Xudayê Te’ela jî ‘efû xwstiye. Her weha ji bo wan kesên ku guhdariya mewlûdê dikin û ew kesên ehlî îman di’a dike û dawiyê li mewlûda xwe tîne.

Beşa xatîmeya Durra Birincî Mewlûda Kurmancî ji 8 beytan û di’a ya mewlûdê pêk tê. Xelîlî di beşa xatîmeyê de hemd û spasiyê ji bo Xudayê Te’la dike. Di berdewama vê yekê de ji bo gunehên xwe û ûmmetê ji Xudayê Te’la tikan dike ku wan bide xatirê Cenabê Pexember û xêra xwendina mewlûdê. Herî dawî bi awayekî pexşankî di’aya mewlûdê nivîsiye. Piştî di’aya mewlûde dawiyê li mewlûda xwe tîne.

### 3.2.3. Hecm

Tişta ku hecma Mewlûdan diyar dike jimara beytên wan e. Loma em li vê derê li beytên her du Mewlûdan binêrin. Mewlûda Mela Hiseyînê Bateyî bi tevahî ji 19 beşan û ji bilî beytên neqeratê 563 beytan pêk tê. Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî bi tevahî ji 17 beşan û tevî beytên neqeratê ji 171 yek beytan pêk tê.

Hejmara beytan ji ber ku hecma berhemê diyar dike girîng e. Li gor vê hecma Mewlûda Bateyî ji ya Xelîlî zêdetir e. Herî kêm 3 qat jê mezintir e. Ev jî nîşan dide ku Xelîlî mijarên xwe bi kurtî nivîsîne, neketiye nav hûrguliyan.

Wexta ku em li hejmara beytên beşê Mewlûda Mela Sîracêddînê Xelîlî dinerin her beş ji 8 beytan pêk hatiye. Lê hejmarê beytên beşê “Mewlûdu’n-Nebî” ji hev cuda hatine nivîsandin. Li gorî beşan hejmara beytên her du Mewlûdan wehan e:

**Tablo 2:** Tabloya hejmara beytan di her du Mewlûdan de.

| Beş / Berhemê / Nevê | Durra Birincî Mewlûda Kurmancî | Mewlûdu'n-Nebî |
|---|---|---|
| 1 | 8+3[131] | 11 |
| 2 | 8+3 | 13 |
| 3 | 9+3 | 21 |
| 4 | 8+3 | 33 |
| 5 | 8+3 | 38 |
| 6 | 8+3 | 11 |
| 7 | 8+3 | 35 |
| 8 | 8+3 | 20 |
| 9 | 8+3 | 49 |
| 10 | 7+3 | 25 |
| 11 | 8+3 | 25 |
| 12 | 8+3 | Salat-selam |
| 13 | 8+3 | 33 |
| 14 | 8+3 | 21 |
| 15 | 8+3 | 84 |
| 16 | 8+3 | 69 |
| 17 | 8+3 | 49 |
| 18 | --- | 25 |
| Toplam | 176 | 563 |

131 Îfadekirina +3 ji bo neqerat ê hatiye bikaranîn. Di dawiya her beşê de 3 malik wekî neqerat hatine dubare kirin.

### 3.3. JI ALIYÊ ZIMAN Û ŞÊWAZÊ VE

## 3.3.1. Bandora Zimanên Biyanî

Her du Mewlûdên ku di demên cuda de hatine nivîsandin, ji bo edebiyata Kurdî ya Klasîk û di qada Mewlûdnameyan de du berhemên girîng û giranbiha ne. Di vê xalê de em ê li ser bandora zimanên biyanî li ser her du Mewlûdan bisekinin.

## 3.3.1.1. Bandora ‘Erebî

Wexta ku em li taybetmendiyên ziman û şêwaza her du berheman dinêrin, tê dîtin ku “Mewlûdu’n-Nebî” ya Mela Huesyînê Bateyî pir di bin bandora zimanê ‘Erebî de maye. Çawa ku İlhan ji tesbit kiriye, helbestvan peyv, terkîb û hevokên ‘Erebî zehf bi kar anîne. Carinan riste hemî bi ‘Erbî ne carinan jî piraniya risteyê bi ‘Erbî ye:[132] Hetta hin beyt jê bi temamî bi ‘Erebî hatine nivîsandin.

Mînak:

**Sallî ya rabbî êla xeyr-il wara**

**Ma teşîr-ûş-şemsu fîs-seb"il -ûla**

**Sallî ya rabbî êla xetm-ir rusûl**

**Ma yemûc-ûl aşîqûne fis-sibûl**

Di Mewlûda “Durra Birincî Mewlûda Kurmencî” de zimanekî pir hêsan hatiye bikaranîn. Ji xeynî bêjeyên ‘Erebî yên olî, bandora zimanê ‘Erebî kêm tê dîtin. Bi qasî ku hatiye tespît kirin ji bilî peyvên olî, peyvên ‘Erebî yên ku derbasî kurdî bûyîn hatine bikaranîn.[133] Ev jî têgihiştina Mewlûda Xelîlî hêsantir dike.

Her weha ji xeynî van tespît kirina, qertafa nîsbet kirinê (îsmî mensup) ya ‘Erebî [134] hate tespît kirin.

---

[132] Îlhan, h.b., r. 42

[133] Ji bo ku sînorê teza me neyê derbas kirin tenê peyvên ‘Erebî yên ku di beşa dîbaceyê de hatine bikaranîn “Kitêp, Nezim, dewa ‘îlac, tarîx, Xewwas, mahir, behr, sanî, mewc” hatin tespît kirin.

[134] İsmî mensup di ‘Erebî de girêdayîna kesekî bi cehekî ve an jî girêdayîna tiştekî bi kesekî ve ye.

Wekî Mînak:

Ji pêla yekê bi destê Sîracî

Derxistiye ev Dura birincî

Wekî ku ji van her du beytên jor jî ku me ji Mewlûda Bateyî wekî mînak hilbijartin di temamê metnê Mewlûda Bateyî de bandora zimanê ‘Erebî derdikeve pêşiya meriv. Wekî encam em karin bibêjin ku Bateyî ji Xelîlî zêdetir di bin tesîra zimanê erebî de maye.

### 3.3.1.2. Bandora Farisî:

Bi qasî bandora zimanê ‘Erebî ne be jî bandora zimanê Farisî li ser Mewlûda Bateyî xwe nîşan dide. Ev bandor piranî di sernivîsên Mewlûda Bateyî de xwe nîşan dike.

Ji bilî nusxeya Dîyarbekrê sernivîsên hemû nusxeyan bi Farisî ne. Her weha ji bilî sernivîsan di Mewlûdê de peyvên wekî “Afîtab, xer, nam, aşînaz, zûd, awaz, bedîd, bîş, came, damen dehen, dîde, peder, nîm” jî hene.

Ji xeynî van peyvan Bateyî daçeka “**Ez**” ku tê wateya “**ji**” jî zehf bi kar aniye.[135]

Mînak:

Her çi dara hişk e, ez biçme binî

Bû heşîn û ket e, **ez** pelgan genî

Hatin heftê Cihûd ez mulkê Şam

Taze bey’et best û ‘ehde natemam

Bandora Farisî di Mewlûda Xelîlî de kêm tê xuya kirin. Hin peyvên ku di Mewlûda Xelîlî de hatine tespît kirin ev in: “pesin, mah, çar, sê, pur, perd”

[135] Îlhan, h.b., r. 46-47

### 3.3.1.3. Bandora Tirkî

Her wekî Farisî û ‘Erebî Bateyî di bin bandora Tirkî de jî maye û di hin xaneyên Mewlûda xwe de peyvên Tirkî jî bikar anîne. Wekî mînak di van beytên jêr de peyvên “ocak û al” bikar aniye.

Mînak:

Da biçine pêşî **ûcaġa** Qureyş

Belkî halê me bibîtin taze ‘eyş”

**Ocak:** mal, malbat

Ey hebîbe min Muhemmed ey delal!

Bêje da rohnik nebarin bo te **al**

**Al:** sor

Di Mewlûda Xelîlî de bandora zimanê Tirkî heme bêje qed tine ye. Di tevahiye Mewlûdê de tenê peyvek hate tespît kirin. Ev peyv jî peyva “Birinci” ye.

Ji pêla yekê bi destê Sîrac**î**

Derxistiye ev Durra **Birincî**

Bi giştî em karin bibêjin ku Bateyî li gorî Xelîlî pirtir di bin bandora zimanên biyanî de maye. Ji aliyê bikaranîna zimanekî xweru ve nirxê Mewlûda Xelîlî ji ya Bateyî pirtirîn e. Lê ev nayê wateya ku ji bo Mewlûda Bateyî ev kêmasiyek be. Lewra berî ku di erdnîgariya ku Kurd lê dijîn, wexta ku sînor neyin, nivîskar û helbetvanan di nivîsê xwe de di xwestin ku hunera xwe bidin nişandan. Ji ber vê sedemê em di vê baweriyê de ne ku Bateyî jî di Mewlûda xwe de xwestiye hunera xwe ya ziman nîşan bide. Giraniya zimanê wî jî ji ber vê sedemê ye.

Nivîskarê her du berheman jî li gorî serdema xwe zimanekî pir serkeftî bi kar anîne. Lê wexta ku em her du berheman bi tevahî bi nirxênin tê dîtin ku “Mewlûdu’n-Nebî” şahesereke edebî ye.

### 3.3.2. Şêwaz

Ziman, wekî amûreke ji bo têgihiştinê di nava mirovan de, di be du beş: zimanê nivîskî û zimanê axaftinê. Dema ku mirov bixwazin bi devkî peyamêkê ragihînin; Gava ku ew dixwazin bi nivîskî hest, raman, daxwaz û xwestekên xwe diyar bikin zimanê nivîskî bikar tînin. Dema ku zimanê nivîskî zimanê çand û edebiyata miletekê ye, zimanê axaftinê li gorî hawîrdorê civakî cihê dibe.[136] Bê guman Mewlûd jî wekî cureyekî edebî, ji hêla ziman ve bandorek li wan bûye. Di vê çarçovê de, dema ku em li ser şêwazên her du Mewlûdan bisekinin, em ê pêşî zimanê rojane û zimanê edebî berçav bikin. Her weha em ê di vê çarçoveyê de taybetnendî yên her du Mewlûdan berawird bikin.

#### 3.3.2.1. Zimanê Rojane

Mebest ji zimanê rojanê zimanê axaftinê ye. Her çend pênaseyên cûda yên axaftinê têne kirin jî, em ê tenê li vir li ser pênaseya Suat Taşer bikin. Li gorî wî axaftin; derbirîna hest, raman û daxwazên bi navgîniya hêmanên bihîstî û dîtbarî çêdibe. Axaftin pêvajoyek ku di hiş de dest pê dike û bi vegotina devkî ya ramanan ve tê qedandin.[137] Ev pêvajoya hişmendiya mirovan Ji ber ku di Mewlûda Xelîlî de bi zimanê axaftinê re nêz e, ji bo peydakirina peyaman ji mirovan re hêsantir e ku bikar bînin. Mewlûda Xelîlî ji bingehek edebî veqetandî ye û strukturek e ku hema hema her kes dikare wê fêm bike.

#### 3.3.2.2. Ziman Edebî

Zimanê edebî şêwazek estetîkî û rastîn e ku tê de tê gotin ku li ser bingehê vegotinê ku her diçe wekî çanda zimanê pêkve piştî avakirina zimanê axiftinê û zimanê nivîskî ya miletekî, ji aliyekî ve bi nirxên rastîn ên jiyanê re, tête hesibandin.[138]

Zimanê ku em di jiyana xwe ya rojane de bikar tînin di nav de bêjeyên ku tije ye ji bermayiyên asayî yên wate û rêzikên sintaksîkî yên van peyvan ne. Lêbelê, hîs û hestên giran di peyvên zimanên rojane de her gav nayê gotin. Ji ber ku di zimanê rojane de gotin û vegotîn têne şilandin û şînbûna xwe winda dikin. Ji bo ku bigihîje çîrokek

---

[136] Hasan Basri Kansızoğlu, *"Konuşma Dili ve Yazı Dili Etkileşimi"*, Bartın Üniversitesi Eğitim Fakültes*i* Dergisi 1/1, Bartın 2012, r. 218.
[137] Suat Taşer, "*Konuşma Eğitimi*", Papirüs Yayınevi, İstanbul 2000, r. 27.
[138] Mehmet Önal, "*Edebî Dil ve Üslup*", A.Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi 36, 2008, r.25.

bihêz, divê hunermend ji nû ve peyvê nûjen bike û ji zimanê rojane wateyên cuda bike.[139]

Gava ku ji aliyê taybetmendiyên edebî ve em her du Mewlûdan binirxînin hem Xelîlî û hem jî Bateyî xwedan taybetmendiyên edebîne ne. Di derbarê van taybetmendiyan de, mirov dikare bêje ku Bateyî çîrokbêjekî edebî bihêz e, ji ber ku ew bêtir hûnerên edebî û gelek peyvên ‘Erebî û farisî bikar tîne. Ji bo ku Mewlûda Xelîlî bi zimanê rojane yê axaftinê hatî nivîsandin, nîşan dide ku ew xwediyê zanistiyeke xurt a reziman û paşxaneya edebî ye. Ji ber ku ew yekîneyek bihêz e ku hemî taybetmendiyên edebî bi bêjeyên hêsan diyar dike da ku her beş were fam kirin.

Xelîlî di Mewlûda xwe de sedema bi kar anîna zimanekî hêsan weha aniye ziman: Ew kesên ku nizanin Mewlûdê bixwînin û wateya wê tê derxînin bi xwendina Mewlûda “Durra Birincî Mewlûda Kurmancî” wê yek bi yek wateyê wê derbixin. Ev jî dide nîşandan ku armanca wî ne ku berhemeke edebî a giran derxê holê. Berevajiyê vê berhemeke ku her kes karibe jê sûd wergire derxe holê ye. [140]

## 3.4. JI ALIYÊ WEZN, QAFIYE Û REDÎFÊ VE

### 3.4.1. Wezn

Kêşa Mewlûda Bateyî, “Fa’ilatûn / Fa’ilatûn / Fa’ilûn” e ku u ji Behra Ramelê ye û qalibekî nesalim e[141]. Keşa Mewlûda Xelîlî jî bi keşa, “Fâ’ilatûn / Fâ’ilatûn / Fâ’ilûn” Behra Remelê û qalibekî nesalim hatiye nivîsîn. Li gor vê hem Mewlûdu’n-Nebî hem jî Durra Birincî Mewlûda Kurmancî bi wezna “Fa’ilatûn / Fa’ilatûn / Fa’ilûn” û bi behra nesalim hatine nivîsandin.

Li jêrê qalibê arûzê li gorî kîteyên girtî û vekirî li ser her du berheman hatiye tetbîqkirin.

| **Mewlûdu’n-Nebî:** | **Durra Birincî Mewlûda Kurmancî**: |
| --- | --- |
| Cumle zerratê cihan da ev seda | Wa Xudayo! her bi barîn bêjimar |
| — + — — / — + — — / — + — — / — + — | — + — — / — + — — / — + — — / — + — |

---

139 Mustafa Özkan, “*Edebiyatta Dil kullanımı*”, Türk Dili ve Edebiyatı Dergisi L/2 (t.y.), r. 70.
140 M. Sıddik Ataç, "*Kitaba Durra Birincî Mewlûda Kurmancî*", Renk Ofset, Nusaybin 2001, r. 2-3.
141 Îlhan, h.b., r. 34.

Kirne gazi pêk ve gotin: "Merheba          Mislê baran û mij û ṭav û bihar

−+−−/−+−−/−+−−/−+−          −+−−/−+−−/−+−−/−+−

Wekî ku ji her du beytên jor jî diyar dibe, her du Mewlûd jî bi heman weznê hatine nivîsandin. Lê di warê bikaranîna zimanekî zelal de Xelîlî li gorî Bateyî kêmtir peyv, terkîb û hevokên 'Erebî û Farisî bi kar anîne. Jiber ku bikaranîna peyv, terkîb û hevokên biyanî di Mewlûda Xelîlî de kêmtir hatine bikaranîn û têgihiştina beytên wî hê hêsantirîn tên têgihiştin, di warê bi karanîna wezn û ziman de serkeftîtir dikare were hesibandin.

Ji aliyê teserrufên ku helbestvan di kêşê de dike rewşeke weha heye:

**Zihaf:** Eger hêceyeke dirêj ya beytekê, bi mebesta ku li weznê bê kurt bê xwendin, wê demê zihaf pêk tê. Bi gotineke dî, zîhaf, kurtexwendina dengdêrekî dirêj e. Hebûna zîhafê ji helbestvan re wekî qusûr tê qebulkirin.[142] Em dê zîhaf bi sembola "z" nîşan bikin.

Minak:

**Mewlûdu'n-Nebî:**

Hemdê bêhed bo Xudayê 'alemîn

-z - - / - + - - / - + -

Ew Xudayê daye me dînê mubîn

- + - - / - + + - / - + - - -

"Fâ'ilatûn / Fâ'ilatûn / Fâ'ilûn"

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

"Piştî hemdê bêqiyas û bê'eded

Bo Xudayê Wahid û Ferd û Semed"

(1/1)

"Fâ'ilatûn / Fâ'ilatûn / Fâ'ilûn"

**Îmale:** Eger hêceyeke kurt ya beytekê, bi mebesta ku li weznê bê dirêj bê xwendin, wê demê îmale pêk tê.[143] Me îmale bi sembola "+" nîşan daye.

142 Adak, b.n., 2014, r. 382.

143 Adak, b.n., 2014, r. 382.

**Mewlûdu'n-Nebî:**

Em kirine ummeta Xeyru'l-Beşer
Tabi'ê wî muqtedayê nam(i)wer
"Fâ'ilatûn / Fâ'ilatûn / Fâ'ilûn"

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

Ew Xudayê pur li me ni'met kirî
Ehmedê hadî li me xil'et kirî

(1/2)

Çêtir e bo me ji rûh û can û mal
Şafî'ê roja giran e ey heval

(1/3)

**Wesl:** Di erûzê de dema ku bêjeyek bi tîpeke bê deng dawî bibe û bêjeya dû wê re bi tîpeke dengdar destpê bike li wir her du bêje bihevre tên xwendin.[144] Me Wesil bi sembola "=>" nîşan kiriye

Mînak:

**Mewlûdu'n-Nebî:**

Çûn îradet hate Sultanê refî'
- => + - - / - z - - / - + -
Çêkitin Adem bi vî şeklê bedî
- + - => - / - + + - / - + -
"Fâ'ilatûn / Fâ'ilatûn / Fâ'ilûn"

**Durra Bincî Mewlûda Kermancî:**

Wekî mînak:
Wa Xudayo! her bibarên bêjimar
Mislê baran û mij û tav û bihar

(1/4)

Di hin xaneyan de kîte zêde ne û kêş xerabe ye.
Der duşenbe diwazdehê ewwel rebî'

144 Îlhan, h.b., r. 35.

Sala file hate ew hemla bedî[145]

## 3.4.2. Qafiye

Bi kêmanî di dawiya du risteyan de, wekheviya dengên ku wateya wan ji hevdu cuda wek Qfiye tê binavkirin. Qafiye carinan di nava risteyê de û carinan jî di dawiya risteyê de xwe nîşan dide. Le bi piranî di dawiya risteyê de ye. Di edebiyata klasîk de qafiye bi awayekî giştî ji dubarekirina dengan a dawiya misrayê re tê gotin.[146]

Di ferhengê de wateya qafiye yê, piştа serî ye ku ev peyv bi forma "qefa" derbasî Kurdî jî bûye. Peyva piştre wateya "dawiya tiştekî" û di edebiyatê de jî "dawiya beytê" bi dest xistiye. Wekî têgeheke edebî qafiye ew ahenga ku di dawiya betê yan jî di wî cehê ku wekî dawiya beytê tê qebûlkirin de, ji dubarekirina dengên di navbera peyvên cihêwate de derdikeve meydanê. Di edebiyata kilasîk de ji wan herfên ku tên dubarekirin re herfên "rewî" yê tê gotin. Hevbeşiya redîfê pêwist e di binemaya bêjeyan de çêbibe[147]

### 3.4.2.1. Qafiyeya Tam

Qafiyeya tam, di helbestan de ji paşiya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji bilî redîfê, wekheviya du dengan e. Di her du Mewlûdan de jî gelek caran qafiyeya tam hatiye bikaranîn.

Wekî mînak:

**Mewlûdu'n-Nebî**
Ew hebîbê ronahîya heft asîman
Herdû alem qalib ew ruh û rewan

Ma rameyte îz rameyte gûşîdar
Destê wî destê xweda der kâr û bar
**…an …an, …ar…ar**: qafiyeya tam

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

---
145 Îlhan, h.b., r. 35
146 Adak, b.n.r., 2014, r. 395.
147 Adak, h.b., r. 395.

Kes li mala min nebû kiflet temam
Wan bi xwe ava dikir beyt-ul Heram

(20/6)

Bir bi bir hor û melek va têne xwar
Şu’le û nûrê digirtim çar kenar

(22/2)

**…am…am, …ar…ar:** qafiyeya tam

### 3.4.2.2. Qafiyeya Dewlemend

Qafiyeya dewlemend, di helbestan de ji paşiya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji bilî redîfê, wekheviya sê dengan e.[148] Di her du Mewlûdan de jî gelek caran qafiyeya tam hatiye bikaranîn.

Wekî mînak:

Deste gîr û mistaxasê herdû k**ewn**
Bo gunehkaran penah û pişt û **ewn**

Her yekî tesbîheke xas û c**uda**
Daima tesbîhi xwendin bo X**uda**

**Ewn, uda:** qafiyeyya dewlemend

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

Lewra Xuda ‘efû dikê gun**ehan**

Çiqqa bikê bende di sal û m**ehan**

Qet nekin vala devê xwe j’sel**ewat**

Da Xuda we b’parizênê ji ş**ewat**

(2/4)

[148] Îlhan, h.b., r. 38.

**Ehan, ewat:** qafiyeya dewlemend

### 3.4.2.3. Qafiyeya Nîv

Qafiyeya nîv, di helbestan de ji paşiya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji bilî redîfê, wekheviya dengekî bitenê ye.[149] Di Mewlûda Bateyî de gelek caran meriv rastî qafiyeya nîv tê lê di ya Xelîlî de me tene beyteke bi tenê ku bi qafiyeyya nîv hatî nivîsandin dît. Kîjanî zêde bi kar aniye? Dıvê tu muqayese bikî?

Wekî mînak:

**Mewlûdu’n-Nebî:**

Bûye sunnet lew selam û redde fer**z**
Cumle ehwalê dî paşe kime ‘er**z**

<<Îhbîtû mînha cemî’en>> hate em**r**
Adema dê bêteve lêkin bi seb**r**

**z, r:** qafiyeyya nîv

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

Ew riha tahir çi reş bû pir bim**û**
Lê girover j’gerdenê derbas neb**û**

(6/5)

**û:** qafiyeya nîv

---

[149] Îlhan, h.b., r. 38.




**Grafîk 4**: Li gorî hejmara beytan rêjeya qafiyeyan di her du mewlûdan de







**Grafîk 5**: Berawirdkirina hejmara qafiyeyan di her du mewlûdan de

Wekî ku ji girafîkan jî dîyar dibe hem Bateyî û hem jî Xelîlî di metnê Mewlûdên xwe de cih dane qafiye yên cur bi cur. Gava ku em li hejmar û rêjeya qafiyeyan di her du mewlûdan de dinêrin, tê dîtin ku li gorî hecma xwe kêm jî be rêjeya qafiye yan heme bêje wekî hev in. Tê dîtin ku her du nivîskar jî ji qafiye ya tam hez kirine. Piştî qafiyeya tam tê dîtin ku qafiye ya dewlemend bikar anî ne. Kêm jî be qafiye ya nîv jî di metnê her du Mewlûdan de xwe nîşan dide. Gava ku em ji aliyê hejmarê ve berawid kirinekî bikin, Bateyî di her sê cureyên qafiye yê de ji Xelîlî zêdetir bikar anîne. Lê ku em hecma her du Mewlûdan ber çav bigirin rêjeya wan kêm jî be wekî hev in û em nikarin bibêjin ku kî ji kî di vê xalê de serkeftîtir e.

### 3.4.3. Redîf

Redîf digel kêşa erûzê unsura herî girîng ên estetîk û ahenga helbesta klasîk e. Redif di edebiyata klasîk de bi awayekî giştî ji paşiya risteyê ber bi serê risteyê ve, wekheviya dengên hev pêwir û hevpar e.[150] Her du nîvîskaran jî di Mewlûdên xwe de redîf bi kar anîne. Em ê li jêr li ser sentezekî di derbarê her du Mewlûdan de bikin.

Wekî Mînak:

| **Mewlûdu'n-Nebî:** | **Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:** | |
|---|---|---|
| Serfe Mewlûda min yek dirhem fer **e** | Her dû çavê reş belek qozî **hebûn** | |
| Hemberê yek kohê zêrê ehmer **e** | Birh û mijgula muwê reş pur **hebûn** | |
| **e**: redife | **hebûn**: redife | (6/2) |

Li gorî titên ku tên dubarekirin sê cureyên redîfê hene.

#### 3.4.3.1. Redîfa Qertafî

Di vê cureya redîfê de tiştên ku tên dubarekirin ji qertafan tenê pêk tên.

Wekî mînak:

| **Mewlûdu'n-Nebî:** | **Durra Birincî Mewlûda Kurmancî** | |
|---|---|---|
| Gote "Nûra yek nebîyê mezin **e** | Ya Îlahî me bike bin mehder**ê** | |
| Seyyîd û hem mezinê nesla min **e** | Me bi wî re tu bibe ser kewser**ê** | |
| **e:** redîf | **ê:** redîf | (18/1) |

[150] Adak, b.n., 2014, r. 395.

Ev cureyê redîfê di Mewlûda Bateyî de behtir xwe dide nîşandan.

### 3.4.3.2. Redîfa Qertaf û Bêje/Kombêje

Di vê cureya redîfê de titên ku tên dubarekirin ji qertaf û bêje yan jî ji kombêjeyan pêk tên

Wekî Mînak:

**Qertaf û bêje:**

| **Mewlûdu'n-Nebî:** | **Durra Birincî Mewlûda Kurmancî** |
|---|---|
| Min bire nik kahinî ev qîss**e got** | Ew Xudayê pur li meni'met **kirî** |
| Kahinî higirt û da ber sîn**e got** | Ehmedê hadî li me xil'et **kirî** |
| | (1/2) |
| **e got: redîf** | **kirî: redîf** |

**Qertaf û kombêje:**

| | |
|---|---|
| Sernixûn û şermisar **in, em ji wî** | Ya Xuda em hewce ne merdî **ji te** |
| Hem kesad û bê'eyar **in, em ji wî** | Em neqenc in luṭf û ġufran her **ji te** |
| **in, em ji wî: redif** | **ji te**: redif (25/3) |

Di her du Mewlûdan de jî cureyê redîf ê ku herî zêde hatî bikar anîn ev. Lê heke ku em berawird kirinekî bikin Bateyî ji ber hecma mewlûda xwe zêdetir ev cure bi kar anîye. Lê em karin bi rehetî bibêjin ku her du nivîskaran jî ji vê cure redîfê hez kirine.

### 3.4.3.3. RedîfaTenê Bêje/Kombêje

Di vê cureya redîfê de qertaf tine ye. Piştî Qafiye yê bêje yan jî kombêje tên dubarekirin.

Wekî Minak:

| | |
|---|---|
| Mezherê nûra Muhemmed **hate ew** | Çilîqa çarê gola nehê **bû** |
| Pak û nûranî mu'eyyed **hate ew** | Di gêra yekê de mewca sisê **bû** |
| **hate ew: redîf** | **bû: redîf** |

Wekî ku ji cureyên redîfan jî diyar dibe her du nivîskaran jî ji her cureyên redîfan bikar anîne. Lê Bateyî li gorî Xelîlî pirtir ji redîfan sûd wergirtiye. Ev yek jî dide nîşandan ku Bateyî di karanîna zimanekî edebî de ji Xelîlî serkeftîtir e.

Bateyî di Mewlûda xwe de ji bo hêmanên hevsengî ye ji redîf û qafiye yê pir sûd wergirtiye. Ev qafiye û redîf %85-90 ji peyvên ‘Erebî hatine çêkirin. Ev peyv bi piraniya wan nav in.

Wekî mînak

Saleha tesbîhi kir nûra **şigerf**

Şeş mî’et elf û çihar û bîst *û* **elf**

Herçiqas ji bo hevsengiyê ji peyvên ‘Erebî sûd wergirtibe jî di nava beytên xwe de lêkerên kurdî pir bikar anîne

Wekî mînak:

Hem ji Ebdulmuttelib **bû hamile**

Fatîme hem muddeteş **bû kamîle**

Li dijî vê yekê Xelîlî di Mewlûda xwe de ji bo hêmanên hevsengî yê %80-85 ji peyvên kurdî sûd wergirtiye.

Ev peyv piraniya wan peyvên ku radera wan nav in hatine bikaranîn.

Wekî mînak:

Yek Quşey û yek Kulab û Murre **Ke’b**

Hem Luey û Xalib û fihr nîn e **Le’b**

Di heman deme de ji bo hêmanên hevsengî yê lêkerên wekî “kirin birin dayîn, bûyîn, anîn, firîn, hatin” bi kar anîne.

Wekî mînak:

Min divê ez bo biraxizmet **bikim**

Reşbelek Kurmanciyaxwe xet **bikim**

## 3.5. JI ALIYÊ HÛNERÊN EDEBÎ VE

Di metnên edebî de hûnerên edebî ji bo têgihştin û şîrovekirinê cihekî xwe yê giring hene. Di Mewlûda Melayê Bateyî de ji van hûnerên edebî herî zêde: Teşbîh, îstiare, tenasûp, telmîh, întaq, nîda, Tezat, Îstifham, Alîterasyon û Asonans ber çavê me ketin. Ji ber ku Mewlûd ji rabirdûyekê feyza xwe digre hûnera telmîhê zêde derdikeve pêş. Her weha hûnera nîdayê xwe di gelek beytan de nîşan dide. Bateyî ji bo ku wateya beytan bi hêz bike ji hûnera tezatê jî gelekî sûd wergirtiye.

Li hember vê yekê Mela Sîraceddînê Xelîlî jî di Mewlûda xwe de cih daye van hûnerên edebî. Gava ku em li Mewlûda Xelîlî dinêrin wekî Bateyî wî jî bi piranî cih daye hûnera Teşbîhê. Her weha hûnerên Telmîh, Tezat û Nîdayê jî gelekî derdikevin pêşya me.

Li jêrê em dê hûnerên edebî yek bi yek di gel mînakan ji bo her du Mewlûdan binivîsin.

### 3.5.1. Teşbîh

Teşbîh bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê şibandin û lêkçivandin e. Hûnera şibandinê ye. Ji bo ku peyv bêtir bihêz bibe mirov pêyva bêhêz dişibîne ya bihêz.[151] Di her du Mewlûdan de hûnera teşbîhê pir hatiye bikaranîn.

Wekî mînak:

**Mewlûdu'n-Nebî:**

**Sipî wek şîr û şêrîn û şehdiwar**
Jê vexwe! Wî gote min sê çari car

**Mîslê berqa xatife**, rabûn û çûn
Min didîtin ta di çerxê berze bûn

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

Rehmet û êmintiya j'derd û kula
Ser Muhemmed **melhema can û dila**

(1/5)

---

[151] Reşad Faik, Ali Nazima, *Mükemmel Osmanlı Lügatı*, Türk Dil Kurumu Yayaınları, İstanbul 2009. r. 258-259.

Aniya pehn û fereh bêhvil çelak

**Dev wekî gustîl didan mircanê pak**

(6/3)

### 3.5.2. Îstîare

Îsti'are bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê jî emanetgirtin an jî deynkirin e. Ev huner, hunereke şibandinê ye; lê di vê şibandinê de ji ya ku dişibe û ya ku tê şibandin yek tenê tê bikaranîn.[152] Ji vê hunerê di her du Mewlûdan de jî mînak derdikevin pêşberî me.

Wekî mînak:

**Mewlûdu'n-Nebî:**

Refte gûrek hate berxê nûciwan

Lê belê hişyar e lê zîba şivan

Nagehan fikrê Weheb dî j'asîman

Hate xwerê **leşkerê rûhaniyan**

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

**Wek zuxur xwarin** di mista wî de bûn

His kirin ehlê civatê dîtibûn

(11/1)

Gotî wî **zatê hebîbê rûh û can**

Yek selatê ser me bê şekk û goman

(9/2)

### 3.5.3. Tenasûb

Tenasûb ji koka nesebe tê û bêjeyeke 'Erebî ye. Wayeta wê ya ferhengî, lêhatin, munasibî, pêketin û bihevgirtin e. Di yekeya helbestekê de eger peyvên ku di navbera wan de têkilî hene bi hevre werine bikaranîn wê çaxê hunera Tenasûbê li wir heye.

[152] Devellioğlu, h.b., r. 453.

Hem di Mewlûda Bateyî de û hem jî di ya Xelîlî de hunera Tenasûbê pir hatiye bikaranîn.[153]

Wekî mînak:

**Mewlûdu'n-Nebî:**

Her çi **dar**a hişk e, ez biçme binî
Bû **heşîn** û kat e, **pelgan** genî

Hêj ne **'erş** û **ferş** û **kursî** û **qelem**
Hêj ne **lewh** û enbiyayê muhteşem

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

Pêbixin **fanûs** û **find** û **lûkus**a
'Ûd û 'enber hun bişewtênin wusa
(15/6)
Wa Xudayo her **bibarên** bêjimar
Mislê **baran** û **mij** û **tav** û **bihar**
(1/4)

## 3.5.4. Telmîh

Telmîh peyveke 'Erebîye û wateya wê ya ferhengî çirûsandin e. Wekî hunereke edebî ev huner kesên navdar û dîrokî tîne bîra mirovan. Ev bîranîn, bîranîneke Qur'anê, bîranîna kesayetên navdar, gotineke pêşiyan, pêkenokeke navdar, bûyereke dîrokî an jî helbesteke navdar e.[154] Di her du Mewlûdan de jî ev hunera edebî pir derdikeve pêşiya meriv.

Wekî mînak:

**Mewlûdu'n-Nebî:**

**Fexrê îbrahîm** û **îsmaîl** û **Nûh**

**Mustafa** ê ba wefa ê ba fitûh

---

153 Devellioğlu, h.b., r. 1076.
154 R. Selçuk Uysal, *Belagat ve Edebi Sanatlar Lügatı*, , Doğu Kitapevi, İstanbul 2010, r.197-198.

Hem ji şeyxan bû rivayet ev xeber

**Şêyxê Kerxî**, **Fexrê Razî** ba dîger

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

Yek Quşey û yek Kulab û Murre Keᶜb
Hem Lueyy û Xalib û Fehrê ᶜEreb

(17/4)

Mahê şeş va hatî Îbrahîm di heft
Hatî Isma'îl bi şahî hem bi bext

(19/3)

### 3.5.5.Tekrîr

Tekrîr bêjeyeke 'Erebî ye û tê wateya dubarekirin ê.[155] Ev hûner, di yekeya helbestê de gotinek an jî peyvek du sê caran werin dubarekirin, tê wê wateyê ku li wir hunera tekrîrê heye.[156] Ev huner hem di Mewlûda Bateyî de hem jî diya Xelîlî de hatiye bikar anîn.

Wekî mînak:

**Mewlûdu'n-Nebî:**

Dê çi bit halê me û tedbîr û ray?
**Ay û way û ay û way û ay û way**!

**Yek li** deste raste hat û **yek li** çep
**Yek li** piştê, **yek li** pêşim ba edeb

**Esselatu 'aleyk esselamu 'aleyk** ya mehdi'l-enam
**Esselatu 'aleyk esselamu 'aleyk** min babi esselam

---

155 Devellioğlu, h.b., r. 1066-1067.
156 İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, 30. Bs, Kapı, İstanbul 2018), r, 460.

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

**Hem li** al û hogir û yarê **ewî**
**Hem li** etba’ û ricadarê **ewî**

(1/6)

**Yek li** banê beytê danîn **yek li** xerb
**Yek li** şerqê min didîtî bê‘eceb

(21/1)

**Xweş bi xêr hat xweş bi xêr hat xweş bi xêr**
**Xweş bi xêr hat** wî tijî kir xêr û bêr

(23/1)

### 3.5.6. Întaq

Întaq, ji bilî mirovan axaftina hebûnan e. Eger ku ji bilî mirovan hebûnek bi axife li wir întaq heye.[157] Di her du Mewlûdan de jî ev huner pir kêm hatiye bikaranîn.

Wekî mînak:

**Mewlûdu’n-Nebî:**
Ya qelem binvîse emrê padîşah
“**Ez çi binvîsim bi ferman ya Îlah**”

Hem ji erde tête sem’im ev kelam
“**wê digel te nûra Ehmed es-selam”**

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**
Dar û ber ser wî selam dan bêjimar
**Qurmê xurmê j’firqetê kir zarezar**

(11/2)

Polê goştê jehr kirî gotî bi zûd:
**“Min nexwe ez jehr kirim jinka yehûd”**

(11/3)

[157] Pala, h.b., r. 246.

### 3.5.7. Nîda

Hunera edebî ya gazîkiri an jî degkirinê ye. Bi peyvên weke “ey, ya, aya, wa” ev huner tê kirin. Di her du Mewlûdan de ev huner hatiye baikaranîn.[158] Hin bûyerên ku helbestkar gelekî hestiyar dikin û kelecana wî bilind dikin vê hunerê derdixin meydanê. Piştî vê hestiyarî û kelecanê, helbestkar wan bûyeran û kesan tîne ber çavên xwe û bangî wan dike. Ji ber vê yekê jî gelek caran nîda bi hunerên tekrîr û teşxîsê re tê bikaranîn.[159]

Wekî mînak:

**Mewlûdu’n-Nebî:**

Merheba **ey** mah [û] xurşîdê Xuda

Merheba **êy** ku ji Heq nabit cuda

**Ya** Resulellah! Resûlê ins û cin

**Ya** şefî’e şedrê dîwana mezin

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

**Wa** Xudayo her bibarên bêjimar
Mislê baran û mij û tav û bihar

(1/4)

**Ey** gelî guhdarê Mewlûdu’n-Nebî
Reḥmeta Ḥeq her li ser rûhê we bî

(2/3)

### 3.5.8. Tezat

Tezad bêjeyeke erebî ye û ji koka “zidd” ê tê. Wateya wê ya ferhengê, ‘eksî hev, dijberî hevbûn e.[160] Wateya wê ya têgehî jî, di helbestekê de bi riya bêjeyeke ku du wateyan di xwede bihewîne çêdibe. Lê belê divê ji van wateyan yek wateya rastînî û ya

158 Devellioğlu, h.b., r. 833.
159 Dilçin, h.b., r. 412., 253.
160 Devellioğlu, h.b., r. 1105.

din jî wateya mecazî be. Ji bêjeyên dijberî hev, divê teqez yek ji wan bi wateya xwe yî rastî û ya din jî bi wateya mecazî be.[161]

Wekî mînak:

**Mewlûdu'n-Nebî**:

**Berr** û **behr** û **şerq** û **gerbê** 'alemê
Hate gêran hêj ne behsa Ademe

Her çi dara **hişk** e, ez biçme binî
Bû **heşîn** û kat e, ez pelgan genî

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî**:

Qam û bejna wî ne **kin** bû ne **dirêj**
Wechê wî sor û sipî bû nûr dirêj
(6/1)
Wî guliyya reş ji pêşa nîvê ser
Hin li **rast** û hin li **çep** kir bû du ger
(6/4)

### 3.5.9. Îstîfham

Di yekeya helbestê de îstîfaham, hunera pirsê ye. Ji bo ku wate bi hêz bi be pirs tê kirin. Gelek caran ev pirs ne li hêviya bersivê ye. Hunera îstÎfhamê di Mewlûda Bateyî de xwe gelek caran nîşanî mirov dide lê di ya Xelîlî de ev huner pir kêm tê dîtin.[162]

Wekî mînak:

**Mewlûdu'n-Nebî**:

Da **biçîtin telbe ket kani kî ye?**

Xweş dibe jin vê newaya 'aliye

---

[161] Tok, h.b., r. 306.
[162] Dilçin, h.b., r. 412.456.

Deng helîna wê li banê koh çiya

**Ah û wah! Durrdaneyê min ke reva?**

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

**Polê goştê jehr kirî gotî bizûd?**

“Min nexwe ez jehr kirim jinka yehûd”

(11/3)

### 3.5.10. Alîterasyon

Wateya hunera alîterasyonê ya têgehîn, dubarekirina konsonantên (bêdeng) bêjeyên di helbestê an jî di nesrê de ye. Armanca vê hunerê ew e ku di helbestê de ahengeke xweş derxe meydanê.[163]

Wekî mînak:

**Mewlûdu’n-Nebî:**

Ye**k** li destê rastê hat û ye**k** li çep
Ye**k** li pişte, ye**k** li pêşim ba edeb

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî**:

**Xweş b**i **xêr h**at kir du’a bo ummetê
**Xweş b**i **xêr h**at da nebînê zehmetê

(24/3)

### 3.5.11. Asonans

Wateya hunera asonansê ya têgehî, dubarekirina vokalên (bi deng) bêjeyên di helbestê an jî di nesrê de ye.[164]

Wekî mînak:

**Mewlûdu’n-Nebî:**

H**ate** sult**anê** felek jêrine ’al

---

163 Tok, h.b., r. 35.
164 Tok, h.b., r. 35.

H**ate** can**a**n**ê** du ‘alem ‘ekse xal

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

Xwe**ş** b**i** x**ê**r h**a**t lew sitêr bûne b**izo**t
Xwe**ş** b**i** x**ê**r h**a**t canê şeytanan d**iso**t

(23/4)

### 3.5.12. Mubalexa

Kesek li şîroveya tiştekî gelekî zêderewiyê bike mirov dikare bibêje di vir de mubalexe heye. Di mubalexeyê de tiştên ku mirov jê bawer neke û li dijî hewna mirovan tê dîtin û ev tiştên ku tên bilêvkirin tu caran pêk nayên.[165]

Wekî mînak:

**Mewlûdu’n-Nebî:**

**Serfê Mewlûda me yek dirhem fer e**
**Hemberê yek kohê zêrê ehmer e**

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

Weṣfê Eḥmed kî bibêjê her zeman
Qeṭ xelaṣ nakin qelem zar û ziman

(4/3)

Dar û ber ger tev qelem bin hem hibir
Jê re çêbin avê rûbar û behir

(4/4)

Cumleyê cinn û melek insan û ᶜam
Tev bibin katib heta roja qiyam

(4/5)

Qeṭ nikarin weṣfê wechê wî bidin
Nûr û tîrêjê ku her dem jê diçin

(4/6)

[165] Haydar Mohammed Othman, “*Di Helbestên Melayê Bateyî Da Binyada Hizr Û Rûxsarê”*,Teza Lîsansa Bilind, Zaningeha Yûzûncû Yilê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanîsta Ziman Û Çanda Kurdî, Wan 2016, r, 93.

### 3.5.13. Îqtibas

Îqtibas bêjeyeke erebî ye û wateya wê ya ferhengê, bêyî guherîn jêgirtina hevokekê an jî bêjeyekê ye[166] Wateya wê ya têgehîn, di helbest an di nesrekê de– divê bi mijara ku tê behskirin re eleqedar be- nivîsîna ayetek, hedîsek, qisseyeke navdar, gotineke navdar û hwd. were bikaranîn wê demê hunera îqtibasê çêdibe. Di helbestan de bi gelemperî ayet yan hedîsên ku tên zikr kirin tenê qismek ji wan tên îqtîbaskirin[167]

Her du muellîfan jî di mewlûdên xwe de îqtibas pir bi kar anîne.

Wekî mînak:

**Mewlûdu'n-Nebî:**

**Ma rameyte îz rameyte** gûşîdâr
Destê wî destê xweda der kâr û bâr

Di vê îqtibasê de; Xudê te'ala di sûreya Enfal, ayeta 17an de dema ku behsa şer dikir: gava te diavêt jî te neavêt; lê bele Xuda avêt.

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî:**

'Ewret û destav li 'erdê jê nedîn
Bes tenê bû **"Rehmeten lil'alemîn"**

(10/3)

***"Muḥbeta dunya serê çiqqa gunah"***
Ê xwe jê dûr kê ew e dostê Îlah

(3/3)

Ev îqtibasa ku me nîşan kirî. Di qur'ana pîroz de di sureya enbîyayê weha derbas dibe: "Me ti ji bo rehmeta 'aleman şand" ayeta 107 nîşan dike.

Di beyteke din de:

Wextê çil sal wî li dunyayê buwar
Ewwelê Qur'anê **"Iqre'"** hate xwar

(12/5)

---

166 Devellioğlu, h.b., r. 424.
167 Tok, h.b., r. 83.

Îqtibasa ku me nîşan kirî, di sureya ‘Eleqê de ayeta ku pêşî hatî nazil kirin nîşan dide.

Wexta ku em ji aliyê îqtibasan ve li her du mewlûdan dinêrin tê dîtin ku Bateyî li gorî Xelîlî pirtir ji îqtibasan sûd wergirtiye. Dîsa em vê yekê bi hecma mewlûda Bateyî re girêdidin.

### 3.6. JI ALIYÊ NAVEROKÊ VE

Dema ku ji aliyê naverokî û rêzebûyeran ve em li her du berheman dinêrin, li cem wekheviyên wan cudahiyên wan jî tên dîtin. Rêzebûyera Mewlûdu’n-Nebî bi damezrandina nûra Hz. Muhemmed dest pê dike û bi anîtina wî ya Mekehê ji aliyê Hz. Halîma ve bi dawî dibe. Ji aliyên din ve Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî “Durra Birincî Mewlûda Kurmancî” bi hemd û senaya Hz. Muhemmed dest pê dike û bi xêrhatina ji diyîkbûyîna wî bi dawî dibe. Li cem vê yekê hin mijarên ku di “Mewlûdu’n-Nebî” de hatine nivîsandin di “Durra Birincî Mewlûda Kurmancî” de nehatin nivîsandin jî hene. Mijareke din a ku dinaverokê de bala meriv dikşînê ser xwe ev e: Heman mijar û bûyerên ku ji aliyê her du nivîskara ve hatine nivîsandin, ji aliyê yekî ve bi hurgilî hatiye behskirin li dijî vê yen din ne bi awayekî hurgilî behskiriye.

Ji bo ku em kêmasiyên mijran û rêzebûyera her du Mewlûdan baş fahm bikin lazime bi awayekî metaryalî di warê naverokê de bi hurgilî li ser beşên her du Mewlûdan bisekinin. Li jêrê beş bi beş li ser vê xalê em dê rawestin.

#### 3.6.1. (Bateyî 1-11, Xelîlî 1-8)

Ev beş ji beyta yekî heta beyta yanzdehan e. Bi Bismillahîrehmanirehîm dest pê dike û bi şikir kirina xwedê berdewam dike. Her weha ji bo ku ji Ummeta ku bi navê “Xeyrul Beşer” e hatî binavkirin, yanî ji Ummeta Hz. Muhemmed (s.a.v) e, Qur’ana pîroz wekî mîrat dayê û dayîna Ehmed û Deru’s Selam şikir dayîna xwe ji bo xwedê dike.

Piştî şikir kirina ji bo xwedê, behsa Qudreta wî, bê şirîkatî û hevaltiya wî digel navê xwedê yên cur bi cur behs dike.

Behsa hêza xweda ya bê sînor dike, ku xwedayê te’ala, risqê candarên bê dest û bê ling wekî: mar, moriyan dide. Razên di dila de waqif dike û asîmanên bê sitûn avakirî behs dike. Di hersê beytên dawiya vê beşê de ji xwedê lavan û hêviyan dike ku

ji bo gunehên kirin wan bi bexşîne, berê wan her dem bide riya qenciyê û wan bi Kerem û İhsana xwe kamil bike, her dem dibin ala îmanê û ji pey riya Hz. Muhemmed wan ne veqetîne dike. Her weha di vê beşê de Bateyî hêst û ramnên xwe digel navên xwedê yên wekî: Zûl-Celal, Rahman, Rehîm, Kerîm, Alim û Letîf tîne ziman.

Beşa yekem a Mewlûda Mela Sîraccedînê Xelîlî ji beyta 1ê destpê dike û bi beyta 8an bi dawî dibe. Ev beş bi serenava Hemd û Senayê hatiye binavkirin. Piştî pesindayîna bê hempa di gel navê xwedê, Wahid, Ferd û Samed, ew xudayê ku pir nî’met dane me û Ehmedê Hadî (Hz. Muhemmed) şiyandiye ji bo me, çêtire ji rih, can û malê me lewra di roja nexweş û girande ew ê şefa’etê li me bike. Berdewama vê de ji xwedê lava û hêviyan dike ku ew herdem weke mislê barana biharî, bi qasî ewr û asîmanan rehmetê li ser Muhemmed ê ku wekî can û dil bi nav kiriye bike. Hem li al, heval, hogir û ricaderê wî, hem jî çar xelîfeyên ummeta wî xwdê razî be. Dawiya her du beytên beşa yekem de hewra xwe digihîne xwe ku ji bo xatirê Muhemmd Pexember û herçar xelîfeyan rehmetê li wan bike.

Wekî Bateyî Mela Sîracceddînê Xelîlî jî di vê beşê de navên xwedê yên cur bi cur wekî: Wahid, Ferd û Semed bikar anîne.

### 3.6.2. (Bateyî 12-24, Xelîlî 9-16)

Beşa duyem ya Mewlûdu’n-Nebî ji beyta 12an dest pê dike heta beytên 24an. Ev beş bi serenava “Der Ne’tî Muhemmed (Sellalahu ‘Eleyhî We Sellem)” hatiye bi nav kirin. Ji 13 beytan pêk tê. Di vê beşê de pesindayîna Cenabê Pêxember hatiye dayîn. Ji ber ku pesindayîna Cenabê pêxember hatiye dayîn em dikarin ji vê beşê re bibêjin ku beşa Ne’etê ye. Pesindayîna Hz. Muhemmed di vê beşê de weha hatiye dayîn: Ew dermanê her nexweşiyê ye. Parastvan û sitargeha gunehkaran e. Ew hebîbê û ronahiya heft tebeqeyên asîmanan e. Ew dil û canê her du ‘alemên gerdunê ye. Beytul Heram toz, ax û xweliya binê lingê wî ye. Ew iftixara Nebî Nuh, Îbrahîm û Îsma’il e.

Beşa duyem ya Mewlûda Durra Birincî Mewlûda Kurmancî ji beyta 9an dest pê dike bi beyta 16an dawî dibe. Ev beş ji 8 beytan pêk tê û bi serenava “Sebebê Nivîsandina Mewlûdu’n-Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin)” hatiye binavkirin. Di vê beşê de Mela Sîracceddînê Xelîlî sebebê nivisandina Mewlûda xwe aniye ziman.

Min divê ku ez ji bo gelê xwe xizmet bikim û bi gotina wî “Reşbelek Kurmanciya” xwe binivîsim. Mewlûda axirê zeman binivîsim da ku yên nezan hîn

bibin. Wexta ku Mewlûd hate xwendin û yên nezan guhdana Mewlûdê kirin, wê ma'neya wê tê derxin û hîn bibin. Bi vî awayî ma'dê temaman wê xweş bibi, işq û muhbeta Ehmedî wê di dilê wan de geş bibî. Belkî hinek ji me, ew ê ku ne di reya Hz. Muhemmed de, ji xelfetê hişyar bibin û di reya wî de bi meşin. Bi vî awayî piştî ferzên limêjê sinetê wî bikin û roja mehşerê li xwe hasil bikin. Her wekî ku xudê gotiye bila "nekne dilê xwe ew ê ku li pey putperestan dimeşin". Wê wan ji muhbeta û mal û milkê dinyayê bi xêra Cenabê Pêxember dur bibe.

### 3.6.3. (Bateyî 25-45, Xelîlî 17-25)

Beşa sêyem ya Mewlûdu'n-Nebî ji 21 beytan pêk tê. Ev beş bi serenava "Der Feza'îlî Mewlûdu'n Nebî (Sellalahu 'Eleyhî We Sellem)" hatiye bi nav kirin. Di vê beşêde Bateyî li ser xêra guhdarkirin û xwendina Mewlûdê sekiniye.

Ew kesên ku guhdariya Mewlûdê bike deriyê mizginiya lê vedibe. Bateyî di vê beşê de diyar kiriye ku Pexember (s.a.w.) ji bo xwendin û guhdarî kirina Mewlûdê weha gotiye: Çi kesê ku Mewlûda min mezin bikî roja mahşerê ez ê bibim şefe'eta wî, ava hewtê Kewserê jî wê bibe nesîbê wî û çi kesê ku quruşekî ji bo xwendina Mewlûdê xerc bike li hember wê bi qasî çiyayekî zêrê ehmrî (sor) wê bibê nesîbê wî. Ji bo xwedê wan ji bo feqîran xerc bikin û qîmetê Mewlûdê bizanin. Bateyî diyar dike ku xwendina Mewlûdê ji aliye çar xelîfeyan û zaten din ê mezin (Şêxê Kerxî, Ferxê Razî) ve jî hatiyê destnîşan kirin. Bateyî di beytên 33, 34, 35 û 36an de li ser pîrozbahiya Mewlûdê sekiniyê û ji bo pîrozbahiya Mewlûdê weha gotiye: Ew kesên ji bo xwendina Mewlûdê te'aman amade bike û li cem van te'aman şerbet, savar û te'amên bi qedir amade bike, gazî bira, heaval û hogiran bike ew dê roja mahşerê here cem Pêxemberê Enwerî (pir bi nûr). Her çi tiştên ku werin ber xwendina Mewlûdê wê mûbarek bibin. Li cem wê xwendinê, ew kesên ku ji ava ber xwendina Mewlûdê vexwe rahma nazil çi gunehê wî kesî hebe paqij dike. Pereyên li ber xwendina Mewlûdê bereket dikeve nav wan, devera ku Mewlûd lê were xwendin rehma xwedê li wê deverê zêde dibe û ew dever tijî melayîket dibe. Mala ku Mewlûd lê were xwendin wê ji bela dûr keve. Milyaketên mezin wê selewatan bidin ji bo xwediyê Mewlûdê û yên ku li wir hazir bûyîn. Kesên çavxerab û hesûd wê dûr kevin ji wir. Pir kesan dîtine keramet û mu'cîzeyên Mewlûdê. Her wekî ku hatine gotin bê hesab lê ez nikarim beji lewra pir dirêjin û têra wan nakin kîtap. Di her du beytên dawî yên vê beşê de Bateyî dibêje ku ez nikarim qedrê Mewlûdê bidim, bi hevre lê hişyarbin daku cergebez nebe.

Beşa sêyem ya Mewlûda Durra Birincî Mewlûda Kurmancî ji beyta 9an dest pê dike bi beyta 16an bi dawî dibe. Ev beş ji 9 beyta pêk tê û bi serenava "Pesnê Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin)" hatiye bi nav kirin.

Di her çar beytên pêşî yên vê beşê de Mela Sîracceddînê Xelîlî pesindayîna Cenabê Pexembêr weha aniye ziman: Kî bixwazê ku wesfê Hz. Muhemmed bide ticarî xelas nake. Pênûs, ziman û zarave têra dayîna wesfê wî nakin. Eger dar û ber tev jî bibin hibir û wekî rubaran û derayayan bibin jî û 'alema insan û cinan tev jî bibin nivîskar heta roja qiyametê jî nikarin nûr û tîrêja ku tenê ji suretê wî diçe bidin û binivîsin. Piştî çar beytên sereke yên vê beşê de, di her çar beytên din de li ser afirandina Cenabê Pêxeber sekiniye. Ji xeynî xwedê ew ji herkesi çêtir e. Wekî ava dinayê Xwedayê mezin hîjdeh hezr a'lem çêkirina ji bona wî û ew kiriye serwerê her kesî. Berdewama vê de gotiye ku xwedê sed û bîst û çar hezar enbiya çêkirine û hemû jî ji wî mehderê dixwazin da ku roja mahşerê ummetên xwe xelas bikin.

Der barê pesnê nebî de Bateyî di beşa duyem de li ser vê mijarê sekinîbû lê Xelîlî di beşa sêyem de li ser pesindayîna cenabê Pexember sekiniye.

### 3.6.4. (Bateyî 46-78, Xelîlî 26-33)

Beşa çarem a Mewlûdu'n-Nebî ji 33 beytan pêk tê. Bateyî ev beş bi serenava "Îbtidaî Nurî Muhemmed (Sellallahu 'Eleyhî We Sellem)" bi nav kiriye. Di vê beşê de li ser xuliqandina Hz. Muhemmed û heyîneyên din yê dinyayê sekiniye. Li gorî çîroka xuliqandina heyîneyên dinyayê, Xwedê berî ku Erş, Ferş, Qelem, Kursî, Lewh û Enbîyayan çê bike, parek ji nûra xwe hildide û dibêje "Bibe hebîbê min Ehmed" paşê ew nûr 624.000 salî tesbîhata dide. Paşê ji bo wê nûrê 12 Hîcap (Qudret, Ta'zim, Minnet, Merhamet, Sa'adet, Keramet, Menzîlet, Hîdayet, Nûbûwet, Rif'at, Ta'at, Şefa'at) tên çêkirin. Ev hîcap bi awayekî taybet û cuda tesbîhatan ji bo Xwedê didin. Xwedê ew navên kû ji bo Nûra Muhammedî çêkirin avetin deryayên Nusretê, Merhametê, Qudretê û Îrfanê. Wexta ku ew nûr ji deryaya Ma'rîfetê derket 124.000 dilop jê ketin û her yek ji wan dilopan bûn enbîyayek. Paşê Xwedê ji wê nûrê cewherek çêdike û nezera xwe lê dike. Ew cewher dibe du par. Li para yekî bi Heybeta lê dinêre û li paraduyem jî bi Şefqeta xwe lê dinêre. Para yekem ji heybeta û tirsa wî dibe behr û di cihê xwe de nasekine. Ew bahr ji heybet, tirs û xofa Xwedê dikele, kef û dûman

jê difûre. Kef dibe erd dûman jî dibe asîman. Ji para duyem jî Erş, Ferş, Qelem, Kursî û Lewhê çê dike.

Wekî ku tê dîtin Bateyî ji xeynî jiyana Hz. Muhemmed û jidayîkbûna wî, li ser Xuliqandina gerdûnê jî sekiniye.

Beşa çarem ya Mewlûda "Durra birinci Mewlûda Kurmancî" ji 8 beytan pêk tê. Xelîlî ev beş bi serenava "Şeklê Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin)" bi nav kiriye. Di vê beşê de Xelîlî li ser şeklê Hz. Muhemmed sekiniye û weha behskiriye: Suretê wî sor û spî, qama wî ne kin û ne jî direj bû. Çav, mijang û birhê wî reş aniya wî pahn û ferih, devê wî wekî gustîl û dinanê wî wekî mircanan pak û xweşik bûn. Riha wî reş û pir mû têde hebûn lê girover bû gerdana wî derbas nedikir. Navmilê wî pahn û çengê wî dirêj bûn. Singa wî ferih zikê wî çiqas tu bêje rast bû. Bes mû li ser mil û çengê wî hebîn û nozdeh mûyên spî li ser serêrî û riha wî hebûn. Bejn û bala wîya ku Xwedê bi hostayî çêkiri ne qelew û ne jî zeîf bû.

### 3.6.5. (Bateyî 79-116, Xelîlî 34-41)

Beşa pêncem a Mewlûdu'n-Nebî ji 39 beytan pêk tê. Bateyî ev beş bi serenava "Der Xulqiyetî Adem Pexember 'Eleyhî 'S-Selam" bi nav kiriye. Xuliqandina Hz. Adem Pêxember û Hz. Muhemmed di vê beşê de hatiye tesfîrkirin.

Emir hat ji Cebraîl re got: Kulmek ax ji erda sipî bîne! Wexta ku emrê xuliqandina Adem Pêxember gihaştê Cebraîl, wî ji erda spî kulmak ax hilda û çû cem Rebbê Letîf. Cebraîl ew kulma axê girt û bi ava tesnîm şuşt û kir wekî hevîr. Ewqas sitirand ew bû wekî dureke sipî. Paşê ew hevîr li erd, asîman û deryayê bigire heta Rojhilat û Rojava li hemû deverê gerand. Li ser vî halî de bi hezaran sal derbas bûn. Paşê bi Qudreta Xwedê Adem Pêxember çêbû. Wexta ku xwedê pifkir û Adem Pêxember çêbû hemû melek hatin û ji bo wî çûne secde. Bi vî awayî ew bi Nûra Muhemmedî hate barkirin. Xwedê ew bir bihiştê, da ku ew ji xeynî darekî ji her te'amê bihiştê ta'm bike. Wê çaxê hemû melek ji ber nûra pişta wî sef bi sef hatin wê derê. Adem Pêxember ev yek mraq kir. Xwedê jêre got: ew ji ber nûra pişta te (Nûra Muhemmedî) hatine vêderê. Adem daxaz ji Xwedê kir ku ew Nûra Muhemmedî bîne pêş wî, wê çaxê Xwedê nûr anî pêşiya Adem Pêxember. Adem Pêxember dîsa gote Xudê: Yarebbî hîn nûr maye gelo? Wê çaxê Eshabê Xudê bersiva xwe sitand. Adem Pêxember ji Xwedê hêvî kir ku nûra mayî jî bîne teliyên wî, Xwedê nûra Ebubekir,

‘Umer, ‘Elî û ‘Usman anî teliyên wî. Hawwa hat û gote Adem Pêxember: Ew çi nûra şeffaf e. Adem Pêxember gote: Ew nûra yek nebiye mezine ew hem Seyyid û meznê nesla min e.

Adem û Hewwa çawa ji dara şîrin fêkî xwarin Hulleya bihiştê ji bejna wan derket û Xwedê ew ji bihişta xwe derxistin û şiyandine dinyayê. Bi salan Adem û Hewwa girin û her tewbe kirin. Rondikê çavê Adem dar û nebat hişîn kirin. Rojekî di secdê de hengî girî, dît li asîmanan dinivîse “la îllahe illallah ba Muhemmed ba Resulullahê şah”. Gote yarebb tu bi heqqê navê wî ke ku te li ber navê xwe nivîsiye ti me efuke. Wê çaxê Xwedê di’a wî qebul kir û Cebraîl emrê îlahî anî cem Adem Pêxember. Gote: ji bo hurmeta navê Muhemmed an jî Reasul tewbeya te qebul bû her qebul.

Beşa pêncem a Durra Birincî Mewlûda Kurmancî ji 8 beytan pêk tê. Xelîlî ev beş bi serenava “Tebî’etê Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin)” hatiye bi nav kirin.

Di vê beşê de Xelîlî li ser tebî’eta Hz. Muhemmed sekiniye û weha gotiye: exlaq û tebî’eta wî ew qas xweş û qenc e, ti hesap û defter têra tera nivîsandinê nakin. Wî li ser tiştên dinyayê ti carî xeyd û dilgirti nekir. Lê li ser tiştên bê şerî’et wî ticara gotina xwe venedişard. Pir fehêkar bû, ticarî bê silav derbas ne dibû, meşa wî weke ava zelal bû, cil û sola wî pîne lê bûn, li gel feqîran diruniş û bi wan re nan û ava wan vedixwar, kêm dikeni, pir merd bû xesletên nepak û nebaşî qed li cem nebûn.

### 3.6.6. (Bateyî 117-127, Xelîlî 42-49)

Beşa şeşem a Mewlûdu’n-Nebî ji 11 beytan pêk tê û bi serenava “Întiqalî Nûrî Muhemmed (Sellallahu Eleyhî We Sellem)” hatiye bi nav kirin.

Di beşa pêncem de me got ku Bateyî xuliqandina Nûra Muhemmedî bi ya Adem Pêxember ve têkildar kiribû. Di vê beşê de Bateyî behsa 21 yek ceddê Hz. Muhemmed û xuliqandina nûra wî ya li gel cedde wî kiriye. Bateyî di vê beşê de navê ceddên Hz. Muhemmd wekî şecere daye û destnîşan kiriye ku di vê şecere de ti kesî nebaş derneketiye û heta bigehe Adem Pêxember ew ê bi bihişta Xwedê şa bibin.

Beşa şeşem a Durra Birincî Mewlûda Kurmnacî ji 8 beytan pêk tê û bi serenava Xasiyetê Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin) hatiye bi nav kirin.

Di vê beşê de Xelîlî li ser xasiyeta Hz. Muhemmed sekiniye û weha berdewam kiriye: Xesetê wî şev û roj wekî hevdu didî û wî jî pêşiya xwe û paşiya xwe weke hev didî. Wexta ku radiza dilê wî zikir dikir, wexta ku bi rê de diçû qum di bin lingê wî de ne diçû xwar lê erda wekî hesin di bin lingê wî de diçû xwar. Gava destê xwe bida destê yekî bêhna miskê ji destê wî kesî difûrî, ti carî Şeytan ne dihate derdora wî, ajalên kovî û teyr ticaran ji ber ne direvîn, mêşa qed ne dihatin ser laş û cilê wî, gava ku ji dayîka xwe bûye her du çavên wî kil kirî û sinnet kiri bûye.

### 3.6.7. (Bateyî 128-162, Xelîlî 50-57)

Beşa heftam a Mewlûdu'n-Nebî ji 35 beytan pêk tê û bi serenava "Der Întiqalî Nûrî Muhemmed (Sellallahu Te 'ala 'Eleyhî We Sellem)" hatiye bi nav kirin. Bateyî di vê beşê de li ser jidayîkbûna bavê Hz. Muhemmed ᶜEbdullah û wexta ku Hz. Muhemmed ketî malzaroka diya xwe de mu'cîzeyên ku pêk hatin meydanê sekiniye.

Wexta ku ᶜEbdullah ji dayîka xwe bû Nûra Muhemmedî li ser eniya wî tê biriqandin. Gava ku ᶜEbdullah ji dayîka xwe bû, xwîna cubbeya Hz. Yehya yê ku li Şamê hatibû şehîtkirin teze bûbû. Li hember vê yekê Rahib ketin nava tirs û xofekî lewra mu'cîzeta ku Tewrat û Încîlê digot nêzîk dibû. Ji ber ku paqij kirina xwîna Hz. Yehya pêşdeçûyîna vê bûyerê bû. Ji ber pêşgirtina vê bûyerê hewl dan ku ᶜEbdullah bikujin lê nûra Muhemmedî û kerema Xwedê destûr ne da wan û ew hilweşandin.

ᶜEbdullah wexta kum ezin dibe û dibe xort ji ber çelengiya wî çavê her kesî lê dimîne. Rojekê wexta ku diçe newala Beşir lê dinêre ku nûr ji pişta wî derdikeve û ew nûr dibe du par yek jê bere xwe dide Rojhilat ya din jî berê xwe dide Rojava, paşê ew nûr vedigere û asîman dibe du şeq ew nûr diçe tebeqeya hefta a asîmana û careke din tê dikeve pîşta ᶜEbdullah. Dara hişk gava ku li bin rudina hişîn dibe ji bo wî dibe sî û sêwan gava ji binê wê diçe dar wekî berê dîsa hişk dibe. ᶜEbdullah ji bavê xwe re dibêje ev çi hal û waziyetê bavo bêje min? Bavê wî dibêje min di xewnê de dîtiya ew mizgîniye hêviya min ew e, dê ji te çêbibe Şahê Emîn (Hz. Muhemmed).

Beşa heftem a Durra Birincî Mewlûda Kurmancî ji 8 beytan pêk tê û bi serenava "Mu'cizatê Nebî (Selhat û Selamê Xudê li Ser Bin)" hatiye bi nav kirin. Xelîlî di vê beşêde li ser mu'cîzeyên Hz. Muhemmed sekiniye.

Xelîlî hin ji van mu'cîzeyan weha rêz kirine: Pê re xeber didan gelek hişk û bican, hin ji wan bê dev û bê ziman bûn. Dar û beran li ser wî her dem sellat didan.

Goştê ku ji aliyê jineke Cihû ve hatî jahr kirin pê re xeber dide û dibêje: Min nexwe ez jarh kirima jinka Cihû. Ajalên kovî her dem dihatin cem û bi wan re xeber dida. Wexta di'a dikir av ji nava teliyên wî diherikî û ji bo kîjan nexweşî di'a bikirana ew nexweş baş dibû.

Wekî tê dîtin jî di her du Mewlûdan de li ser mu'cîzeyan hatiye rawestandin. Lê mu'cîzeyên her du Mewlûdan ji hev cuda ne. Mewlûdu'n-Nebî li ser Mu'cîzeyên ᶜEbdullah sekiniye. Durra Birincî Mewlûda Kurmancî li ser Mu'cîzeyên Hz. Muhemmed sekiniye. Di vê beşê de mijarên her du Mewlûdan ji hev cuda hatine nivîsandin.

### 3.6.8. (Bateyî 163-182, Xelîlî 51-58)

Beşa heştem a Mewlûdu'n-Nebî ji 20 beytan pêk tê. Bi serenava "Der Dil Uftaden Kî Amîne Be ᶜEbdullah Be Behed" hatiye bi nav kirin. Bateyî di vê beşê de li ser bûyera hewldayîna kuştina bavê Hz. Muhemmed, Abdullah ji aliyên Cihûyan ve sekiniye.

Ji aliyê Cihûyan ve 70 kûjer ê perwerdekirî ku sund xwarin, heta ku ᶜEbdullah ne kujin venegerin Şamê plan hatin kirin. Rojekî gava ku ᶜEbdullah bi tena serê xwe derdikeve sehrayê ev 70 kujerê wekî gurê har û dev bixwîn êriş dikin serê. Di wê kêliyê de bavê Amîne Weheb ku derketibû nêçîrê di be şahidê vê bûyerê. Weheb: ji nişka ve ji asîmanan Ferîşteyên cilê wan kesk û ruyê wan weke gula xweşik nazilî edê bûn û ew kujerên Cihû hemû tarumar kirin û ji holê rakirin. Weheb ji ber vê bûyerê hengî şaş bû, di wê kêliyêde di dile xwe de derbas dike ger bixwaze ez amîne bidime ᶜEbdullah.

Beşa heştem a Durra Birincî Mewlûda Kurmancî ji 8 beytan pêk tê û bi serenava "Şiyandina Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin)" hatiye binav kirin. Xelîlî di vê beşê de behsa hin bûyerên ji 25 saliya Hz. Muhemmed bigire hetanî wefata wî kiriye.

Gava ku 'emrê wî hate bîst û pênca ew bi Hz. Xatîce re zewicî. Gava hate çil saliya xwe ayeta Qur'anê "Îqra" jê re hat. Di pêncih û sê saliya xwe de hîcretî Medîneyê kir. Piştî ku heşt salan Mekkeha şîrîn ji destê muşrikan deran. Dih saliya hîcreta xwe de diçe heca mezin, ku ev heca wî ya dawî bû, roja înê li çiyayê 'Erefatê

xutbe da û ayeta Qur'anê ya dawî jê re hat. Bîst û sê salên wî derbasbûn bi vê xelatê û di yazdeh saliya hîcreta xwede goça dawî dike.

### 3.6.9. (Bateyî 183-232, Xelîlî 59-66)

Beşa nehem a Mewlûdu'n-Nebî ji 50 beytan pêk tê. Bi serenava "Amedenî Der An Weqtî Întiqalî Nûr Ba Amîne" hatiye binavkirin. Bateyî div an beytan de li ser zewaca ᶜEbdullah û Amîne sekiniye.

Di beşa heştem de bûyera ku Wehab bi çavê xwe dîtibû Bateyî tasfîr kiribû. Di vê beşê de Wehab bûyera ku dîtî ji xanima xwe re dibêje û xanima wî radibe diçe cem bavê ᶜEbdullah, 'Ebdulmutalib. Jê daxwaz dike ku keçawa Amîne û ᶜEbdullah bi hev re bi zewicînin. Piştî demekî li ser vê yekê 'Ebdullmutalib radibe û diçe Amîne ji bo ᶜEbdullah dixwaze û da'weta wan tê kirin. Roja d'eweta û zewaca Amîne û ᶜEbdullah tê gotin ku gotina "zava ᶜEbdullahe bûk jî Amîne" li bajêr belavdibe. Li ser vê gotinê 200 keçên ku ev bûyer bihîstin ji ber hesûdiya xwe dimirin û wê şevê textê Putperestan û Îblîsan berevajî dibin. Îblîs wê şeve diçe çiyayê Ebû Qubês û di qîre. Bi vî awayî serdemeke vî bajarî tê girtin û serdemeke nûjên ku jêre serdema Muhemmed tê gotin dest pê dike.

Beşa nehem a Durra Birincî Mewlûda Kurmnacî ji 8 beytan pêk tê. Bi serenava "Xêra Selewatan Li Ser Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin)" hatiye binavkirin. Weki ku ji serenava vê beşê jî diyar dibe, li ser xêra selewatên ku li ser Hz. Muhemmed tên kirin hatiye rawestandin.

Xelîlî di vê beşê de gaziyekî dike ji bo ummetê ku ew li ser Hz. Muhemmed pir selewatan bin. Lewra bê wî du'a qebul nabin. Dîsa dibêje ku Hz. Muhemmed gotiye: Ew kesê ku selewatan ser min bide, bê şik û bê guman yek selewat wê bibe deh rehmetullah, deh selewat wê bibe bi sedan nî'met û yê ku di roja giran de bi hezara selewatan bide ez û ew, em ê bi hev re herin baxê Cinan. Berdewama wêde dibêje ku melekek heye, kî selatan bi de pê zaneye û paşî wê bêje: Felan lawê kesê felan ser rih û canê te selat didan. Ez wê demê hengî pê keyfxweş dibim, ew kes dê di roja Xemê de mehdera min heq bike.

### 3.6.10. (Bateyî 233-257, Xelîlî 60-66)

Beşa dehem a Mewlûdu'n-Nebî ji 25 beytan pêk tê. Bi serenava "Der Muddetî Waqî'atî Hemlî Amîne" hatiye binavkirin. Bateyî di vê beşê de li ser peyvajoya hemlebûyîna Hz. Amîne, mizgîniyên Pêxemberan û wefata ᶜEbdullah sekiniye.

Di peyvajoya hemlebûyana xwede, heta şeş mehên Amîne ne qediyan wê bi hemilebûyîna xwe ne dizaniye. Di meha şeşan de dengek ji xeybê tê jê re û mizgîniya hemlemayîna bi Hz. Muhemmed didiyê. Le Amîne dibêje min di xewnan de dît ku her meh enbiyayek hat û mizgîniya Hz. Muhemmed da min. Li gorî Bateyî ragehandiye di Mewlûdu'n-Nebî de bi dorê: Meha yekem Hz. Adem, meha duyem Hz. Şîs, meha sêyem Hz. Îdrîs, meha çarem Hz. Nûh û Hûd, meha pêncem Hz. Îbrahîm, meha şeşem Hz. Îsa'îl mizgînî ji bo Amîne anîne. Piştî ku şeş mehên Amîne qediyan zewcê wê ᶜEbdullah ji bo bazirganiyê diçê Şamê lê hîn venegeryayî Medîneyê koça dawî dike û diçe ser dilovaniya xwedê.

Beşa dehem a Durra birinci Mewlûda Kurmancî ji 7 beytan pêk tê. Ev beş bi serenava "Xêra Mewlûdu'n-Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin)" hatiye binavkirin. Xelîlî di vê beşê de li ser xwendina xêra Mewlûdê sekiniye.

Ew kesê ku qedrê Mewlûdê bigire wê roja mahşerê di gel ehlê Kemal here bihiştê. Ew xaniyê ku Mewlûd lê were xwendin Xwedê çavên xerab ji wir dur dike, xêr, bereketa û rehm li wir zêde dibe û Melek sef bi sef têne wê dere. Av û xwarin, zîv û zêrên ku Mewlûd li ser wan were xwendin bereketa wan zêde dibe. Loma qedrê Mewlûdê bigirin û bixwînin.

### 3.6.11. (Bateyî 258-282, Xelîlî 61-68)

Beşa yazdehem a Mewlûdu'n-Nebî ji 25 beytan pêk tê. Ev beş bi serenava Amedenî "Weqtî Weladetî Seyyîdina Muhemmed (Sellallahu Aleyhî We Sellem)" hatiye binavkirin. Bateyî di vê beşê de li ser rojbûna Hz. Muhemmed, bûyerên di meha Rebî'u'l-ewwel şeva 8,9,10,11an de pêk hatin û rojbûna wî ya di şeva 12an de tesfîrek kiriye û welidina wî wekê "hilbûna findekî ji bo dewletê" tîne ziman.

Wê şevê li Ka'bê 'Ebdullmutelb li benda bûyîna Hz. Muhemmed disekine hetanî ku di welide. Her weha li ser dema welidandina wî û hês û ramanên Amîne jî sekiniye. Bi gotina Amîne: ronahî bi carekî kete malê û çar jinên (Hawa, Sare, Asya, Meryem) ku ji ruyên yan nûr diçe hatin derdora min. Yek li çep, yek li rast, yek li jêr

û yek li jor li ber min runiştin. Dema welidîna Hz. Muhemmede gelek mû'cîze pêk hatin; melek bi selewatan ketin hundir, ji asîmanan stêr dikevin derdora Amîne, nûr dikeve ser her dere, Amîne Rojhilat û Rojava û Ka'beyê dibîne ku derdora wan bi alê kesk hatine xemilandin. Bi emrê xwedê Cebraîl mizgîniye dide her derê, derê bihiştê vedibe, Cebraîl û Melek bi hev re tên û li her çar alên Ka'bê dibin rêz. Wê kêliyêde, wexat ku Amîne hîs dike ku tî bûye, taseke ku wekî şîr û hûngiv tijî şerbet dikeve destê wê gava ku wê şerbetê vedixwe Resulê Xwedê çê dibe.

Beşa yazdehem a "Durra Birincî Mewlûda Kurmancî" ji 8 beytan pêk tê. Ev beş bi serenava "Silsila Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin)" hatiye binavkirin. Xelîlî di vê beşê de, wekî ku ji serenava vê beşê diyar dibe, li ser silsileya Hz. Muhemmed sekiniye.

Ji [c]Ebdullah bigre heta 'Ednan hemû bavikên Hz. Muhemmed di vê beşê de hatine bahskirin. Li gorî vê silsileye ceddên Hz. Muhemmed ev in. Ebdullah kurê 'Ebdulmutallib kurê Haşim kurê 'Ebdulmenafê kurê Qusey kurê Kulab kurê Murre Ke'b kurê Luey kurê Xalib kurê Le'b kurê Malik kurê Nedret Kinan kurê Xuzeymet Mudrîk kurê Ilyas Muder kurê Niza kurê Me'ed kurê 'Ednan e.

### 3.6.12. (Bateyî …, Xelîlî 69- 76)

Beşa diwazdehem a Mewlûdu'n-Nebî ji 15 risteyan pêk tê. Bi serenava "Der Îkramî Qiyam Li Wiladetî Xayr l- Enam 'Eleyhî Efdelu's- Salatî We's-Selam" hatiye binav kirin. Bateyî di vê beşê de, tesbîhateke piçûk di gel navê Xudê, Mekkê, Şamê û Hz. Muhemmed nivîsiye.

Beşeke wekî vê di Mewlûda Xelîlî de nehatiye nivîsandin.

Beşa diwazdehem a "Durra Birincî Mewlûda Kurmancî" ji 8 beytan pêk tê. Bi serenava "Wiladeta Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin)" hatiye binav kirin. Di vê beşêde Xelîlî li ser hemlebûyîna Amîne û mizgîniya pêxemberan sekiniye. Di vê beşê de Amîne weha dibêje: çiqas mehek ji hemlê min dihat, her mehekî nebiyek ji bo min mizgînî dihat. Meha yekî, ya Recebê, Adem pêxember ya dido Şîs ya sise Îdrîs nebî ya çarê Nebî Nuh ya pêncê Hûd ya şeşe Îbrahîm ya heftê Isma'îl ya heştê Nebî Musa û ya nihê Îsa mizgînî ji bo Hz. Muhemmed didan.

Bateyî di muhtevaya Mewlûdu'n-Nebî de mizgîniya pêxemberan di beşa dehande dehande behs kiriye. Lê Bateyî di beşa dehande tenê behsa şeş pêxemberan kiriye. Li dijî vê Xelîlî bi tevahî navê neh pêxeberan ragihandiye.

### 3.6.13. (Bateyî 283-315, Xelîlî 77-84)

Beşa sêzdehem a Mewlûdu'n-Nebî ji 33 beytan pêk tê. Ev beş bi serenava "Der Medhî Hebîbî Îlahî Seyyıdîna Muhemmed Kî Sahîbî 'Izz Û Cahî" hatiye binavkirin. Ev beş beşa merhebayê ye. Di vê beşêde, piştî beşa wiladetê û merhebayê, bûyerên deresayî ku pêk hatin hatine tesfîrkirin. Piştî ku Hz. Muhemmed çê dibe hemû mexlûqat pêşwaziya wî dikin. Meriv karê bêje beşa herî girîng a Mewlûdê ye. Lewra wexta ku Mewlûd li cehekî tê xwendin di vê beşê de hemû guhdê radibin ser xwe û bi hevre merhebayê didin.

Di beytên 299 û 319 yê beşa sêzdehem de piştî welidîna Hz. Muhemmed bûyerên deresayî ku pêk hatin tên gotin. Di van beytan de tê gotin: çawa ku Hz. Muhemmed welidî diçe secdê û destê xwe bal asîmanan ve vedike. Paşê ewrekî sipî tê û wî dibe û bi awayekî pêçayî wî dîsa tîne. Amîne dibêje ku min degek kir: 'wî li dinyayê bigerînin li erd û behran bigerînin'. Mizgîniya bûyîna wî digehînin pêxemberê din. Mala ku lê bûyî bi çûkên reng bi reng tijî dibe û ew ji aliyê kesên ku wekî tavê ti çîrisin ve tê şuştin û dîsa tê pêçandin div an bêyatan de hatiye gotin. Li gorî ku Bateyî di beyta 309an de dibêje bûyerên deresyî ku pêk hatin bêhesb in.

Beşa merhebayê di Mewlûda "Durra Birincî Mewlûda Kurmancî" de di beşa pazdehem de hatiye vegotin. Lê ev beş wekî ya Bateyî ne bi gotina "merhebayê" bi bi gotina "Xweş bi xêr hat" hatiye vegotin.

Beşa sêzdehem a "Durra Birincî Mewlûda Kurmancî" ji heşt beytan pêk tê. Bi serenava "Wiladeta Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin)" hatiye binavkirin. Xîlîlî di vê beşêde; çaxê ku Amîne di hemlebûna xwede bûyerên ku dîtin tesfîr kirine, sekiniye.

Li gorî ku Amîne gotiye: min di hemla xaw de gelek nişane didîtin; min didît meşriq û mexrib ronahî dibûn, qesra Busrayê ji Şamê xuya dibû li ber çavê min.

Di beytên 80-84an de li ser welidîna Hz. Muhemmed Amîne weha dibêje: kes li mala min nebû. Melekan Beytul Heram ava dikirin. Dema ku ez welidim beyreqên kesk ji asîmanan nazil dibûn. Yek ji van beyreqan li ser Betul Heramê min didît, yek

jê jî min li şerqê didît. Ref bi ref melek ji jor dihatin xwar, li çar kenaran şu'leya nûrê digirtin.

Muhtevaya ku Xelîlî di beşa sêzdehem de vegotiye, Bateyî di Mewlûda xwe de di beşa yazdehem de behs kiriye. Her weha Bateyî di beşa yazdehemde bi awayekî berferh li ser vê muhtevayê sekiniye û ji me re neqil kiriye.

### 3.6.14. (Bateyî 316-336, Xelîlî 85-92)

Beşa çardehem a Mewlûdu'n-Nebî ji 21 beytan pêk tê. Ev beş bi serenava "Amadenî Der An Waqtî 'Ebdulmuttalıb Ez Ka'be" hatiye binavkirin. Ev beş berdewama bûyerên şeva rojbûna Hz. Muhemmed e. Ev beş derheqê bûyerên, wexta ku 'Ebdullmutip li Ka'beyê û mizgîniya bûyîna Pêxember jê re tê ku di wê kêliyê de; Ka'be di çe secdê, put berejêr dibin, melek Ka'bê bi ava gula û mikê dişon, navê pêxembêr Muhemmed lê dikin, secdekirina Sefa û Merve, hetanî sê rojan ku melek Hz. Muhemmed tewaf dikin 'Ebdulmutelip wî nabîne. Hatiye nivîsandin.

Beşa çardehem a "Durra Birincî Mewlûda Kurmancî" ji 8 beytan pêk tê. Bi serenava "Wiladeta Nebî (Selat û Selamê Xudê li Ser Bin)" hatiye binavkirin. Xelîlî navê beşa diwazdehem sêzdeme û çardehem bi heman serenavê binav kiriye.

Ev beş berdewama beşa sêzdehem û çardehem e. Wekî beşê sêzdem û çardehem ev beş jî li ser bûyerên gava ku Hz. Muhemmed di welide hatiye nivîsandin. Di vê beşê de Amîne dibêje: şeva ku Muhemmed wê çêbibe oda ku ez tê de şewq û ronahî da û çar jinên horî sifet (Meryem, Hawwa, Sara û Asiya) dihatin dora min. Gava ku ez tî bûm ji nişkave li ser destan îskanek didan min ku ev îskan tijî avagula, 'enber û şekir bû. Gava min vexwar dil û hinavê min hînk bûn. Her weha Amîne dîroka rojbûna Muhemmed weha rdigihîne: pênç sed û heft û yekê mîladî di bîst û diduyê meha Nîsanê de gava ku gul ji bişkojan dibişkiftin ji daran, teyrekî çeng sipî baskên xwe ser min re birin. Wê gavê çêbû Ehmedê min şekir.

### 3.6.15. (Bateyî 337-420, Xelîlî 93-100)

Beşa pazdehem a Mewlûdu'n-Nebî ji 84 beytan pêk tê. Ev beş bi serenava Amedenî Halîme Û Bordenî Muhemmed (Sellallahu 'Eleyhî We Sellem) hatiye binavkirin. Di vê beşêde Bateyî li ser makbûyîna Hz. Helîme ji bo Hz. Muhemmd sekiniye. Şîre makî ji bo ehlê Mekkehê wekî kevneşopiyekî hatiye kirin. Ji bo vî karî qebîleya Sa'diyan her dem dihatin Mekkehê. Di serê vê beşêde hatiye vegotin ku wê

salê li nav qebîleya Sa’diyan xelayek hebûye. Di berdewama vê yekê de Hz. Helîma weha dibêje. Rojekê ez û çend hevalê xwe em bi hev re çûne newalekî û li wir, me gîha xwar û av vexwar ji nişka ve dengek ji xeybê hate guhê me: “ha niha biçne Mekkehê ey cumle jin da ku mubarekbin ji Mewlûda mezin”. Gava ku tirs li me zêde bû ev vegeriyan malê. Paşê min ev bûyer ji zilamê xwe re got û min gote ku ev rojbûn ji bo me wê bereketê bîne. Berdewama wê de Helîme dibêje: min di xewnê de dît ku yekî ez avetim çemekî wekî şîr sipî û ji min re sê çar caran got ji wê ji wê avê vexe. Gava min ew av vexwar singê min tijî şîr bûn. Xewna xwe ji bo ku ez ji kesekî re ne bejim ez hatim tembîh kirin. Piştî van bûyera Helîme bi malbata xwe ve ber bi Mekkehê ve derdikevin rê. Çaxê ku di rê dene siwara wan li gorî karwanê hêdî dimeşe û ew jî ji karwana xwe dûr dikevin. Paşê yekî bejin dirêj û ru bi nûr tê, ji Helîma re dibêje: “Ey Helîma, lez bike! Mizgîniya Muhemmed tê hilde” li ser vê yekê siwareya wan ji nişka ve lez dike û digihin karwana xwe. Her weha degekî ku ji ‘Ebdulmutalib re tê ku ji bilî Helîma ew Muhemmed nedin ti kesên din, Hz. Muhemmed bila tenê ji jinga rastê ya Helîma şîr vexwe, xemgîniya Amîne ji dûrketina Hz. Muhemmed, di vegera ji bo Mekkehê de, merkkeba ku Hz. Muhemmed hilgirtiye sê caran berê xwe dide Medîne ye û diçe secde, siwarên ku berê di heman merkebêde hêdî diçûn û dihatin vê carê gelekî bilez û sivik dimeşîn divê beşêde hatine vegotin

Di vê beşê de dîsa, çaxê ku karwan ji Mekkehê vedigere hin bûyrên din Helîma weha neqil dike: min dît ku çil rahib li dera yekî cubbe reş kom bûne û jiwan rahiban re digot: pêxemberekî nû hatiye, ‘elametên wî jî pêk hatine. Berdewama wê de Helîme dibêje: me ew derbaskirin min dît ku şu’leya Muhemmed bilin bû. Rahîb gava ku karwan di cem wan re derbas dibe fahm dikin ku Muhemmed di nav karwanêdeye û qest dikin ku wî bibînin û bikujin. Di wê navberê de ji asîmanan agirekî mîna birûskê tê û wan dişewitîne. Paşê dengekî aram tê û weha dibêje: “Uhlîke’l-kuffaru mîn nari'l-Cebbaf”[168]

Di muhtevaya Mewlûda Xelîlî de ev yek bi teferruat nehatiye vegeotin.

Beşa pazdehem a Mewlûda “Durra Birincî Mewlûda Kurmancî” ji heşt beyatan pêk tê. Bi serenava “Bixêrhatina Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin)” hatiye binavkirin. Ev beş beşa bi xêrhatinê ye.

[168]Kafir ji agirê Cebbar helak bûn

Ev beş di her du Mewlûdan de hatiye nivîsandin. Lê di ve xalêde, ji bo ku muhtevaya merhebaya her du Mewlûdan baş were fahmkirin, em ê li jêr her du merhebayan bidin ber hevdu.

Weku ku li jêr tê dîtin jî di beşa bixêrhatin an jî merhebaya her du Mewlûdan de ti wekhevî tineye. Bateyî di beşa merhabayêde bi piranî peyva “merheba” bikar

aniye. Xelîlî jî bi piranî forma “xweş bi xêr hat” bi kar aniye. Bateyî beşa merhebayê di Mewlûda xwe de di bin serenava “Der Medhî Hebîbî Îlahî Seyyîdîna Muhemmed Kî Sahîbî ‘Izz Û Cahî” de nivîsiye. Xelîlî beşa xêrhatinê, Bateyî wekî merheba gotiye, di bin serenava “Bixêrhatina Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin)” de nivîsiye

**Durra Birincî Mewlûda Kurmancî**

Xweş bi xêr hat xweş bi xêr hat xweş bi xêr
Xweş bi xêr hat wî tijî kir xêr û bêr

Xweş bi xêr hat lew sitêr bûne bizot
Xweş bi xêr hat canê şeytanan disot

Xweş bi xêr hat dîn û mezheb red kirin
Xweş bi xêr hat ins û cin es'ed kirin

Xweş bi xêr hat agir û esnam û lat
Xweş bi xêr hat kirne bê sebr û tebat

Xweş bi xêr hat rehmeten lil- 'alemîn
Xweş bi xêr hat xwendî Qur'ana mubîn

Xweş bi xêr hat wextê ku nû bû ji da
Xweş bi xêr hat dest bi jor ve hildida

Xweş bi xêr hat kir du'a bo ummetê
Xweş bi xêr hat da nebînê zehmetê

Xweş bi xêr hat ya Xuda her mu'minîn
Xweş bi xêr hat 'ef ke bo Şahê emî

**Mewlûdu'n-Nebî**
Cumle zerratê cihan da ev seda
Kine gazi pek ve gotin: "Merheba

Merheba ey 'alî sultan merheba
Merheba ey kane 'irfan merheba

Merheba merheba ey canê baqî
Merheba merheba 'uşşaqê saqî

Merheba merheba dermanê derdan
Merheba merheba ey sirra Furqan

Merheba merheba ey zate merğûb
Merheba merheba ey xasê mehbûb

Merheba ey qurretu'l-'eynê Xelîl
Merheba ey xasê mehbûbê Celîl

Merheba ji bo cumle yarê meqsudê tu
Merheba ji bo xaliqê mahbûbê tu

Merheba ey mah [û] xurşîdê Xuda
Merheba ey ku ji Heq nabit cuda

Merheba ey rehmeten lî'l-'alemîn
Merheba tu yî şefî'u'I-muznîbîn

Ey ji bo derdê dilan dermanî tu
Ey ji bo mexlûqan hemî sultanî tu

Merheba ey iftiharê enbiya
Merheba ey semi' cem'ê ewliya

Merheba hate şefî'ê îns û can
Merheba hate letîfê îns û can

Merheba ey nûra çeşma ummete
Merheba ey suni' şahe qudrete

Merheba hate şivanê ummetê
Merheba hat bo me nûra dewletê

Merheba ey sahibê ceyş û hasem
Merheba ey kasirê Lat û sane

### 3.6.16. Beşa 16 (Bateyî 421-489, Xelîlî 101-180)

Beşa şazdehem a Mewlûdu'n-Nebî ji 69 neh beytan pêk tê. Bi serenava "Waqi'at Kî Der Meyan Qabîleyî Benî Sa'diyan Bûden" hatiye binavkirin. Bateyî di vê beşê de li ser mu'cîzeyên di zarokatiya Hz. Muhemmed, demên ku ji Mekkehê diçe û careke din vedigere Mekkehê û Demên wî yê ku li nav qebîleya Sa'diyan derbas dike vegotiye.

Dema ku Hz. Muhemmed diçe nav qabîleya Sa'diyan bereket dikeve nava wan. Dexl û dan û ga û pezê wan zêde dibe. Helîma dibêje: "Wellahî'l-'ezîm ev nazidar"[169] lewra ew her dem pak û tahir û temîz e. Gava ku dar û nebat ew didîtin silav diddanê. Ajalên kovî li cem gûhlê dibûn. Mêşineke kup î şikestî dest didayê şîfa didît. Her weha mû'cîzeya qelişandina singa Hz. Muhemmd û şuştina dile wî di vê beşê de hatiye vegotin. Li ser mu'cîzeyê, qebîleya Sa'diyan pêşniyaz dikin ku Helîma Hz. Muhammed bibe cem serokkahîn. Helîma gava ku ji serokkahîn re vê bûyrê vedibêje, serokkahîn têdigehêje ku dînê Hubel wê batil bibe dixwaze ku Hz. Muhemmed bikuje lê ji asîmanan yekî cil reş tê û serokkahîn bi tîrekê dikuje. Bi vî awayî qewîma serkkahîn bi helakê diçe. Dîsa wexta ku ji cem serokkahînekî din vedigerin Hz. Muhemmed dibine ku zaroka jinekî ketiye çalekîde, Hz. Muhemmed gava ku çalê nîşan dide ava di çalê de zêde dibe û bi vî awayî zarokê xelas dikin. Her weha di beytên dawî yê vê beşê de Helîma amadekariya vegerandina Hz. Muhemmed ji bo Mekkehê dike. Gava ku tên Mekkehê lê dinêrin dengek ji xeybê tê û dibêje: "Ya Mekkete

Ê ji te hate belê wê hate te" yanî "Ey Mekkê! Yê ku ji te hatî dîsa vegeriya te" Muhtevayeke weke vê di Mewlûda Xelîlî de nehatiye vegotin.

Beşa şazdehem a "Durra Birincî Mewlûda Kurmancî" ji heşt bêytan pêk tê. Ev beş bi serenava "Dawiya Mewlûdu'n-Nebî (Selat Û Selamê Xudê Li Ser Bin)" hatiye binavkirin. Wekî ku ji serenava vê beşê jî diyar dibe muhtevaya Mewlûdê bi dawî dibe. Beşa xatîmê ye. Di vê beşê de Xelîlî bi zimanekî opsîyonî dawiyê li Mewlûda xwe tîne. Weke ku ji beyta jêr jî diyar dibe Mela Sîraceddînê Xelîlî wekî mexlas "Sîrac" bi kar aniye.

Bo Sîrac û hazir û her saliha Ku temam bû hun bixwênin Fatiha

[169] Hat û min cil ne şûştin qet tu caran

### 3.6.17. Beşa 17 (Bateyî 490-538 Xelîlî…)

Beşa hîvdehem a Mewlûdu'n-Nebî ji 49 beytan pêk tê. Ev beş bi serenava "Baz Awerdenî Halîme Muhemmed Sellallahueyhî We Sellem Bi Mekkeyî Şerîfe" hatiye binavkirin. Berdewama muhtevaya beşa şazdehm e. Ev beş li ser bûyerên gava ku Helîma Hz. Muhemmed tîne Mekkehê hatiye nivîsandin.

Gava ku Helîma Hz. Muhemmed tîne Mekkehê, ji xeybê dengek tê û dibêje: Ey Mekkê! Ey Beytul Heram! Hate bo te bejn û baleyê 'ezîz. Hate cananê du 'alema… Helîma gava kul i rast û çepê xwe dine re û kesekî nabîne di nava texeyyurekî de dît. Gava ku hinekî dûr dikeve, ji bo dengê ku ji xeybê hatî, vedigere ku Hz. Muhemmed ne li cihê xwe ye ax û wax dike. Zilamekî pîr, ji bo ku Helîma Hz. Muhemmed bîbîne dibe cem Uzza(put) diçe secdê û cihê Hz. Muhammed dipirse. Gava ku Uzza navê Hz. Muhemmed dibihîze ew bi xwe diçe secdê. Uzza tê ziman û wî zilamê pîr bê 'erz dike û dibêje: gava ku Hz. Muhemmed hate vir em ezil bûn. Em sernixûn û şermezar in ji wî. Li ser vê yekê zilamê pîr asayê destê xwe diavêje û di lerize. Di vê navberê de kalikê Hz. Muhemmed 'Ebdullmutalib jî dibihîze ku ew winda bûye digirî û diçe Ka'beyê û di'a dike ji bo xwedê ji bo ku wî bibine. Di wê kêliyê de 'Ebdullmutelib dengekî dibihîze, ev deng jê re dibêje: zûke here Tuhameyê şerîf. Tê wî li bin dara Yemamê bibîne. Hz. Muhemmed diçe devera ku bihîstî û li wir Hz. Muhemmed dibine.

Di Mewlûda Xelîlî de beşeke weha nehetiye nivîsandin.

Beşa hivdehem a Mewlûda "Durra Birinci Mewlûda Kurmancî" ji du'ayê pêk hatiye. Xelîlî di vê beşê de weha du'a dike:

El –Hemdu lillahî Rebbîl-alemîn. Wes-selatu wes-selamu 'ela seyyidina Muhemmedin xatimel-enbiyai wel-murselîn. We 'ela alihî we sehbihî ecme'în.

Ellahumme ya Rebbî tu bi heqqê zat û sifatê xwe kî, tu bi hurmeta Muhemmedinîl- Mustefa hebîbê xwe kî, tu xezeba xwe ji me dûr bikî, rehma xwe li me bikî, me ji 'ezabê qebrê û fitna saxbûnê û mirinê û ji 'ezabê cehnemê êmin bikî. Li vê dunyayê xweşkatiyê û başiyê bidî me. Tu hifza me ji şerê cin û ins û şeytanan bikî. Li ber mirinê îmana me qaîm bikî. Di heşrê de me fihêtkar nekî. Li ber mirinê me deyndar nekî. Di ser pirê ve me derbas bikî. Derê cehnemê li ber me bigirî. Ê cennetê li ber me vekî. Di cennet-ul firdewsê de, di cîrantiya Muhemmed Mustefa de sellellah û 'eleyhî we-sellem cihê me çê bikî. Bi dîtina nûr û cemala wechê xwe çavê me rohnî

bikî. Dilê me geş û şa bikî. Ji me û dê û bavê me, kiflet û ehl û dost û cîranê me û çiqa kesê ehlê îmanê û ji vê meclisê re, û xudyê xêran temaman re; El-Fatihete Me'ehes-Selewat.

### 3.6.18. Beşa 18 (Bateyî 539-563, Xelîlî…)

Beşa hîjdehem a Mewlûdu'n-Nebî ji 25 beytan pêk hatiye. Bateyî ev beş bi serenava "Haza Menacatî Mewlana Muhemmed Batê Rahîmallahu Te'ala We Hem Xitmî Kitabî Mewlûd" binav kiriye. Wekî ku ji serenava wê jî diyar dibe, ev beş beşa xatîmê ye.

Ev beş bi pesindayîna Hz. Muhemmed dest pê dike. Bateyî di vê beşê de pesindayîn û xweşkatiya Hz. Muhemmed weha vedibêje: Eeger ku sêsed hezar devê min hebe û ez şev û roj bi qasî dema sed qiyametî vebêjim jî dîsa têra vegotina xweşkatya Hz. Muhemmed nake. Di pey van beyta re Bateyî ji Hz. Muhemmed şefa'etê û ji Xudê jî 'efuyê dixwaze. Pişt re Bateyî ji bo wan kesê ku guhdariya Mewlûdê dikin du'a dike. Herî dawî jî ji bo Pêxember 'Ela Eshabûl Enbîya-ûl Murselîn, Evliya, mumînan, Haciyan, Xazî û ew kesê ku xwarina Mewlûdê çêkirî û ew kesên ku li wê meclîsê hazir bûyîn, îmamê çar mezheban re, ketibê nusxeyê re, cumle salihan re û herî dawî ji xwe re daxwaza El Fatîha dike û dawiyê li Mewlûdu'n-Nebî tîne.

Bateyî di beyta dawî ya vê beşê de mexlesa xwe weha bikar tîne:

Bo cemî'ê Muslimînê salihe

Bo feqîrê BATEYÎ el-fatihe

Beşa hîjdehem a Mewlûda Xelîlî tineye. Lê weke muhtewa beşa xatîmeyê di melûda xwe de di beşa şazdehem de nivîsî ye. Her weha beşeke din jî a Mewlûda Xelîlî ku ji aliyê muhtewayê ve dişibe ya Bateyî heye. Lê ev beş ne bi awayekî menzum hatiye nivîsandin. Ev beş bi awayekî mensur hatiye nivîsandi. Di muhtewa ya beşe hîdehem de me cih daye vê beşê.

# ENCAM

Di vê xebatê de em li ser Mewlûda “Durra Birincî Mewlûda Kurmancî” a Mela Sîraceddînê Xelîlî sekinin û me ew bi “Mewlûdu-n Nebî” a Mela Huseynê Batayî re berawird kir. Li jêrê encamên giştî yên xebatê di çarçoveya wekhevî û newekheviyên her du mewlûdan de xal bi xal hatiye pêşkêşkirin.

1. Ji aliyê ziman ve Mela Sîraceddînê Xelîlî di Mewlûda xwe de zimanekî pir hêsan bi kar aniye. Ji xeynî bêjeyên ‘Erebî yên dînî, bêje û hevokên bi zimanê ‘Erebî li gorî Mela Bateyî pir kêm in. Bateyî di Mewlûda xwe de gelek hevokên ‘Erebî û Farisî bi kar anîne û di bin têsîra van her du zimanan de gelekî maye. Ji aliyê ziman ve bêhtir bandora ‘Erebî li ser Mewlûda Bateyî heye. Çiqasî peyvên Farisî bi kar anîbe jî, ew ne bi qasî bandora ‘Erebî ye. Lewra terkîb, hevok û peyvên ‘Erebî di Mewlûda xwe de pir bi kar anîne. Ji bilî çend peyvên Tirkî bandora Tirkî tineye. Li gorî serdemên xwe her du nivîskaran jî zimanekî serkeftî bi kar anîne. Lê bi tevahî ku werin nirxandin Mewlûda Bateyî di warê xwe de şaheserek e.

2. Pirtûka Qurana Pîroz; di seranserê dîrokê de bûye çavkaniya zanîn û zanyariyê. Mele Huseynê Bateyî jî di naveroka Mewlûda xwe de ev yek wekî çavkaniya sereke bi kar anîye. Di Mewlûda Xelîlî de, ji bilî di’a ya Mewlûdê ku ew jî bi giştî ne tê de, ji Qur’ana Pîroz kêm sûd wergirtiye.

3. Xelîlî di pêşgotina Mewlûda xwe de nasname û nivîsîna dîroka mewlûda xwe bi awayekî eşkere nivîsîye. Lê Bateyî ev yek di mewlûda xwe de ne kiriye. Ev yek jî nirxê Mewlûda Xelîlî zêde dike.

4. Di metnê Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî ku me li ber çava girtî de ji xeynî beytên neqeratê ji 174 beytan pêk hatiye. Li hember vê yekê, Mewlûda Mela Huseynê Bateyî manzumeke dirêj e. Ji xeynî beytên neqerat ji 563 beytan pêk tê.

5. Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî ji 17 beşan pêk tê. Mewlûda Mela Huseynê Bateyî ji 18 beşan pêk tê.

6. Her du berhem jî bi şiklê mesnewiyê hatine nivîsandin.

7. Her du berhem jî bi wezna “Fa’ilatun Fa’ilatun fa’ilun” hatine nivîsandin.

8. Di her du Mewlûdan de jî wesil, îmalê û zîhaf pir hatine bikaranîn. Di hin cihan de ji bo zaruretiya weznê kîte dirêj kin hatine xwendin. Bi taybetî jî di Mewlûdu'n-Nebî de ji ber zaruretiya weznê bêjeyên ku ketina denga di wan de çêbûyîn pir hene.

9. Di her du Mewlûdan de jî qafiyeya dewlemend û tam pir hatiye bikaranîn.

10. Di her du Mewlûdan de jî dengdêrên "a, e, ê, û, i, î" û dengdarên "b, w, j, x, d" pir hatine bikaranîn.

11. Di Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî de ji bo navên Xudê "Xuda" di ya Mela Huseynê Bateyî de "Allah û Xuda" hatine bikaranîn. Ji bo navê pêxember jî "Muhemmed, Mustefa û Ehmed" hatine bikaranîn.

12. Di Mewlûda Bateyî de terkîbên 'Erebî, bêje, hedîs û ayetên Qur'anê pir hatine bikaranîn. Her weha di serenavên beşê Mewlûdê de bêjeyên farisî pir hatine bikaranîn. Li dijî vê yekê, di Mewlûda Mela Sîraccedînê Xelîlî de ji xeynî bêjeyên olî bêjeyên 'Erebî heme bêje qed tinene.

13. Mela Sîraceddîn di ragihandina mijaran de uslûbeke teng bi kar aniye. Her weha heta dawiya Mewlûda xwe xîtabên wekî "ya, ey" bi kar anîne. Li dijî vê Melayê Bateyî di ragihandina mijarên Mewlûda xwe de uslûbeke fireh, hevokên kin û xwedî wateyên berfereh bi kar anîne. Zimanekî giran û edebî bi kar aniye. Bateyî jî wekî Mela Sîraceddîn hîtabên "ey, ya" pir bi kar anîne.

14. Mela Siraceddînê Xelîlî di Mewlûda xwe de ji hunerên edebî; teşbih, îstîare, nîda, telmih, tenasûp û tekrîr herî zêde bikar anîne. Li ber vê yekê kêm jî be; asonas, aliterasyon, istifham û tezat jî bikar anîne. Li dijî vê yekê Mewlûda Melayê Bateyî ji aliyê hunerên edbî ve pir dewlemend e. Heme bêje, ji her hunerê mirov kare mînakan bibîne. Bateyî herî zêde; teşbih, telmîh, nîda, tekrîr, tenasûp, nîda û întaq biakaranîne.

15. Bi gelemperî ji aliyê ruxsarî ve cudahî û wekheviyên her du Mewlûdan hene. Lê hêjayî gotinê ye ku; cudahiya herî ku ber çavan dikeve şêwaza vegotinê û hîsiyat e. Weke her niviskarê Mewlûdên kurdî, Mela Sîraceddînê Xelîlî jî di bin lîrizima Mela Huseynê Bateyî de maye.

16. Mela Sîraceddîn bi şêwaz, vegotina û bikaranîna zimanê xwe xwendevanê xwe aciz nake. Zimanekî herikbar û gelekî hêsan bikar aniye. Bi vî awayî

kevneşopiyeke zimanê serdema xwe li pey xwe hiştiye. Li dijî vê yekê Melayê Bateyî bi şêwaz, vegotin û bikaranîna zimanê xwe giraniyekî dide ser xwendevanên xwe. Li gorî Mewlûda Mela Sîraceddîn zimanê Mewlûda wî pir giran e.

17. Her du berhem jî dewsa kevneşopiyeke serdema xwe, bikaranîna redîf û qafiyeyan û bikaranîna qalibê erûzê estetîkekê tînin ber çavan.

18. Bateyî di mewlûda xwe de ji bo her beşekî, li gorî naveroka beşan, serenavek bikar aniye lê Xelîlî ev yek ji bilî beşa di'ayê ne kiriye.

19. Ji aliyê naverokê ve taybetmendiya herî girîng a Mewûda Xelîlî ew e ku bi temamî li ser tebî'etê Hz. Muhemmed e. Lêbelê Bateyî di Mewlûda xwe de bi tevahî li ser jiyana pêxember sekiniye û Qur'ana Pîroz weke çavkaniyekî bi kar aniye. Herweha Bateyî di naveroka Mewlûda xwe de li ser mu'cîzeyên Hz. Muhemmed û fezîletên xwendina Mewlûdê jî gelekî sekiniye.

20. Bateyî di mewlûda xwe de li ser jiyana Pexember ya zarokatiyê tevî sekiniye û ev qonaxa jiyana wî bi awayekî hurgilî daye. Li dijî Bateyî, Xelîlî di Mewlûda xwe de li ser pesin, şikl, tebî'et, xasiyet, mu'cîzat, silsile û welidandina Pêxember sekiniye. Ev yek jî dide nîşandan ku Xelîlî ne bi awayekî hurgilî li ser jiyana pêxember sekiniye. Bateyî naveroka Mewlûda xwe li gorî kironolojiyekî çêkiri nivîsiye. Jiyana pêxember li pey hev daye. Lê Xelîlî ev yek berçav ne girtiye û mijar tevlîhev dane. Di beşa çarem a Mewlûda xwe de li ser şiklê nebî û paşê bi dorê li ser tebî'et, xesiyet, mu'cîzet, şiyandin, xêra selewatan, silsile û di beşê 13, 14 û 15an de li ser wiladeta pêxember sekiniye. Li gor vê di mewlûda Xelîlî de mijarên şemail û hilyeya Pêxember zêdetir cih digirin.

# ÇAVKANÎ


ADAK, Abdurrahman, *Destnivîsên Mewlûda Melayê Bateyî di Arşîva A. Jaba de: Nasandin û Analîz* 2/2, Mardin 2017.

ADAK, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk,* Nûbihar, İstanbul 2014.

ADAK, Abdurrahman, *Li Cizîrê Muhîteke Edebî: Dergahê Şêx Seyda û Rola Wî di Edebîyata Kurdî de*, Zaningeha Mardin Artukluyê, İstanbul 2012.

ADAK, Abdurrahman. *Teşeyên Nezmê-Di Edebiyata Kurdî Ya Klasîk De*, Çapa Yekem, Nûbihar, İstanbul 2019.

ADAK, Abdurrahman, *"Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de"* Nûbihar,

Stenbol 2018.

AKDAĞ, Soner, "*Süleyman Çelebinin Mevlidi Üzerine*", A.Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, Erzurum 2008.

AKSOY, Hasan, Mevlid, DiA, Ankara 2004.

KIRKAN, Ahmet, "*Mewlidê Osman Efendi û Mewlido Zazakî*, Kovara Nûpelda Wan 2011.

KURŞUN, Mela Silêman, Mewlîda Pêxember, Beroj, Îstanbul 2010.

ATAÇ, M. Sıddik, *Kitaba Durra Birincî Mewlûda Kurmancî*. Renk Ofset, Nusaybin 2001.

CÎHANÎ, Perwîz, *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Çapa Yekem, Nûbihar, İstanbul 2010.

ÇAĞMAR, M. Edip, *Edebi Açıdan Arapça Mevlidler,* İlahiyat Yayınları, Ankara 2004.

DEVELLİOĞLU, Ferit, *Osmanlıca Türkçe Ansiklopedik Sözlük*, Aydın Kitapevi Yayınları, Ankara 2008.

DİLÇİN, Cem, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2009.

ERTEKİN, M. Zahir, *Mela 'Elîyê Baqustanî û Mewlûda Wî / Mullah Ali Baqustanî and his Mawlid Mukaddime,* 6/1, Mardin 2015.

ERTEKİN, M. Zahir, Seyîd Feyzullahê Findikî û Herdu Mewlûdên Wî yên Kurdî, *Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu Bildirileri*, y.y., İstanbul 2012.

ERTEKİN, M. Zahir, “*Yekem Mewlûda Kurdî û Bandora Wê ya Li Mewlûdên Dû Xwe”* Beytüşşebap Ve Molla Hüseyin Bateyî Sempozyum Bildirileri, Şırnak 2012.

FAİK, Reşad - Ali, Nazima, *Mükemmel Osmanlı Lügatı*, Türk Dil Kurumu Yayaınları, İstanbul 2009.

FINDIKÎ, Seyîd Feyzullahê, *Mewlîda Şerîf Hate Safa Di Mewlîda Mustafa*, Halk matbaacılık, Cizre 2004.

GÜMÜŞ, Nezîr, *Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî (Gulcivîn) -Metn Û Lêkolîn-*, Teza Lîsansa Bilind, Mardin Artuklu Üniversitesi, Mêrdîn 2019.

ÎLHAN, Zîwer, *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metnê Rexneyî û Lêkolîn)*. 1. Bs. Avesta, Stembol 2016.

KANSIZOĞLU, Hasan Basri, *Konuşma Dili ve Yazı Dili Etkileşimi,* Bartın Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi 1/1, Bartın 2012.

KARACAN, Aykut, Hasan, Nuretttin, *Mele Hüseynê Bateyî'nin Mewlid-i Nebî Adlı Eseri İle Mele Süleyman Kurşun'un Mewlida Pêxember Adlı Eserinin Karşılaştırılması.* Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi 1/2, Bingöl 2015.

KIZIL, Hayreddin. *Sê Mewlûdnameyên Nuh Ên Bi Kurdiya Kurmancî*. e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi 10/3, Diyarbakır 2018.

KIZIL, Hayreddin - Şınğar, Cemal - Çetin, Ramazan, *Ceribandinek Li Ser Senifandina Mewlûdên Kurdiya Kurmancî Li Gorî Mijarên Wan*, International Journal of Kurdish Studies 1/1, Mardin 2016.

KIZIL, Hayreddin, “*Diyarbakır Ve Çevresinde Yazılmış Mevlitlerin Konularına Göre Tasnifi Denemesi, e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, Diyarbakır 2012

XELÎLÎ, Mela Sîraceddînê, *Kîtaba Gulcivîn*. 1999.

ÖNAL, Mehmet. *Edebî Dil ve Üslup, A.Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi* 36, Erzurum 2008.

ÖZEL, Ahmet, *Mevlid,* Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi, Türkiye Diyanet VakfıYayınları, Ankara 2007.

ÖZKAN, Mustafa, *Edebiyatta Dil Kullanımı,* Türk Dili ve Edebiyatı Dergisi L/2, İstanbul 2017.

PALA, İskender, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, İstanbul 2018.

RIYAHÎ, Zehra, *Berresiyê Saxtarê Dîbaçêyê Mesnevîh ta Qernê Heftomê Hêcrî*, Kovara Lêkolînên Edebî, y.y. 1977.

SADINÎ, M. Xalid, *Mela Huseynê Bateyî*, Çapa duyem, Nûbibar, İstanbul 2011.

SARAÇ, M. Ali Yekta, *Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, 3F, İstanbul 2007.

ŞEKER, Mehmet, *Mevlid*, Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, c29, Ankara 2004.

HEYDERÎ, Şex Muhemmed Emîn, *Mewlûda Nebî*, Lîs, Stenbol 2007.

TAŞER, Suat. *Konuşma Eğitimi*, Papirüs Yayınevi, İstanbul 2000.

TIRAŞCI, Mehmet, *Güneydoğu Ve Doğu Anadolu Çevresinde Arapça, Kürtçe, Zazaca Mevlidler Ve Müzikal Olarak İcra Ediliş Tarzları*, Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi 17/2, Sivas 2013.

TOK, Vedat Ali, *Edebi Sanatlar Ansiklopedisi*, Literatürk Academia, Konya 2011.

UYSAL, R. Selçuk, *Belagat ve Edebi Sanatlar Lügatı*, Doğu Kitapevi, İstanbul 2010.

YERGİN, Mehmet, “Mewlidê Mela Ehmedê Xasî “Mewlidu᾿N-Nebiyyi᾿L-Qureyşiyyî” (Metn-Wekenitiş), Unîversîteyê Artuklû yê Mardînî, Mardîn 2015.

XAK, Mela Şewqî, *Mewlûda Nebî*, amd. Şêxmûsê Talatî, Elele Birlik, Nusaybin 2003.

ZÊREVANÎ, Babê, *“Mela Hisênê Bateyî-1”,* Nûbihar 8/87, İstanbul 2002

**PÊVEK**

**Pêvek 1**: Wêneyê Mele Sîraceddînê Xelîlî



**Pêvek 2:** Wêneyê Mela Siraceddînê Xelîlî



**Pêvek 3:** Nusxeya Destxet a *Durra Birincî Mewlûda Kurmancî (wereqa pêşîn)*.


دُرّا بِرِنجی
مولودا کرمانجی

بسم الله الرحمن الرحیم

پشتی حمدی بی قیاس و بی عدد / بو خدای واحد و فرد و صمد
ای خدای پر لمه نعمت کری / احمدی هادی لمه خلعت کری
چیتر بو مه ژ روح و جان و مال / شافعی روژا گرانه ای هفال
و لخدا یو هر بیارین بی ژمار / مثلی باران و مژ و طافی بهار
رحمت و امنتیا ژ درد و کلا / سر محمد ملهما جان و دلا
هم لآل و هو گرو یاری اوی / هم لاتباع و رجا داری اوی
حق تعالی پر ببی راضی ژوان / چار یاری ربری زان و نزان

**Pêvek 4:** Nusxeya Destxet a *Durra Birincî Mewlûda Kurmancî (wereqa dawîn)*.




بسم الله الرحمن الرحيم
الحمد لله رب العالمين والصلاة والسلام على سيدنا


عقيدة الايمان
بسم الله الرحمن الرحيم

**Pêvek 5:** Nusxeyê çapbûyî yê *Durra Birincî Mewlûda Kurmancî* (bergê wê).


{ کتابا }

{در ابرنجی مولداکرمانجی}

بنظم و پقکهاندناسیدای ملامحمد سراج الدین
کری ملا عبدالحکیم ای خلیلی خدای مزن رحمتا خوه
لوان بکی
*** آمین ***

{ رجادکم ازرته یاخونده قان ** دعابکه زرب پردلوقان}
{عفوبکی دنبو گناهی سراج ** لوراتنینه نه دوانه علاج}
{لورا خدا عفودکی گناهان ** چقابکی بنده دسال وماهان}

***

{کرته بقی تاریخی بزانی ** غواصی ماهرز بحراثانی}
{چلیقاچاری گولانهی بو ** دگیر ایکیده موجاسسی بو}
{زبیلابکی بدستی سراجی ** درخستیه اق درابرنجی}

تاریخانقیساندنی / 1381/هجری/1960 میلادی

{بلاق کر .. محمد صدیق آتاج ای خلیلی}

**Pêvek 6:** Nusxeyê çapbûyî yê *Durra Birincî Mewlûda Kurmancî* (rûpelê yekem).


(١)

{ كتابا }

{ درّابرنجی مولدا کرمانجی }

{ بسم الله الرحمن الرّحيم }

***

پشتی حمدی بي قياسو بي عدد ** بو خدای واحدو فردو صمد

أو خدای پرله نعمت كري ** أحمدی هادی لمه خلعت كري

چيتره بومه ژروحوجانو مال ** شافعی روژا گرانه أی هقال

واخدايو هربارين بي ژمار ** مثلی بارا ن ومژوطاقی بهار

رحمة وأيمنتيا ژدردو كلا ** سر محمد ملهما جانو دلا

هم لآل وهو گرو ياری أوي ** هم لأتباع ورجاداری أوي

حق تعالی پربيي راظی ژوان ** چاری ياری ريبری زانو نزان

هم مه ژي راظی بكه يارب هوار ** خاتری محمدو هر چاری يار

***

{أی گلی گهداری مولودائی ** رحمتا حق هرلسر روحی وه بي}

{قط نكن قالادقی خوه ژصلوات ** داخدا وه بپارزينی ژشوات}

{ياألهي صدصلاة وصدسلام ** توبده هردم لفخری عامو تام}

***

**Pêvek 7:** Metnê destxet ê fotokopî yê mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî.



- بناڤێ -

دُرّا بِنْجی مـولدا کرم نَبی

بنظم پیاگێ شهامدنا محمد سراج الدین کوری ملا عبد الحکیم

خلیلی خدا رحمی لوان بکه آمین

رجا دکم از ژ ته یا خونده ڤانه دعا بکه ژ ربێ پر دلوڤانت

عفو بکی ذنب و گناهی سراج لوره توبنده له دوانه علاج

لوره خدا عفو دکی گوناهان چقا بکی بنده د سالو ماهان



بسم الله الرحمن الرحيم

پشتی حمدی بی قیاسو بی عدد
بو خدایی واحد و فرد و صمد
او خدایی پر له نعمت کری
احمدی هادی له خلعت کری
جیره ژ بو مه ژ روح جان و مال
شافعی روژا گرانه ای هفال
~~ای خدا تو هر بیارین بی ژمار~~ یا خدا تو بپارینی ژ طار
~~مثلی بارانو مژی بی حد هزار~~ مثل بارانو مژو طاقی بهار
رحمة و ایمنا بیا ژ دردو کلو
سر محمد ملهما جانو دلا
هم لا لو هوگرو یاری اوی
هم لا اتباع و رجاداری اوی

- حق -

- ٢ -

حق تعالی پر ببی راضی ژوان
چاری یاری ربیری زانو نزان
هم مه ژی راضی بکه یارب هوار
هم ژ مه راضی ببه یا رب هوار
خاطری احمد و گل هر چاری یار
ای گلی گلزاری مولودا نبی
رحمتا حق هر لسر روحی وه بی
تط نکن ئا لا دقی خوه ژ صلوات
~~دا خدا هروه بپاریزی ژ شوات~~
وه بپاریزینی ژ شواطر
یا الهی صد صلاتو صد سلام
تو بده هردم بفخری خاص و عام عامو تام
من دقی از بو را خذمت بکم
رشبلك کرما بچی از ~~تفسیل بکم~~
بجیا خو ختنیکم
مولدا پیغمبری اخر زمان
جیبکم دا زو بزانیتن نزان
لا ابتن پی بحی نزان

وختی خوندن کو لوی تا گهداری بن گرهیدن
یک بیک معنی اوی تو زانین
دابوی معدی تماما خوش ببی
محبتا احمد د دلدا گش ببی
بلکی هشیار بن ژ غفلت هن ژ مه
ژ ایین ری گرتنا وی لازمه
وقتی فرمانان سنتا پیرا بکن وی دابکن
مهدرا حشری بجه حاصل بکن
نکنه دل حبا اقی دنیا غدار
هروکی گوتی اوی شاهی کبار
محبتا دنیا سری حقا گناه
ای خو ژی دورکه اوه دوستی اله
ای گلی گهداری مولودا نبی
رحمتا حق هر بسر روحی وه بی

- تمت -

- ٤ -

قط نکن قالادقی خو ژ صلوات
دا خدا هر وه بپاریزی ژ شوات
یا الهی صد صلاتو صد سلام
تو بده هر دم لفخری خاص عام
وصفی احمد کی بشرح هر زمان
قط خلاص نا کی قلم ژ هرو زمان
دا رو بن گو تو قلم بن هم حبن
ژ بره حبین اقو رو بارو بحر
جمله لی جنو ملک انسانو عام
تو ببن کاتب حتی روژا قیام
قط نکارن وصفی وجهی وی بدن
~~نای حسابی او ژ شری ژی دهن~~ نورو تیریزکو هر د ژیدا بحن
حیسرة ژ حقا کسی الا غیری خدی
هم ژ بو وی حق خدی رحمی ددی

- ٦ -

قامو ژ ناوی نه کو بو نه دریژ
وجهی وی صورو سپی بو لی ~~ژ~~ نوو دریژ قوزی
هژدو چاڤین رش بلك خال لی هبون
برهو مژ کولان موین رش پر هبون
~~اهنیا یحنو دفن شبهی الیف~~ اینیا یحنو فره برهقل جلادك
دڤ وکی گوستیل ددان مرجان و ~~یش~~ ن پاك
وی گلیا رش ژ پیشانیڤ سر
هن لراستو هن چپ کو بو دو کر
او رها طاهر چه رش بو ین بمو
لی گرو ڤرتر گردنی درباس نبو
ناڤ ملی یحنو بمو جنگی دریژ
سنگ فره بو زك چتار استه ببیژ
بس ملو جنگی اوی مو لی هبون
سروره نوزده موی سپی تیده بون

چیکرن رب مزن هژده هزار
تا لمی ~~کمری دڤی~~ دنیا غدار
مثل اتی
توش ژ بونا خاطری پیغمبری
دایه وی بووان تماما سروری
صد هزار و بیست هزار و چار هزار
انبیا چیبون ژ نورا شهسوار
او تمام هیڤی دکن ژی مهدری
دا کو ایمن بن ژ ترسا محشری
ای گلی گهداری مولودا نبی
رحمتا حق هر لسر روحی وه بی
قط نکن ڤالا دڤی خوه ژ صلوات
دا خدا هروه بپاریزی ژ شوات
یا الهی صد صلاتو صد سلام
تو بده هردم لسری خاص عام

- تمامو -


نا ثده برن دومو ژمسکا ار فوی انوری
مثلي وان باشقه نجی بنیخبری

برنبو قورو قلو لق هساني بو
بتر نو بالا کو خدا هوستاني بو

اي گالي گهداري مولودا نبي
رحمتا حق هر لسر روحي ودبي

قط نکن ثالا دفي خوه ژ صلوات
داخدا دروه بيار بري ژ شوات

يا الهي صد صلاو ژ صد سلام
تو بده هر دفر لفري خاص عام

طبع واخلاق وي فهمن اي برا
نا لگين حد و حسابي دفترا

ژ زانو دل گرتو لسر تشتي دري
قط نکرداني اوي جارک اتني .

- لي لسر -

- ٨ -

لي لسر بي شرعيان حدث دکو
هنگي کي کاري لو جهي وي فکو

بر فهيتي وي هبو هي زيده تر
ژ وي لجا بو کا لپشت برده وستر

وي سلاما خوه دفدا ژ بريا هفال
مشروکي هر کا ندنا افا ز لال

جلد گل صولا خوه بينه لي ددا ن
دگل فقيران وي دخاري اقو نا ن

گر بري خوه بدا هفالا لاش همي
وي دقلبا ندي بوانزه دکسلمي

بر بشاشو، کم کو، مردي هبو
خصلتي نابا کوسک بک لي نبو

[illegible]
رحمتا حق هر لسر روحي ودبي

قط نكن ڤالا دڤ خوه ژ صلوات
داخدا هروه بيارڤي ژ شوات

يا الهى صد صلاو و صد سلام
تو بده هردم لفخري خاص عام

خاصتي وى روژ و شفت ولك هڤ ددى
هم ليستو ياش وكى هڤهوى ددى

سه لا رضى وى نبو چاڤين بلك
رادزان قلبى دكو ذكرى گلك

لنك دقومى نه دچو خارى ژ بن
لى دچو خارى دتحتاوك هسن

گر بروشتا لناڤ كومك زلام
هردومل زيده ژ ملى و اخاص عام

دستى خو گروى بدا دستى يكى
بهنا مشكى ژى دچاسى روژ كى
بكر

، پيــل ،



پين نكر شيطبسو باوشكى نبو
كورڤيو طيران ژبروى رڤ نبو

ميش نه دابنى لسر لا شو لجل
هاتى دنيا سنتى دوچاڤ بكل

عور تو دستاڤ لعزى ژوى ندين
بس تنى بو رحمة للعالمين :.

اى گلى گهداري مولو دا بنى
رحمتا حق هر لسر روحى وى بى

قط نكى ڤالا دڤ خوه ژ صلوات
داخدا هروه بيارڤي ژ شوات

يا الهى صد صلاو و صد سلام
تو بده هردم لفخري خاص عام

بيره دشتڤلين گلك هشكو بچان
بهن نبون دڤ هرژى بى زهروزمان

ولادعرحوژن دمصطفا ودد بو

کړه ذکر خارن د مصطفا ویده بون
سحر کړن اهلي جفاتي دېښبون
دارو بر سروي سلام دان بي ژمار
تو مي خرمي ژ فرقتي کر زاره زار
بولي گوشتي ژ خر کري گوتي ژ ود
ژ نخوه از ژ خر کرم ژ زنگا يهود
باد کر دارا بلز هاتن لجسم
کو قيانه سر دان سلام و پز کرم
بره د ستغلين دفه ضب و غزال
گي ژ خلقي ژ ادگوت زو هر نه بال
اق ژ ناق تلسان د هر کي کو دعاء
وي دکن بو هر نخوش دبتن شفاء
اق بسه قوان ژ بو ته حق شياند
ديني باطل ته بوي لق و بر گراند

- اى گلى -



اي گلي گهداري مولودا نبي
رحمتا حق هر لسر روحي وه بي
قط نكي قالادقي خوه ژ صلوات
دا خدا هر وه بياربري ژ شوات
يا إلهي صد صلاتو صد سلام
تو بده هر دم لفخري خاص عام
كو عمر بو بيستو پينج سال اي هفال
زوجي او بخديجا يا كو عنال.
وقتي چل سال وي لدنيا لي بوار
اولي قرآني إقرأ إهاته خوار
عمري بو پنجو سي هجرت كري
بال مديني فه لو بده ابوري
پشتي هشت سالان ژ هجرت فتحاند
مكها سيرين ژ دست مشرك دراند


يادهي هجرت كوجو حجتا مزن
نوبه حجا خارزاهم باركون
جمعه نو سر عرفاتي خطبه دا
دين بتبليغا وي اكمل كرن خدا
تاليا قرآن هنگي تريره هات
بيستو سي سالا تمام نواق خلات
اي تملي گهداري مولودا نبي
رحمتا حق هرلسر روجي وه لي
فقط نكن فالا دفي خوم زصلوات
داخدا هروه بيار بزى تر شوات
يا الهي صد صلوتو صد سلام
تو بده هردم لفخري خاص عام
اي برانو پر صلوتا لسر بدن
لو دعا بي وي قه مقبول نا بتن
- گوتي -
گوتي وي ذاتي حبيبي روح وجان
يك صلاوتي لسر ته بي شكو گمان
اي بدي حق سرددي ده رحمتا
ده بصد صد بهزاري نعمتا
اي هزاران سرمه دي زوترا گران
دي ازواو تنده جن باغي جنان
يك ملك سرروضيا من هرهيه
كي صلوتا لسرمه دي بي زا نيه
يا شي وي بنزي فلان لاوي فلان
اق صلاو تين ها لسر جاني ته دان
هنگي ازد خوش ديم بي ويده مي
مهدرا بن حق كري زوترا غمي
يا الهي من بكه من مهدري
مه بواره نوبه سر كوتري


- ١٥ -

ئەی گەلی گەهداری مولودا نبی
رحمتا حق هر لسر روحی وەبی

قط نکن ئەڤالادی خو ژ صلوات
دا خدا هر وە بپاریزی ژ شوات

یا اله صد صلاتو صد سلام
تو بدە هردم لفخری خاص عام

قدری مولودا نبی بگرن هڤال
دا حشر بن هون دگل اهلی کمال

گوه بدن سرخندنی غافل نبن
قالو قیلا هون نکن ذکری بکن

مهدرا احمد ژ بو خوە حق کری
ای ژ بونا مولدی خیرك کری

لی بخن ڤانوسو مندو لوکسا
عودو عنبر هون بشو طیبن وسا

- خانی -

- ١٦ -

خانی کولی بخونن مولدی
حق خدا چاڤی خراب وی ژی قدی

خیر و برکت پردبی رحم لی دبار
تین ملك صف صف ژ ژوری تینە خار

آڤ و زاد و زر و زیڤ زیدە دبن
خوندنا مولودی کو سروان بدن

قدری وی زحفەڤە نانی و صفتی
لی دخیری دە نکن هون رومتی

ای گلی گهداری مولودا نبی
رحمتا حق هر لسر روحی وەبی

قط نکن ئەڤالادی خو ژ صلوات
دا خدا هر وە بپاریزی ژ شوات

یا الهی صد صلاتو صد سلام
تو بدە هردم لفخری خاص عام

نورا ژ آدا (وى) كتيه پشتو زك



~~نورا احمد ژ آدمى كت پشتو زك~~

تا بعبد الله خلاص بنه شك

لى ژ عبد الله حتى عدنان اقن
بيستويك باب هم لى گوه بدن

عبد الله عبد المطلب هاشمه
يك ژ وان عبد المنافى عالمه

يك قصى و هم كلاب مرة كعب
هم لؤى و غالب و فهرى عرب

مالكو نضره كنانه اى جگر
يك خزيمه مدركه الياس مضر

يك نزار و يك معد عدنان تمام
تف بهشتينه دچن دار السلام

لى ژ عدنانى حتى ادم نسب
~~او نه معلومه لنك اهلى ادب~~
لى تفاقن عالمو اهلى ادب - يا الهى -



يا الهى من عفوكه الأمان
خاترى فى سلسلاو قيمت گران

اى گلى گهدارى مولو دا نبى
رحمتا حق هر لسر روحى وه بى

قط نكن قالا دقى خوم ژ صلوات
دا خدا هروه بپاريزى ژ شوات

يا الهى صد صلاو تو صد سلام
تو بده هردم لفخرى خاص عام

امنه او حوريا باغى جمال
وختى حملى حملى ژ نورا زلال

گوت چقاس هيفك ژ حملى مزدهات
يك نبى مزگين ددا من خير دهات

يا يكى هيفا رجب با فى بشر
ها بتو ادم ددا من خوش خبر

یا دو قیشیت، یا سی ادریسی نبی .
صد صلاوة گوتن لسر حملی ته بی

نوح دچاری هود دپینجی ده مه دین
دا نه مزگینی بخیر المرسلین ؛.

ما هی ششان هاتی ابراهیم دحفت
هاتی اسماعیل بشاهی هم ببخت

هم دهشتی ده نبی موسی دهات
سر محمد پر دگوتن صلوات

یا نهی عیسی دخوندن السلام
تو گهشتی یا حبیبی خاص عام

ای گلی گهداری مولودا نبی
رحمتا حق هر لسر روحی وه بی

قطانکی قالا دبی خوه ژ صلوات
دا خدا هر وه بپاریزی ژ رشوات

- یا الهی -



یا الهی صد صلا تو صد سلام
تو بده هردم لفخری خاص عام

من دحملی ده گلک نیشان ددین
هم ژ بر من پرده بالجمله فرین .

مشرق و مغرب دبون روهنو ضیا ؛.
قصری بصرایی ژ شامی بون خویا

تا ربیع الاولی هیفا سنهی ؛.
هشت شبی من چون کتی شفا نههی

یا دو یازده لمن ترساک نبو
بر دوازده ار شقا دوشمبی بو

کس لمالا سه نبی کفلت تمام
وان بجوه اقا دکر بیت الحرام

سمو سمی ولداندنی ظاهر دبون ؛.
بیرق کسک ژ اسمانی نازل دبون



یک لبانی کعبێ دانین یک لغرب
یک لشرقی من دیتن بی عجب
بن بێن حور و ملک ڤاتینه خوار
شعله و نوری دگرتم چار کنار
ای گلی گهداری مولودا نبی
رحمتا حق هر لسر روحی وه بی
قط نکن ڤالا دڤی خوه ژ صلوات
داخدا هروه بپاریزی ژ شوات
یا الهی صد صلاتو صد سلام
تو بده هردم لفخری خاص عام
ترسیام من دی دجهده او مزل
روهنی بی شوقی ددا چولو جبل
شوق دبو دیوار ژ نا ڤی تینه در
چار ژنی حوری صفت ولک کسکه زر

- مریم -

مریم و حوّاو ساره و اسیه
بونه پیرک بو حبیبی هادیه
تهن دبون هنگی گلک مندی یکی
دابو دستی من قدح سر دستکی
توش گلاو بو عنبرو شکره دناڤ
من ڤخوار هونک دبون جرگو هناڤ
سالا فیل میلادی هنگی اڤ هبون
پینج صدو هفتی و یک سالی ده بون
ماهی نیسان بستو دو چیبو بهار
گل ژ بلشکوژان دبشکفتن لدار
طیر کی سپی جنکی خوه سرمنره بر
هنگی بو بی احمدی من صد شکر
ای گلی گهداری مولودا نبی
رحمتا حق هر لسر روحی وه بی

قط نكن قالا دقى خوه ژ صلوات
دا خدا هر وه بپاريزى ژ شوات
يا الهى صد صلا تو صد سلام
تو بده هردم ليخزى خاص عام

## موضع القيام

خوش بخير هات خوش بخير هات خوش بخير
خوش بخير هات وى ترى كر خير و بير
خوش بخير هات لو ستير بونه بروت
خوش بخير هات جانى شبطانا دصوت
خوش بخير هات دين و مذهب رد كرن
خوش بخير هات انس و جن اسعد كرن
خوش بخير هات اگر و اصنام ولات
خوش بخير هات كرنه بى صبر و ثبات

- خوش -

خوش بخير هات - رحمة للعالمين -
خوش بخير هات خوندى قرانا مبين
خوش بخير هات وقتى كو نو بو ژدا
خوش بخير هات دست بژ ورقه هلدا
خوش بخير هات كى دعا بوا متى
خوش بخير هات دا نبين رحمتى
خوش بخير هات يا خدا هر مومنين
خوش بخير هات عفكه بو شاهى امين

اى گالى گهدارى مولودا نبى
رحمتا حق هر بسر روحى وه بى
قط نكن قالا دقى خوه ژ صلوات
دا خدا هر وه بپاريزى ژ شوات
يا الهى صد صلا تو صد سلام
تو بده هردم ليخزى خاص عام



مە ژبونا خاترێ ڤی مولودی
هەر مسلمانان خاترێ ڤی مولودی
راست بکی عیشێ مە توتفلی دینی
هەم لوی دنیامە دورکە ژصوتنی
بوسرا جو خازرو هەر صالحان
کو تمام بو ڤون خونن قابحان

الدعاء

حمد و وصفێ جهی ژبو رب مزن
او خدای ام ژ اجی چیکرن
بی حسیب من دان صلاة و پر سلام
سر محمد آل و اصحابان تمام
یا خدا ام خوجنە مرڤی ژتە
ام نە تنجن لطفو غفران هەر ژتە
تو بحق احمدی نورین بکی
مە د دنیا حوجی پیسانکی
بر مرن مە بپارزینی ژلعنتی
وختێ حشرێ تو نە دی یک رحمتی


من باب السلام
في جنح الظلام
مظللًا بالغمام
يا نسل الكرام
يا نسل الذبيح
ذا الدين الصحيح
ذا الوجه الصبيح
ذا النطق الفصيح
ذا العلم الرجيح
طه يا مؤيد
طه يا محمد
أحمد يا محمد
يا مهدي وهادي
يا زين البلاد
يا نور العباد
مظهر الرشاد
يا نسل الخليل
يا زين القبيلة
من باب السلام

الصلاة عليك
السلام عليك
الصلاة عليك
السلام عليك

**Pêvek 8:** Bergê mewlûda çapkirî.(rûyê pêş)



**Pêvek 9:** Bergê mewlûda çapkirî. (rûyê paş)



T.C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

**İNTİHAL RAPORU**

TezBaşlığı

**MEWLÛDA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ Û**

**BERAWIRDKIRINA WÊ BI MEWLÛDA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ RE**

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 255 sayfalık kısmına ilişkin 20 / 12 / 2019 tarihinde tez danışmanım tarafından Turnitin adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dahil % 8'dir.

**Uygulanan Filtrelemeler:**

**Kaynakça hariç**

**Alıntılar dâhil**

**5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar**

**Açıklamalar**.........................................................................................................................
..............................................................................................................

Mardin Artuklu Üniversitesi Turnitin adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Abdurrahman AKIN

Öğrenci No: 15711022

Tarih ve İmza
20.12.2019

Programı: Kürt Dili ve Kültürü

Statüsü: Yüksek Lisans

Danışman Onayı

Prof. Dr. Abdurrahman Adak

A.B.D. Başkanı Onayı

Prof. Dr. Abdurrahman Adak